

bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
bi kurmanciya gewr
BI KURMANCIYA GEWR

rojen barnas

**bend û nivîs
(1979-2001)**

Rojen BARNAS

Bi kurmanciya gewr

Enstîtuya kurdî ya Parîsê

© Rojen BARNAS

BI KURMANCIYA GEWR

(Bend û nivîs / 1979-2001)

ISBN: 2-908416-19-0

Rojen BARNAS

BI KURMANCIYA GEWR

(Bend û nivîs / 1979-2001)

Pirtûkên **Rojen Barnas** ên çapbûyî:

1. *Li Bandeva Spêde* (şî'r)-1979
2. *Heyv Li Esmânê Diyarbekirê* (şî'r)-1983
3. *Milkê Evînê* (şî'r)- 1995
4. *Hingê* (kurteçîrok)- 1997
5. *Şî'r -1-* (berhevoka 1 û 2 yan)- 2002

NAVEROK

Pêşgotin	7
1. Vexwendin	9
2. Xwendina bi zimanê kurdî	11
3. Çend bermayeyên mîtolojîk	15
4. Di xusûsa ziman de şêla siyasî	19
5. Di nav çandeya gelêrî de hin hêmanên mîtolojîk	22
6. Tengasiya me û mefermendî	28
7. Sergiranî û kêşmekêşî	31
8. Rastnivîsfna kurdî	35
9. Li ser Bateyî çend gotin	41
10. Şairê ronahî û hişyariyê Cegerxwîn	47
11. Edebiyat û rewşa me ya îroyîn	77
12. Serbilindiya berxwedan û biserketinê	95
13. Dêrsim û dersên ji Dêrsimê	101
14. Rewşa edebiyata kurdî li Ewropayê	107
15. Mîr Celadet Alî Bedirxan	117
16. Pêşeroja edebiyata kurdî	121
17. Gotin û peyivîna bedew: Şîr	127
18. Îsa Şans û rojnameya “ <i>Silvan Sesi</i> ”	131
19. Şerefnameya bi kurmancî û bîra me ya milî	139
20. Yêrêvan xeber dide	147
21. Qedera kurmanciyê	157
22. Çend şasiyên ku di kurmancî de tên bikaranîn	163
23. Edîb Karahan: “ <i>Ax gul im... gul im!</i> ”	171
24. Îstiqbal çi ye, pêşeroj an paşeroj e ?	179
25. Dehsaliya <i>Nûdemê</i>	183

Pêşgotin

Bi vê berhevokê bend û nivîsarên xwe yên ji 1979 î ta 2001 î yên ku di kovarên cihê cihê de û bi înzayên min ên cihê cihê hatine weşandin berpêşî we dikim. Ji van hin jê dibe bala herkesî bi eynî meraqê nekişîne, lê bi qenaeta min heryek cihê cihê û di tenga xwe de hê jî aktuel e.

Hunê bixweynin nexweynin, ewê li xweşa we here neçe; hunê biryara wê bidin, ne ez. Lê bi ya min ne bi tenê li gora şertên wê rojê, li gora şertên niha jî ew hê wek xwe rojane ne.

Ji van bendan dibe ku ya li ser Cegerxwîn û “Edebiyat û Rewşa Me ya Îroyîn” bi hin kesan dirêj bîn xuyankirin. Lê min ew bi zanîn kir: Ku meriv bi edebiyata klasîk, bi xisûsiyet û felsefa şa’irên me yên berî Cegerxwîn nizanibe dê meriv nikaribe hêjayî û rûmeta şa’iriya wî bizanibe. Min bi çavê an zihniyeta mamostayê edebiyatê mijarê da ber xwe û bi wî awayî nivîsî. “Edebiyat û Rewşa Me ya Îroyîn” jî bi wî awayî. Ez jê poşman nînim, berevajî bi wê hêviyê me ku ji bona xwendevanên ku

hewcedariya wan pê hebin mîna agahdariyek ansîklopedîk bi kar bê.

Ji aliyê ziman ve şaşiyên min hene an tune ne, li ser vê di pêşgotina pirtûka xwe ya “Ş’ir-I” de rawestîme, li vê jî wê mijarê carî nakim.

Hêvîdar im ku hun jê çêjek, lezetek hilînin.

Bi hêviya xweşî û geşiyê

Rojen Barnas

Îlon-2002

VEXWENDIN

Bê şik mîna her gel û neteweyên li dinê em jî xwedî çandekî ne. Zimanek, muzîkek, zargotinek (folklor), wêjeyek (edebiyat) me jî heye. Wekî her tiştî her bûyerê ew jî hewcedarên xwedibûn û xwedîkirinê ne. Bi xwedibûn û xwedîkirinê pêşve diçin, digihjin, dikemilin.

Di warê ziman de bê fikare em dikarin bêjin ku kurdî di bersîvdana her diviyahiyên wêjeyî, siyasî, aborî û felsefî de têrkir û fereh e.

Kurdî di raçandina bêje û lêkeran de zimanekî zayok e. Di bêjezanî de xurt û dewlemend e, nemaze di bêjezaniya navdêrên *kesdarî* (muşexes) de.

Zimanekî bi xwedîkirin, di her warî de bi bikaranîna bitir dibe, digihîje. Ziman jî tişteki jîndar e; bi xwarin, vexwarin û xwedîkirinê dijî, bi filitandina ji êş û jandariyên xwe yê arizî bijûndar dibe.

Vejandina zimanekî digel zimanê axaftinê bi pêşvebirina zimanê nivîsandinê ye ku ev zimanê weşandinê û wêjeyê ye. Dirûvandinî bivê, ku ziman wekî sindanê hesinker be zimanê nivîskî jî nola çakûç û geran e. Sindanekî ku demeke dûr û drêj ji mizdana çakûç û geran dûr keve çawa ku biçilmise; zenga kevnanariyê û perpûta mirinê bavêje ser çavê wî, wisa jî zimanekî ku ji axaftinê rojane û bikaranîna nivîskî dûr bimîne herwisa dimerise, dikurise, diçilmise.

Hinek kes sedemê neaxaftina xwe ya bi kurdî bal bi tênekirina zimanê kurdî ya ji bo serwextkirina daraz û daxwaziyên xwe ve grêdidin. Hin jê jî bi nefspiçûkiyek ji parsûstûrî, bi ber-

sîveke hêsan xwe difilitînin: “Em hatine xunifandin (asîmîle bûne)”.

Belê! “Nizanim, hêsaniya canim.”

Bê şik ev herdû bersîv jî ne di cih de ne û ji binî çewt in.

Siyaset ji bo çare dîtin û bişkaftina gelş (mişkil) û pirsîyarên civakî tê kirin. Riyên bişkaftinê bi zimanê wê civakê tên gotin, tên ragihandin. Lê hin jê ji van siyasetgerên me bi gel re ne bi zimanê wî, bi zimanekî din dixwazin biaxifin: Bi zimanê fermayî.

Gengaz (mumkun) e ku meriv di bin nîrê lixwexunifandinê (asîmîlasyon) de bi zimanê xwe tîr û tekûz nikaribe daxwaz û darazên xwe ragihîne, kesên pêşberên xwe serwest bike. Ev dibe ne ji akama (tesîr) lixwexunifandinê be, lê ji ber devokên pêwarî (lokal) be jî. Her ji çi sedemê dibe bila bibe, ma gelo divê ku em li berê destgirêdayî û stûxwar bimînin. Bêşik na! Divê em dest bavêjin vê pêvajoyê (sûreç), bi viyanek (îrade) xurt xwe ji vê tiraliyê dawêşînin. Vatîn (wazîfe/mukelefiyet) ya me ya mêjûyî ev e.

Gelo em li hêviya çî ne an kê ne ?..

Ku em bi zimanê xwe nenivîsînin, wêjeya xwe ya heyî venejînin, zimanê xwe yê nivîskî fereh nekin, pêşve nebin; ewê kî bê vejîne, fereh ke, pêşve bibe ? Ji kijan bejê (qit’ayê), peleyê (ülke) ewê kî bîn ?

Ev vatîniya me ye. Em kî ne: Ez im, tu î, ew e; karkêr e, xwendekar e, rewşenbîr e. Bi kurtayî em in.

Fermo! Werin em li hêviya we ne.

(*Tîrêj*, hejmar 1, 1979 [Serxas Arda])

XWENDINA BI ZIMANÊ KURDÎ

Pirtûk, kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî ne bi domkirin bin jî ji 1963 vê de pir-hindik tên weşandin. Jê tu yek jî li erdê namîne, gişt tên frotin. Yên ku ji aliyê karbidestên ferma ve tên berhevkerin ne tê de.

Ez gelek rast lê hatime, nas an hevalên min ji van weşînekana kirîne, kêfxweşiya xwe diyar kirine, weşînekê kirine berîka xwe, riya malê girtine û çûne. Çend roj şûnda –ku dibêjim ne sêçar roj, sih çil roj- min ji wan bi çavzêlkî pirsîye: “Gelo te ew pirtûk an kovar çawa dît ? Rexneyên te çi ne ?” An xwestine ji bersîvandîne birevin, an jî bersîvên wek “pir xweş bû, pir baş bû, lê min nexwend” dane. Dîsa min pirsîye: “Ji bo çi, çima te nexwend ?”. Îcar bi vî awayî pirsî min bersîvandîne: “Lo camêr gelek giran nivisandîne. Divê rewşa me jî bidana ber çavê xwe, parîkî siviktir binivisandîna.” an jî “lo heyra tu zanî ku kurmançî pir giran e, ne wek tirkî ye. Ez dikarim rojname an pirtûkek tirkî seranser bixwînim, lê hema ku dest bi xwendina kurmançî dikim êş digire serê min.”

Ez rast lê hatime, lê nizanim we jî bersîvên wilo bihîstine ? An hun jî rastî rewşên wiha hatine ?

Bi hêsanî xwendîna zimanekî hin hêman û hoyan divê. Îro, xwendekarekî xwendegeha destpêkî nikare ji rojnameyan “*Cumhuriyet*”, “*Milliyet*” an yekî wek vana bê lêartilîn, bi hêsanî bixweyne. Pakopîso bixweyne jî, lê ne gotar (makale) û nivîsarên wan ên ramanî û siyasî.

Îro em di warê tirkî de ji zanîngeh (üniversite) û ji xwendegên bilind destûrdar bin jî di warê zimanê kurdî de bi piranî û gelemperî hê di gehîneka çîna (sinif) sêyem an çarem a xwendegêha destpêkî de ne.

Li Tirkîyê tu xwendegêhek ku bi zimanê me hîndekarî bike, tune. Di xwendin û nivisandinê de ji tirkî bi transformasyonê, di bikaranînê de jî em hewcedar in ji “ZANÎNGEHA DÊ û BAV” û ji dorhêla xwe bihewisin, hewisîna xwe xurt û qelew kin.

Gelek xwendevan wê bi bîr bînin ku gava meriv pirtûkek siyasî, aborî an h.w.d bi tirkî dixweyne tevî ku meriv bi wî zimanî çend xwendegêh qedandiye dîsa jî ji bo hewcedariya serlêdanê di bin destê xwe de çend ferheng peyda dike.

Em çawa bikin, ferhengên çapkirî û têrkir ên zimanê me li Tirkîyê tune ne. Em hewcedar in bi xwe, bi xwedayinê lê bigerin, bihewisin.

Giraniya nivîsarekê ji çend sedeman dibin:

1. Ji giraniya mijara (mewzû) nivîsarê,
2. Ji lêvenebûyîna xwendina wî zimanî,
3. Ji bêjeyên biyanî an yên nûbihîstî,
4. Ji bêserûberî an xwarovîçko bûna hevoksaziyê.

Di kovar an rojnamekê de ne gengaz e ku giştê nivîsaran jî bêserûberiya hevoksaziyê giran bin û neyên têgihîştin. Tê de çend nivîsarên sivik ên ku meriv têbigihîje himin wê hebin. Bi xwendina wan nivîsarên sivik hêdî hêdî meriv wê zîrekiya xwe ya xwendinê pêşve bibe.

Gelek xwendevanên ku bi hindikî destûrdarên xwendegêha bilind in, ewê bi bîr bînin ku rastnivîsîna (îmla) tirkî, ya îngîlîzî, ya almanî û ya fransîzî ji hev têvel têvel in. Herwekî wan, rastnivîsîna kurdî jî ji ya tirkî têvel e. Lewra kurdî zimanekî

tewangî ye, tirkî pêvekî ye. Bi çavê usûl û qayidên rastnivîsîna tirkî ku meriv li nivîsarên kurmancî binihêre, wê ser nekeve an jî dereng bi ser keve.

Bêjezaniya me giştan qels e. Çend kesên di bêjezaniya kurdî de xurt bê xuyankirin hebin jî ew wek kesên şaş ên di nêv koran de ne. Ew jî di hîmên xwe de bi kilûkêmasî ne, lê ne wek yên din in.

Çare çi ye ?..

Çare qijilandina di donê xwe de ye. Her kes di hindava xwe de bi rêdana gengazî û keysa xwe, bi hedan û bi rikoyî, ji bona dewlemendkirina bêjezanî û bi frêqetî xwendina xwe bixebite, bixweyne. Îro riya sêyem mixabin tune.

Di hejmara 27ê *Hawarê* ya 15 Nîsan 1941ê de Mîr Celadet Bedirxan ewa digot: “*Kuro eyb e, şerm e, fehit e. An hînî zimanê xwe bibin an mebejin em kurd in. Bê ziman kurdîtî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşike giran e.*”

Ma ne we ye ? Ma zimanê Mele Mihemed Elî, Îsmet efendî û Felemezê şofêr yê di çîroka Flît Totanî ku di hejmara yekem de derket jî ziman e ?..

“Na weleh...”

(*Tîrêj*, hejmar 2,1980 [Serxas Arda])

ÇEND BERMAYEYÊN MÎTOLOJÎK

Xatiya me ya Sarê hebû. Wextekî em gundiye hev bûn. Xatiya Sarê hem jinebî bû û hem jî gelek pîr bû. Gelek gotinên xweş û kevnare, yê ku hê riyê tavê nedîtibûn di binê kîsikê wê de hebûn. Carcarna ku gazin ji bextê xwe dikir, digot:

- Ji me j'tirê me lega reş nekuştîye, tira reş nekiriye û aşûjina zebûniyan jî nediziye... ev çi bextê bi reş e ku di me geriya ?

Tebiî maneya diziya aşûjinê û kirina tira reş hebû, lê kuştina lega reş çi bû ? Çima ne lega din ?

Xweş tê bîra min ku min di newala gundê me de rojek jûjî-kî (jijo) girtibû. Bi kêf û şadî min ew anî malê, bi çi kul û halî. Bi bavê xwe ve zelîqîm mîna mozeqirtikê ji bona ku serjê ke. Min bavê xwe razî dikir, diya min di me de derket, şeqamekê li bele-goşka min xist û pê re:

- Belqitiyê belqitî... Min ji te xêrê nedîtîyo! Tu diçî jûjî digirî ha...

Li bavê min zivirî:

- Sed wa'dê Xwedê li canê min bişkên, gava tu jûjî serjê kî a ku di vê malê de bimîne ne ez im. Ew zarok e fê m nake, ma tu jî fê m nakî ku jûjî seyid e ? Tu dixwazî malê li serê me xopan kî ?

Belê seyidekî nû li gundê me zêde bûbû. Seyid Ebasê Sêrtî û seyid Cezayirê Serhedî hebûn heta niha li gundê me û zarokên wan. Lê seyidek nû derket: Seyid Jûjî. Min dotira rojê ji seydayê xwe yê dersa Camiyê pîrsî, wî jî ji min re seyidîtiya jûjî got, lê sedemê wê negot. Ji tîrsa ez jî zêde bi ser ve neçûm.

Ev pîrs zemanek dîrûdirêj di mêjiyê min de bi tevdanî ma. Jûjî çima seyid bû ?

Wek vana çend tiştên xerîb jî hebûn. Marê reş ziyaret bû. Heta kalê min, angu bavê bavê min, ji ber rojek li pesarê marek reş kuştibû ji aliyê xeyberiyar ve hatibû hingaftin. Pîra min tim ji min re digot: “Nebî nebî tu têkilî marên reş bibî ! Kalê te sê roj di pey kuştina mar de bê êş û nexweşî ket û mir.”

Ahmedê cîranê me rojek kûsiyek girt û anî malê, dû re gazî Silêmanê Hevêdî kir û gotê: “Silêmano ! Xalê te ji Hevêdan hatiye, wa ye li mala me ye. Hun ne li malê bûn min ew li mala me ezimand.” Em jî bi Silêman re çûn. Silêman çû menzela mêvanan kesî nedît. Ji Ahmed pirsî: “Ka xalê min ?” Ahmed ji binê dolabê kûsiyê ku li pesarê girtibû derxist, nîşan dayê. Tev bi hev re kenîn.

Çendekî berê çûbûm aliyê çiyê. Li deştê li dorûdorên milkan ji şelan qelawûz datînin da ku milk ji hev diyar bin. Ev qelawûz qelawûzên tixûbên (hidûd) milkan e. Li çiyê jî wisa qelawûz hene. Qelawûzên li çiyê ne ji şelan, lê ji keviran e. Tiştekin dinê bala min li xwe kişand. Ji van qelawûzan tenê ne li dorûdorên milkan, lê di nav rezan de jî hebûn. Min ji hevrayê xwe yê çiyayî pirsî:

- Ev qelawûzên di nav rezan de ji bo çi hatine çêkirin ?
Kevirên zêde yên di nav rez in dane hev an jî qelawûz in ?

Hevrayê min got:

- Cê ew ne qelawûz in, bavko.

Min îcar bi dest û tiliyan nîşan dayê.

Got:

- Erê, erê... Ew ne qelawûz e. Cê ew dêdwan e.

- Hela! Hela! Dêdwan jî çi teva ye ?

- Dêdwan, dêdwan e. Cê çiya, xeyberî, diz û xirab jê ditirsîn. Cê nabîni di qama sirnotê mirovan de hatiye çêkirin. Cê qelawûz qasî çokê tune.

Min mesela dêdwan, ji gundiyan ku li wî gundî mêvan

bûm, pirsî. Di nav her rezî de dêdwanek hebû. Ji dûrî ve dirûvê tindirûsê merivan pê diket. Merivên xirab, xeyberî (wek cin û periyên), çiya jê ditirsîn. Metelokek wê jî hebû; çiya li çiya dikir gazî, digotê: Ho çiyayo! Ma tu nikarî wî rezê li qûntara xwe serûbinê hev kî ? Ew qas ji xwe razî yî, pesnê xwe didî, tu nikarî bi rezekî ? Çiyayê lê hatiye bangkirin bersîv dida çiyayê bangkir: Bi Xwedanê şevûrojan ez dikarim di weşekê de serûbinê hev kim, lê fikara min ji wê dêdwana di nav de ye. Ne ji dêdwana di nav de biwa, serûbinê hev kirin karê weşek kurt bû.

* * *

Min çend bermayeyên mîtolojîk-ku bi bawerî û gumana min mîtolojîk in- di nav pergala çîrokek çêkirî de raberî we kir. Ev û gelek tiştên mîna van hene ku hun rast lê hatine. Di nav xwendayan de ji vana re “baweriyên vala (pûç) an jî îtiqadên batil” tên gotin. Tebîî mijara (mewzûya) me ne ev e, ku ka ev bawerî vala ne an rast in. Pêşbîra (meqsed) min ev e ku gelo ev bawerî ji bingeheke mîtolojîk dizên an na.

Ku em ji serî de pêve biçin:

- Kuştina lega reş,
- Seyidiya jûjî,
- Ziyaret (pîroz) bûyina marê reş,
- Xal û xwarzatiya kûsî û Hevêdiyan (Hevêdan li Qulpê eşîrek e)

- Rez parastina dêdwan û gelek tiştên wek vana ku di nav gel de hene. Hin ji vana dibe qedexeyî an pîroziya xwe di nêzik de, di pey bûyerek de stendibin. Lê yê din bi pîranî û gelemperî ji mêj ve hene û di nav kurdan de li her derî belav bûne.

Ez di vana de rehek mîtolojîk dibînim an bermayeyiya dema totemîzmê.

Vê pîrsa ha tê bîra min: Ma gelo nabe ku têkiliya vî kûsiyê bi wî qewmê ku bi navê kûs/kûş/kûşî dihatin binavkirin re hebe. Di pirtûkên li ser dîroka kurdan de ji vî qewmî tê behskirin ku li dorhêla Behdînan cîwarî bûbûn.

Herwekî ku em tev pê dizanin hê jî Dîcle û Firat di nav gelê me de çemên pîroz tînan zanîn. Pîrozahiya van çeman di dîne Îslamê de jî heye: Tê riwayet kirin ku di çûyina mîracê de Mihemed pêxember di behîştê de rastî xanîkî dibe. Di her rîknê vî xaniyî de çemek dizê. Pêxember ji Cebrail dipirse, ev çi çem in. Cebrail bersivê didê ku yek jê Nîl e, yek jê Dîcle ye, yek jê Firat e, yê din jî Seyxûn û Ceyxûn e.

Pîrozahîke xwedeyî ya li ser Dîclê di mîtolojiya Yûnanî de jî heye. Xwede Dionysos dide ser dilketiya xwe Alphisiboia, nympa (perî) Asyayî. Alphisiboia xwe bi destê Dionysos ve bernade û ji berê direve. Tînan ber çemekî. Dionysos dikeve tîntîla pilingek, Alphisiboia bo ji çem derbas bibe dikeve nav penc û hembêza piling ku ev piling Dianysos e. Ji vê hembêzbûnê Alphisiboia ji Dionysos bi zarû dimîne û jê Medos çêdibe. Medos navê xwe li Medan, piling jî navê xwe li çem daniye ku yûnanî û ewropayî ji Dîcleyê re *Tigris* dibêjin. Tigris bi yûnanî piling e.

Bermayeyên mîtolojîk berhevkerin karekî pisporî ye. Mîtolojî ne dîrok e û ne wesîqe ne ji bo dîrokek jî. Lê tê de hin ronahî û çirûskên têkiliya di navbera çandeyan, yênan hêza xeyalkirina afirandinê ya gelêrî hene. Nîma (sembol) yênan mîtolojîk xwedîkîroxê pîşe û çande ne. Li ba dilê min divê ji alîkî ve em van bermayeyên xwe yênan mîtolojîk berhev kin heta roja wê tê û digihîje ber destên pisporên xwe.

(*Tirêj*, hejmar 2, 1980, [Mihemed Qasim])

DI XISÛSA ZIMAN DE ŞÊLA SIYASÎ

Îro çî bigire li giştî peleyên dinê ji hev veqetandina zimanê nivîsanê û ya zimanê axaftinê nemaye. Li her welatî, li her peleyî zimanekî heye; zimanê neteweyî.

Zimanê bilind an zimanê nivîsanê yê aristokrat, jiyana xwe bi şoreşa bûrjiwazî qedand, tevî klasîzmê ket nav rûpelên dîroka vêjeyê. Bi biwêjêke dinê ku bivê zimanê bilind bi paşî lêhatina bandêriya (hegemonya) çîna feodalî pelîşî, ji hev belav bû. Zimanê gelêrî digel yê axaftinê bû zimanê nivîsanê jî.

Bûrjiwazî, nivîskarên bûrjiwazî ji bo domandina pergala xwe ya mêtinkar û sewsikirina gel, bi zimanê gel xîtabî gel dikin. Nivîskarên pêşverû, welatparêz, şoreşger ji bo hişyarkirina gel li hember pergala mêtinkar û mêtîngehkariyê bi zimanê gelêrî ango bi zimanê xwe xîtabî gel dikin. Herdû alî jî di xîtab û muxatab de digihîjin hev, lê di bîrûbawerî de ji hev vediqetin. Ji ber vî zimanê nivîsanî ji zimanê axaftinê, ji yê gelêrî di heymana me de venaqete. Divê veneqete jî. Veqetandina zimanê nivîsanî dibe ku ji aliyê rêzdariya xwe ya hevoksaziya rêzimanî û ji biserûberiya xwe ji zimanê axaftinê veqete.

Piştî vê rastiya zanistî û gelemper me divê li ser zimanê me yê *Tirêjê* û li ser şêla me ya siyasî di xisûsa zimanê kurdî de rawestin.

Zimanê kurdî bi rewşa xwe ya îroyîn hê pêvajoya xwe ya yekîtiyê neqedandiye. Ne bi tenê di nava zaravayan (lehçe) de, lê di nav devokan (şîwe) de jî têveliyên (ferqiyet) girîng hene. Kurdekî Malatê û kurdekî Hekarî bi hêsanî ji hev fêm nakin.

Digel herdû jî bi zaravayên kurmançî diaxifin, ji bo ragihandina daraz û daxwazên xwe hewcedariya bi tirkî axaftinê dibînin. Ev gelş (muşkil) ne bi tenê di kurmançî de lê di zaravayê zazakî (dumilî) de jî heye. Pêwist e, ev gelş bê bişaftin. Bişaftina vê gelşê tenê bi zimanê nivîsanê, bi xwendin û nivîsandina bi kurdî gengaz (mumkin) e, bi rêberî û rê nîşandayina weşanan siviktir û hêsantir dibe.

Ji bona bişaftina vê gelşê azînê (metod) lê bê şopandin divê çi bin ?

1. Bêje (kelîme) û biwêjên (tabîr) kurdî bikaranîn; ev bêje û biwêj ji kîjan zaravayê kurdî dibin bila bibin. Di dewsa “heqî-qet”a erebî “rastikêni”ya zazakî durustir e. Di dewsa “îstiqbal”a erebî de “dahatû” ya soranî çima neyê bikaranîn ? “Jêmaye” ji mîrasê, “jêza” ji orjîn û kökenê, “kirdayeti”ya soranî ji hikûmetê gelo xweştir nîn in ?

2. Di nivîsan û axaftinên rojane de di dewsa bêje û biwêjên erebî û tirkî de yên kurdî bi kar anîn, bi der û dora xwe hîn-kinin, li serê bi rikoyî rawestan.

Mîna her zimanî di kurdî de jî bêjeyên nû -yên di hîme xwe de di kurdî de tune bin- raçandin pêwist û durust e. Lê ev raçandin gava yaxurî bin û ji mentîqa rêzimana kurdî dûr bin, dibin sedemê tevz û tinazan. Herwekî “şoreşvan” çi ye ? “şoreşvan” mîna aşvan, mîna şivan, mîna gavan çavdêrî û danê-riya şoreşê dike ? Heke ev “şoreşvan” di maneya “révolutionnaire=devrimci”) de be, ne di cih de ye. Hevmaneya “révolutionnaire=devrimci” bi kurdî bêjeya “şoreşger” e. Ev bêje hevedudaniyê ji bêjeya “şoreş” û parkîta “-ger”ê ye. Di “-ger”ê de hêvotin, hindav (îstiqamet) dayîn, kirin, karîn heye. Parkîta “-ger”ê libatî (aktîf) ye, mîna parkîta “-van”ê ne tebatî (pasîf) ye. Ji ber vî qasî yê ku bêjekê ji diviyahiyê radiçîne divê berî her tiştî bi rêzimana

kurdî bi hûrukûrî bizanibe. Di dewsa bêjeke heyî ya kurdî de bêje raçandin ne durust e, em li hember vê ne.

Cih bi cih zimanê nivîsarên *Tîrêj* ji hin xwendevanan re yên ku di xisûsa zimanê kurdî de baş negihiştî ne, wê giran bê. Ev giranî ji axaftina yekî Diyarbekirî digel yekî Malatî, ji ya yekî Hekarî digel yekî Mêrdînî an Ûrfayî girantir nîne.

Bêje û biwêjên giran dixuyên her û her kurdî-jêza ne. Lê dibe ku ew bêje an biwêj di devokek (şîwe) an di çend devokan de neyê zanîn, lê her di çend devokên mayî an di zaravayên din de tê zanîn û bi kar anîn.

Armanc ne zimanekî nivîsanî ji zimanê gelêrî cihê afirandin an çêkirin e. Na xêr. Armanc ji tengasiya gerîneka devok û zaravayan filitîn, pêvajoya ber bi hev çûyîna zaravayan û yekîtiya zimanê kurdî bilezexistin e.

Ev têkoşîna di warê ziman de perçekî ji têkoşîna li hember mêtinkar û mêtîngehkariyê ye. Ji têkoşerîya bixwevehatinê nayê veqetandin. Divê her têkoşer, rewşenbîr, xwenda di vê qorê de ciyê xwe bizanibe û gavekî zûtir ciyê xwe bigire.

(*Tîrêj*, hejmar 3, 1980, [Serxas Arda])

DI NAV ÇANDEYA GELÊRÎ DE HIN HÊMANÊN MÎTOLOJÎK

Di hejmara bûrî de em li ser hin bermayeyên mîtolojîk bi pirs û îşaret sekinîbûn. Herwekî ku me gotibû mîtolojî şaxeke zanistiyê (ilmê) nîne, dîrok û sosyolojî jî nîne. Çi bigire ji sedî not û pêncê wê dûrî rastiye ye jî, lê ye mayî ango ji sedî pêncê mayî ji şertên madî yê jiyana civakî zaye û heta niha hatiye. Hingî şertên madî yê civakî-aborî guherîne, baweriyên olî jî ketine hin kirasên nû, di kirasê ola nû de jiyana xwe domandin.

Bi ola îslamî yekxwedeyî hatiye nav kurdan, lê “xwedanê şev û roja”, “xwedanê erd û esman” jî nav kurdan, ji Kurdistanê şarederî (surgûn) nebûne, neçûne. Ev “xwedanê şev û roja”, “xwedanê erd û esman” ne Xwedayê ola îslamî ye. Xwedayê ola îslamî xaliqê “kullî eşya” ye. Di “xwedanê şev û rojan” de piranî, pirejmarî heye. Lê di “Xwedayê îslamî” de yekîfî, yekejmarî heye. Di sond xwarinê de kes nabêje “bi xwedanê min”, lê “bi Xwedayê min” tê gotin. Lê di ye dinê de “bi xwedanê şev û roja”, “bi xwedanê erd û esman” tê sond xwarin. Ev xwedan ji bilî xwedeyê rojê Ahûra Mazda û ji xwedeyê şevê Ehremen pêve xwedekî dinê nîn in. Ango ev xwedanê dema zerduştiyê ne, yê dema pîrxwedeyî ye.

Mihemed pêxember sond xwarinê qedexe kiriye. Ne bi tenê sond xwarina bi tişt û tebayan, lê (bêsebeb) sond xwarina bi Xwedê, bi Quranê û h.w.d jî. Digel vî awayî di nav kurdan de

hê jî “bi vê gola hêşîn” ango bi esman, “bi vê axa ku em jê hatine û dîsa emê herinê” ango bi axê sond xwarin, ji deştê heta navsera çiyayên bilind terrî û tezetiya xwe diparêze. Ev hin daneyan (donnée/verî) dida me ku wek qewmên dinê kurd jî di gehînekê pîrxwedeyî de derbas bûne. Kî zane belkî berî zerduştiyê di nav wan de xwedeyê axê cihê, yê esman cihê, yê avê cihê, yê çiya cihê, yê daristanan cihê biye.

Di pey derketina her oleke yekxwedeyî de avabûna dewletên feodalî yê merkezî gelo rastlêhatiniyek e ? Yek merkez, yek xwede... Ola zerduştî çima ne li Sûrî, li Trakya, li Sibîrya, lê hema li Îranê derketiye û heta bandêriya Med û Persan hebiye ew jî pê re ajotiye û fereh biye. Herwekî ku dewletên emewî û ebasî an jî dewletên mîna wan erebnîjad çima ne pêşiya ola îslamî, lê dû re hatine damezrandin, li Asya û Afrikayê fereh bûne ?

Ji çiyayê Mûnzirê heta Sîpanê Xelatê, Agirî, Zoveser, Mereto, Xezar (Hazar), Şerefdîna bi kurtebirî tu çiyakî bilind ê Kurdistanê tune ku ji aliyê derûdora xwe ve pîroz neyê dîtin. Gava ji gelê cîwarî bê pîrsîn wê pîroziya wî bi ziyareta navsera wî ve girêdin. Li navserê an pêxemberekî veşartiye mîna Zulkîf pêxember li Erxenê an jî qencekî Xwedê an ewliyakî. Li çiyakî hêta eshabekî, li çiyakî dîtir dewsa lingê duldula hezretî Elî, li yekî dinê qencekî ne pêxember lê destbrakê Mihemed pêxember maye. Di serê Gulanê de, di Qere Çarşembeyan de an di hin rojên xuyanî de gundî û bajariyên wî çiyayî wê nanê şikeva lêxin, derkevin hafê, an kêf û seyrana li gora sêra xwe an jî ya olî, mîstîkî bikin û paşê bizivirin malê.

Ku kurd di dema bûrî de îsewî (fileh) bûna me dê bigota ku ev ziyaret yê ezîzekî, qencekî manastirê ye. Lewra piraniya manastiran di navsera çiyân, di cihên rê û dirb pêneketî de diha-

tin ava kirin. Lê ne kurdan ola îsewîfî pejirandine û ne jî mizgeft û xwendegehên îslamî li derên xalî hatine avakirin. Li ba dilê min sedemê pîrozahiya çiyayên me ji van hersê sedemên jêrîn yek e an gişt in:

1. Di dema pîrxwedeyî de her çiyakî an jî giştikên çiya xwedî xwedekî bûn. Herwekî li Yewnan, li Romayê tê dîtîn li Kurdistanê jî her çiyakî an ji aliyê xwedekî ve dihat parastin an jî wargehê xwedekî bû. Ji ber tirs û xofa çiya ya li ser gel, di dema zerduştî û îslamîyetê de pîrozahiya wan di dewsa xwe de ma, lê şêl û tîmtîla wan guhirî.

2. Kurdan heta dema me ya îroyîn jî çî pir çî hindik pergala koçeriyê ajotiye. Koçer havînan li zozanan, zivistanan jî li deştê ne. Deşt ji bona wan ne bi xetere ye, lê çiya bi kuriyên (canewer) xwe, bi bager û bahoza xwe, bi berf û gêdûka xwe, bi riyên xwe yên bêkeys her tim bi xetere ye. Di dema pîrxwedeyî de ji bona xwe parastinê; ne xwede, lê ji bo her çiyakî xeyberek fikirîne û bi ceweta wî xeyberî çiya jî pîroz dîtine. Gava pir bûyîna çiyayên tendûrekî (volkanîk) di Kurdistanê de bê ber çava, girîngiya vê dîtîne bêtir ber bi aqil dibe.

3. Ruhbanên mecûsiyan (yên zerduştî) axleb di şikeftan de, di cihê rêpêneketî de hin jê bi serê xwe, digel xwezayê dijiyan. Ji ber jiyana û mirina wan a li navsera van çiyayan, ji wê demê ve de -ji ber pîroziya wan- dibe çiya jî hatibin pîroz dêrîn. Lê ev belkiyek gelek jar e, li ba dilê min.

Li ser kembera erdhejiyanê (zelzele); welatekî bi geliyên teng û kûr, bi çiyayên bilind û tendûrek, bi her cur tebayên dirinde, bi berf û gêdûka heşt mehî û heta dema îroyîn ajotina pergala koçeriyê, ji bilî koçeriyê jî bi gom, mezre û gundîtî jiyanekek di guherên bilind û qûntarên bêkeys... Na! Ne gengaz e ku pîroziya van çiyayan ji ziyareta navserê bê. Lê qedr û rûmeta

ziyaretên tê de ji pîroziya van çiyayan ya dîrokî û kevin tê. Ango pîroziyek olî (ya nû) nîne, mîtolojîk e.

Di ser avê re ji nişka ve qevazdan, çêrî berf, baran, bager û bayê kirin jî qedexeyeke mîtolojîk e. Ji vana yek an xwedî xwedkî ne an xwedî xeyberekî ne an jî xwede an xeyberek xwe kiriye têmtîla wan. Çêrî yek ji vana kirin herwekî çêrî xwede an xeyberê wan bi xwe kirin e. Bêşik xwede an xeyberê vana tola (heyfa) xwe ji meriv re nahêle, meriv dihingêfe.

Li welatê me wekî çiya her çem û robarek jî xwedî pîroziyek e. Di nivîsara hejmara bûrî de em li ser pîroziya Dîcleyê li gora ola îslamî û ya mîtolojiya Yûnanî rawestibûn. Herwekî ku tê zanîn Roj di nav kurdan de heyberek pîroz e. Pîroziya Rojê di baweriya kurdan a kevin de serdestirê giştî pîroziyan e. Bi zaravayê zazakî ji tîrêjê re “tînc” / “tîj” tê gotin. Navê Dîcle/Dîclê jî li gora rîwayetek ji “tînc+lê”, “tîj+lê” tê. Ango ya (ava) ku tînc an tîj li serê ye. Pîroziya Dîclê ya kurdî ji vê jî tê. Serkaniya Dîclê ji navça kurdên zaza dizê.

Mîna Dîclê li Kurdistanê tu serkaniya avekê tune ye ku ne xwedî pîrozahî be. Li Dêrsimê ava Mûnzirê, li Riha (Ûrfa) yê kaniya Zelîxa (Eyn-Zelxa), ava Mûradê û h.w.d. Çi bigire di piraniya zayina serkaniyan de motîva “xwe avêtina şikeftekê, tendûrekê an agir” heye. Qencê Xwedê Mûnzir xwe avêt qefayê bilqîn bi qefayê ket jê ava Mûnzirê za, kalo Mûnzir jî bû çûkek ji qefayê firî û çû. Feqî li ber tendûrê çav bi bûka keşe ket, hinarîk li bûkê sor bûbûn, dilê feqî bijiyayê, gote bûkê: “Ji bona riza Xwedê ramîsanek ji hinarîkên xwe bidî min!” Bûkê riza Xwedê neşikand, ramîsanek da feqî, pêre jî xezûrê wê di wan de derket. Ji şerma ji ber xezûr bûkê xwe avêt tendûrê. Bi fermana Xwedê bilqîn bi tendûrê ket, jê robarek za û ew bû ava Mûradê.

Di van de tēmtil guheriye, teşekî îslamî wergirtiye. Lê esil her mîtolojîk e, berî îslamê ye. Ev ro û robar, ev çem û cobar çima li şafirên Erebanê ne dizan ? Li wan deran ma qet qencê Xwedê tune bûn ? Gişt qencê Xwedê hatin di welatê me de hêwirîn ?

Bêşik van sedemên han sedemên hîmî nîn in, bedew-sedem in: Bîrûbaweriya dema kevin a mîtolojîk bi kirasê ola nû angî îslamiyetê xemilandine. Ji bona jiyana wan ev her pêwîst e. Lewra gava ku van baweriyên kevin dijberê bîrûbawerî û ramanên ola îslamê bin, ji aliyê hêzên çî çekdar çî çandeyî yên ola nû ve dê bihatina gunehkarkirin. Herwekî ku îsewiyên kirin: Zerzenga ronahiya li serê Apollon hilanîn dan ser serê Îsa û ezîzên dêrê û ji aliyê din ve heykelên wî (Apollon) şikandin. Li ser perestgeha Didymayê xaç rewêrtin, lê ji aliyê dinê ve rewêrteyên xwedeyên malê şikandin û hinan jî ji binî rewêrtin.

Di welatê me de bi piranî di nav şêx, axa, mîr û yên di bin kurmê wan de mayî “bi gora bavê xwe û ya hev” sond xwarin heye. Mihemed pêxember sond xwarinê mekrûh didêra. Heta dara xurmeya ku rojek li pesarê li binî limêj kiribû, ji bona ew nebe ziyaret û bisilman jê re bi şaşî secde nebin, da birînê. Sonda bi gora miriyan bi temamî di ola îslamê de mekrûh e. Lê digel vî awayî jî hê di welatê me de bi gora şêxan, bi ya axa û mîran tê sond xwarin. Ji gelek xwendevanên me ve tê zanîn ku mirovatî di pergala bapîrperestîyê de derbas biye. Di wê pergale de mirov bi serê bav û bapîrê xwe, bi gora wan sond dixwarin. Ev pergal berî zerduştiyê ye. (...) Digel zerduştiyê ve jî ev baweriya ji bapîrperestiyê heta îro hat. “Bi gora bavê te”, “bi gora Mîrxan axa”, “bi gora Şêx Îsa” h.w.d. ev cur sond ji jiyana kevin tên. Ji jiyana ku mirovan bawer dikir ku bav û bapîrên wan ên mirî bi giyanê xwe ew ji xerabiyê diparêzin.

Herwekî vê bi serê hev sond xwarin jî hêmanekî mîtolojîk e. Bi serê hev sond xwarin ariziyê bi mêran e. Bi serê zilaman tê sond xwarin. Pîrek (jin) çiqas mezin û navdar be jî bi serê wê nayê sond xwarin. Zilam çi dibe bila bibe bi serê wî tê sond xwarin. Ev hêman ji dema pederşahiye maye. Çawa ku hê jî kurm û kirasê pederşahiye bi temamî ji nav me nehatiye maliştin wisa jî ev cur sond ji xurtayiya xwe tiştek winda nekiriye.

Ji vê nivîsarê pêşbîra me ne vejandina van awayên hêmanên mîtolojîk in. Daxwaza vejandina wan kevneperestî ye, teqlîd e. Lê bi berhevkirina hêmanên mîtolojîk di xisûsa jiyana me ya kevin de hin daneyên etnolojîk, sosyolojîk tîn bidestxistin. Dîsa ev daneyên mîtolojîk di warê pîşeyê de dibin sedemê dewlemend bûyina nimayan (sembolan) û bi vana zargotin bêtir bi awakî xweş tê têgihîştin û bişaftin.

Hêmanên mîtolojîk di jiyana rojê, di stranan, di çîrok û çîrvanokan de, di baweriyên ku jê re “îtîqadên batil” tîne gotin de veşarî ne. Divê em vana berhev kin. Berhev kin, lê bê xirabkirin, bê guhartin, bê lê zêdekirin û kêmkirin. Û derxin nav warê munaqeşe û lêkolînê.

Em ji bîr nekin ku ew perçekî ji çandeya me ya gelêrî ne.

(*Tirêj*, hejmar 3, 1980 [Mihemed Qasim])

TENGASIYA ME Û MEFERMENDÎ

Li welatekî mêtîngêh ku ji çar alî ve ber li jiyana ziman û çandeya wî hatiye girtin, bi zimanê wî welatî di warê çandeya pêşverû-şoreşger de dest avêtina weşandin û nivîskariyê, bi rastî karekî gelek dijwar e.

Nivîskarên ku di vî warî de bixebitin bivênevê xwe di tengasiyeke çarenîn de dibînin.

Em nimûnê ji rewşa xwe bidin. Ji ber ku ji aliyê mêtîngêhkarên bi darê zorê ber li jiyana û pêşveçûna zimanê me hatiye girtin di mişlaqa (paralel) vî de:

1. Zimanê me yê gelêrî hê qaçilê xwe yê devokî neçirandiye. Di nav devokan de têveliyên (ferqiyet) fereh û kûr xwe didin nîşandayîn. Ji ber vê hîlbijartina devokekî ji bo zimanê nivîskariyê ne gengaz e. Nivîskar ji nivîskariyê pêve divê têkoşîna berbihevçûyîna devokan jî bide geşkirin û pêşve birin. Rewşa têveliyî di navbera zaravayan de ji xwe li ber çavan e, ne hewceyê gotinê ye.

2. Ji bona pêvajoya berbihevçûyîna û yekîtiya di navbera devokan û dûre jî ya zaravayan neçe serî, mêtîngêhkar bi zanîn her tevgerên weşandinên bi kurdî hê di destpêkê de fetisandine. Di dawiyê de bivênevê di nav welatîyên me de kurmê hînbûyîna xwendin û nivîsandina bi kurdî cih negirtiye û belav nebiye. Çi bigire xwendina bi kurdî luks an jî tişteki bêkêr hatiye dêrîn.

3. Dîsa ji ber tunehiya pirtûk û weşanên bi kurdî an ji ber kêmasiya wan bivênevê baş têgihîştin û hînbûyîna ziman ya pênuşgiran bi awayê ku dilê meriv divê negihîştîye kemala xwe:

Mîna pitikên şîrşihîfî kêmasî û jarî, bêhemdfî xwe pijî nav çavan dike.

Digel van hoyan daxwaziya me ji bona herkesî nivisandin e. Ango bi qasî xwendevanekî ji Hekarê; yekî ji Sêwasê, ji Qersê, ji Cihanbeyliyê ji bikaribe nivîsara me bixweyine û jê serwest bibe. Dîsa gava ku nivîsareke me bixweyînin çêja (lezeta) bi kurdî xwendinê jê hilînin; ne ku nivîsarek ji erebî, farisî û tirkî tevlihev a mîna girara gavanan li pêşberê xwe bibînin û tu çêjêke arizî jê hilneyînin. Ev nivîsar ne ku bitenê çêja kurdî-xwendinê bidê, lê digel vê çêjê ronahiya ji şebaka pêşveçûn û azahiya dinya gerdenaza jî ragihîne, çirûska mefera jiyaneke bê mêtinkarî di vîna (îrada) wan de bijene û şêna (qudreta) wan a civakî rake pêdarê.

Bîrûbaweriya me ya di xisûsa nivîskarî, pîşekarî (sen'etkarî) û weşangeriyê de ev e.

Mixabin ji ber hoyên (şertên) gelemper ên ku me di sê darringan de li jorê berhev kiribûn, di hoyên îroyî de ev daxwaziya me bi awayê ku dilê me divê pêk nayê. Lewra ji bo nivîsarek nû gava em dest davêjin pênûsê, tirkîn bi dilê me dikeve: “Gelo derbareya (mewzû) çi de binivîsînin ku ji aliyê piraniyê ve bêye xwendin?”, “Gelo ev bare dê ji piraniya xwendevanan re ne giran be?”, “Gelo em di dewsa filan bêje an biwêjê de kijanî bi kar bînin ku ji aliyê piraniyê ve bê fêmkirin?” û h.w.d.

Hun jî dibînin ku çi bigire em hê di gehîneka ziman hîn-kirinê de ne. Li pey bêje û biwêjên xwerû kurdî, di nav kevane-kê de maneya wan a bi erebî, farisî an bi tirkî didin ku xwendevan tafilê jê serwest bibin.

Tu kovareke çandeyî nîn e ku ji bona bêje û biwêjên di zimanê xwe de di her çela (nusxe) xwe de ferhengok veqetîne, biweşîne. Belkî di dinya weşandinê de *Tîrêj* nimûneke yekta ye,

di vê xisûsê de. Ev ne ji ber giran bikaranîna zimanê nivîsaran e, lê ji ber xwe-berpirsiyar dêrîna hînkirin û belavkirina zimanê kurdî yê lixweser e.

Belê, bi armanca nivîsarek nivîsandinê gava ku em dest davêjin pêûsê, bi rastî destê me direhile, tirkîn bi dilê me dikeve. Lê ku xwendevanên me jî bi gelemperî zorê bidin xwe, bi hedar û rik ji bona hînbûyina -bi bêje û biwêjên- ziman, dest bavêjin *Tîrêjê* û parîkî bilivin, di pêşerojê de wê bar û tengasiya me sivik bibe. Wê çaxê bê fikarekirina ji bijartina bêje û bareyên sivik wê *Tîrêj* dest bavêje vekirina şebaka dinya çandeyî ya pêşvebir û felatîyê.

Di hoyên vê tengasiyê de em niha dieciqin. Lê ev eciqandina me, em hêvîdar in ku wê bibe sedemê bicihbûna zimanê nivîsarî; bi kûrî û berferehî li her herêmê. Di hoyê welatê me de bi tenê ziman hînkirin û belavkirin jî têkoşîneke mezin a siyasî ye û mazmazka têkoşîna siyasî ye. Me bi tenê bikaribîya vê pêk bianiya ji bona me biserketinek bû ku wê bibûna kaniya bextewariya me.

Em jê mefermend in.

(*Tîrêj*, hejmar 4, 1981 [Serxas Arda])

SERGIRANÎ Û KÊŞMEKÊŞÎ

Mirovên ku bi danîna kevirek an xîçîkek alîkariya bilind-bûyîna dîwarê avahiya şarsaniyetê (medeniyet) kirine, bêşik mirovên ku rasterast di nav têkiliyên hilberînê (production/üretim) de bûne. Bi maneyek dî, şarsaniyet bi hilberînê dest pê kiriye û di mişlaqa (paralel) pêvajoya hilberîna de gihîştîye gehîneka di heymana me ya îroyîn.

Hilberîn berî her tiştî girîngahiya serûberî û serûberî jî sergiranîyê (cidiyet) dixwaze. Serûberî û hilberîn di her war û neqebê de di nav hevûdu de ne, bi hev re ne. Hilberînek bê serûber, bê bername (program) tu car li piya namîne, berbivajî pergala xwe ya têdeyî diherifîne, tîne xwarê. Ciyê ku serûberî lê tune ye, li wê derê pîrhevoka kêşmekêşiyê dafîka xwe vegirtiye, li hêviya nêçîra cangiranan û zexelan e.

Di pergala kêşmekêşî ango di pergala bêpergaliyê de tiştê ku lê tê fikirîn, tê daxwaz kirin; ji aliyê bûyer û têkiliyên rastlêhatî, yaxurî an ji aliyê tiştên ne di hesêb ve tîne gijgijandin, tîne kişkişandin; ew kar naçe serî, ew gelş ji rîya bişaftinê ve dişihite.

Mirovên di heymana me nemaze yê ku ji bona pêkanîna pergalek serfiraztir dixebitin, ji herkesî bêtir hewcedarê jîyan û xebateke bi serûber in. Razan, rabûn, xwarin, xwendin, şuştin û paqijî, xebata bêşeyî (meslekî), xebata çandeyî, bilîbûyîna bi mal, malî û zarokên xwe divê di nav fesala rojê ango di nav bîst û çar saetî de pêk bê, biqede. Lewra roj li cîhanê bîst û çar saet e, zêdetir nîn e. Ji ber qasî jiyana mirovên nûjen ên di heymana me li ser saet, deqîqe û saniyan hatiye dabeş kirin û bi bername

vekirin. Karkêr divê di deqîqeya xwe de bigihîje ser karê xwe û di wê deqîqeyê de destgehê xwe yê xebatê bi ger xe. Ji bona wî gava ji malê derkeve pêwîst e, ku di deqîqeya xwe ya diyarkirî de derkeve da ku bigihîje otobusê, trêne an serwîsê. Piştî rabûna navgîna serwîsê bi deqîqekê dereng gihîştina wî ya cihê jê rabûnê, dibe sedemê şihitîna ji çendyek-romiziya (çendyek-yew-miye) xwe ku ev dibe sedemê şihitîna destgehê xebatê bi ew qas saetan ji hilberînê. Bi mişlaqa vê şihitînê hatiniya welat dadikeve, ev daketin bi çend qat dibe sedemê hin daketinên di warên dinê yên hilberîn û pêşveçûnê jî.

Jiyana bi serûber, bi bername, tevgera bi deqîq bûyîn bi gelemperî kurmê arizî yê bajarvaniyê ye. Ji ber diviyahiye (hewcedariyên) hoyên jiyane yên dargî (madî), proleter ji qor û çînên din ên bajarvaniyê bêtir bi serûber û deqîq in.

Her çiqas ne bi qasî bajarvaniyê lê bi xetên zirav û hûr be jî, di jiyana pesarê de jî serûberiyek bi xêzên stûr, lê ne bi deqîqî, tê dîtin. Dema kiravan, şûv-rakirin û dugîsin kirinê diyar e. Lê dibe ku ev xebat heftekê pêşve an heftekê bi şûn de bê kirin. Lê tu car di dema çandinê de çînîn, di dema çînînê de jî çandiniya wê hilberînê nayê kirin. Ne bi mehan, lê bi rojan an bi hefteyan karekî pesarê (gundîtiyê) paşve an pêşve tê avêtin ku hoyên îklîmî dest bidin wekî ku şilî, qeşa, avdan, an hişk bûyina bi helekela rojê ji vî karî re nebe bend.

Li welatê mêtîngeh û li yên paşvemayî giraniya hilberînê li ser çandiniyê (ziraet) ye. Ji ber vê , kurmê gundîtiyê firehtir û gurrtir e li ser qor û çînên civakî yên dinê. Fikare û paxava mirovan ji aliyê kurtaiya zeman ve çî bigire qet nîne. Mixabin ev kurm di nav hêzên rewşenbîr û şoreşgeran de jî bi gurrayî xwe dide nîşandan.

Ku nimûne dayin bivê jiyana me mîna serpêhatiya trêne

Tirkîyê ne. Deqîqe û saniye li wê derê bihêlin, çawa ku di kîjan saetê de wê kîjan trênan an eksprês li çi îstasyonê be, li ku derê be an bi berexêrî bigihîje ku derê nayê zanîn: Ne ji aliyê ajo, rêwîyan, şeftrên û heta wezîrê ragihandinê ve.

Li ku bûyîn, çûyîn, rabûn û rûniştina me ya ji aliyê dem û deverê ve ne ji aliyê malî û hevalan, ne ji aliyê me bi xwe ve jî nayê zanîn. Malî nîzane ku di filan saetê de malxweyê wê dê li ku derê be, zarok nîzanin ku bavê wan dê di çi saetê de li malê be, malxwe nîzane ku kebanî di çi saetê dê şîv an firavîne bipêje. Gişt spartiyê raylêdîna Xwedê ne.

Hun rastî hevalê xwe yê Hesen tên, pîrsa hevûdu dikin. Hesen gelek kêfa xwe ji hevûdu dîtina we re tîne. Bi milê we digire bi îsrar dibêje we: “Fermo! Em herin buroyê” an “kargehê rûnên” Hun pêşiyê spasî wî dikin, lê hingî hun spasî dikin ew yek car li teklîfa xwe sor dibe. Hun pê re diçin, nêzîkayî bi cîgahê wî didin, Hesen efendî li we dizivire: “Li min bibûrî, divê di vê saetê de ez li bêvan derê biwama. Tu li filan derê rûnê, deh deqîqe şûn de ezê bizivirim. Naçe çaryekê ezê bêm. Piştî wê emê rûnê biaxîfin. Axaftina me gelek pêwîst û gîrîng e, ha!” Çaryek dibe çar saet, çavê we li rê dimîne, vêca hun dev ji xwe berdidin, dikevin taya wî “gelo tişteke pê bû, tişteke hat serê wî?”

Na xêr! Qet ber wî mekevin, tu kulek jî pê nehatiye. Hun ber xwe, ber zemanê xwe kevin ku ji aliyê jiyana kêşmekêşiyê ve bi ava danûkan re hatiye biacandin.

Min gelek hevalên nas hene ku ji mêj ve dest avêtine ziman û çandeya kurdî. Ji mêj ve ku dibêjim ne karê du-sê salan e, ev bûn neh-deh sal. Di destpêkê de xwedênegiravî an li ser rêziman an li ser ferhenga kurdî û tirkî dixebitîn. Bi guman pêbirina wan hevalên hêja ya wê demê, ev xebata wan di nav pênc-şeş mehan de dê biqediya. Pênc-şeş meh çûn li pênc-şeş salan

qirase bûn, lê dîsa jî tu hilberînek serê xwe di me de dernexist. Yên di destpêkê de warê rêzimanî hîlbijartibûn hêdî hêdî hatin ser ferhengê, jê hatin ser roman nivîsandinê, hatin ser tiyatroyê, hatin ser çîrok nivîsandinê... û ku hun li rewşa wan a îroyîn dipirsin, gişt rexnegirên gelek mezin in di welatê me de. Ha ku hunê bêjin çî nivîsandine heta îro, gelo ? Qet bernekevin hinek jê ji bona ku dest bi nivîsandinê kin hê difikirin û yê din jî li kêreke tûj digerin ku bo serê pênuşa xwe vekin.

Gotineke me ya pêşiyar heye ku dibêje “zinêkarî dibe, lê ne bi dê û xwişkan re”. Emê jî viya bêjin: Raste, bêserûberî dibe, kêşmekêşî dibe, cangiranî û zexelî dibe ango dibe ku bibe, lê ne ji yên wek me re. Lewra em gişt bi serê bavê xwe sond dixwin, bi çavê şoreşgeriyê li xwe dinihêrin, navê demokrat bûnê, navê sosyalîstiyê besî xwe nabînin doza felatiya çînî û welatî dikin, doza wergerandina pergala genî ya cîhanî dikin û dîsa jî xwe ji gemara bêserûberiyê danawêşînin.

Dem li pey xwe nazivire, ji nû ve dest bi beza xwe nake. Pêvajoya pêşveçûnê û ya tevgerên serxwerabûnên civakî nade pey me, li hêviya meriv ranaweste. Divê meriv xwe bigihînê.

Heymana me jiyar û xebata bi serûberî divê. Kefenê termê kêşmekêşiyê li nav mirovên xwenas ji mêj ve riziya, nema. Ji ber ku em ji welat û ji bîrûbaweriya xwe ya siyasî berpirsiyar in, divê ku ji herkesî bêtir û pêgaveke zûtir dest bi jiyana bi serûberî bikin.

(*Tîrêj*, hejmar 4, 1981 [Mihemed Qasim])

RASNIVÎSÎNA KURDÎ

Zimanê me î nivîsanî bi tîpên erebî ji Eliyê Herîrî, bi tîpên latînî ji Celadet Bedirxan dest pê dike. Rastnivîsîna bi tîpên erebî bi çî awayî bû bi çî awayî nebû baş pê nizanim, lê serpêhatiya rastnivîsîna bi tîpên latînî ji destpêkê ta îro gelek tevlihev û bi gelemşê ye.

Di warê rastnivîsîna bi tîpên latînî de ji destpêkê ta îro sê awa an sê rêgeh berpêşî xwendevanên kurd bûne. Gelo meriv dikare ji wan rêgehan bêje “ekol-école” an na ?

Ev sê rêgeh an ev sê ekol -ne bi xetên mutleq- lê bi nêzîkayî ev in:

- a. Ekola *Hawarê*
- b. Ekola kurdên Sovyetê
- c. Ekola bêla (ne ji alîkî)

Ekola *Hawarê* bi qasî jiyana kovara *Hawarê* hevahengiya xwe kudand, di pey mirina Mîr Celadet Bedirxan de Mîr Kamuran Bedirxan rêgeheke cihê, Osman Sebrî û Nûredîn Zaza rêgeheke cihê dan ber xwe. Di vê ekolê de cihêti li ser nivîsandina daçeka neyînî bi lêkera laperandî ve nivîsandin û nenivîsandin e.

Ekola kurdên Sovyetê di nav xwe de gihîştîye yekîtîyê. Bi destê Prof. Qanatê Kurdo gramera kurmançî hatiye bihevexistin. Bersîva hewcedariyên kurmançiya dorhêla Qers û Agirî dide, lê ji bo tevahiya kurmançiya jorîn ji bersîv dayîne dûr e.

Ekola bêla di eslê xwe de ne ekol e. Ji vê tofê (grûb) rastnivîsîn û termînolojiya du kesan çî bigire hevdu nagirin.

Di xwendin û nivisandina zimanekî de yekîtî û wekheviya rastnivîsînê serê hemî tiştî ye, kilîta qefla xwendin û nivîsandinê ye.

Di warê kurmanciya jorîn de xwenda û nivîskar bi nîsbeta yên miletên dinê de hîç tune ne, bi nîsbeta gengaziyên (îmkânên) miletê me çendek in. Bê şik ev kesên ku bi nivîskariyê tînanaskirin û riya nivîskariyê dane ber xwe, bi ceweta gurr kirin û geş kirina agirê tevgera rizgariya welêt, warê çandeyî ji xwe re bijartine. Di vê rêgehê de bûne sparteka moralî bo têkoşerên rizgarîxwazên Kurdistanê. Lê dîsa jî di navbera giştan de tunebûna yekîtî û wekheviya rastnivîsînê kil û kêmasiyek e.

Çerçewa rastnivîsînê gelek fereh e. Yek bi yek li serê rawestan, ji ber çerçewa vê nivîsarê ne gengaz e. Mebesta vê nivîsarê rawestana li ser teşeyên neyînî (forme négative) ne.

Belê di ekola *Hawarê* de neyînî çawa hatiye nivîsandin ? Daçekên neyînî (me, ne, na, ni) bi lêkerê ve divê bê nivîsandin, an cihê ? Pirs ev e û lêhûrbûna me jî li ser vê ye.

Bi awayê Mîr Celadet Bedirxan⁽¹⁾

A) Laperîna* lêkera nederbaswer (verbe intransitif).

Demên tofa yekemîn

1. Boriya borî (prétérit)	Ez ketim	Ez ne ketim
2. Boriya dûdar (prétérit narratif)	Ez ketime	Ez ne ketime
3. Boriya berdest (imparfait)	Ez diketim	Ez ne diketim
4. Boriya berdesta domdar (imparfait duratif)	Ez diketime	Ez ne diketime
5. Berdesta bilanî (imparfait du subjonctif)	Bila ez biketama	Bila ez neketama
6. Hekîni (Teşeya 1a)	Ezê biketama	Ezê neketama

B) Demên hevedudanî (temps composés)

Demên pêşkerî (temps de l'indicatif)

- | | | |
|--|---------------|------------------|
| 1. Boriya çîrokî
(plus-que parfait) | Ez keti bûm | Ez ne keti bûm |
| 2. Boriya nêze-çîrokî
(plus-que parfait approximatif) | Ez diketi bûm | Ez ne diketi bûm |
| 3. Wêbêya berdest
(futur antérieur) | Ezê keti bim | ----- |

Demên bilanî

- | | | |
|--|---------------------|------------------------|
| 1. Boriya bilanî
(subjonctif passé) | Ez keti bim | Ez ne keti bim |
| 2. Boriya çîrokîya bilanî
(plus-que parfait du subj.) | Bila ez keti biwama | Bila ez ne keti biwama |
| 3. Hekîni (Teşeya 2a) | Ezê keti biwama | ----- |

C) Fermanî (impératif)

- | | | |
|---|--------------|-------------------------------|
| 1. Fermanî | Bikeve | Mekeve |
| | Bila bikeve | Bila mekeve |
| 2. Nihoya pêşkerî
(présent de l'indicatif) | Ez dikevim | Ez nakevim |
| 3. Nihoya domdar
(présent duratif) | Ez dikevime | Ez nakevime |
| 4. Wêbê (futur) | Ezê bikevim | Neyîni tu ne ye an ez nakevim |
| 5. Nihoya bilanî
(présent du subjonctif) | Bila bikevim | Bila nekevime |

Şandek I

ANÎN	bîne	me bîne
ÊXISTIN	bêxe	me êxe

Bi kurtî:

Di tofa (grûba) A de 1, 2, 3, 4 cihê 5 û 6 bi lêkerê ve ne. Di tofa B de gişt cihê, di tofa C de gişt bi lêkerê ve hatine nivîsandin.

Mîr Kamuran Bedirxan daçeka neyîniyê di *Hawarê* de mîna Mîr Celadet, lê piştî *Hawarê* bi temamî bi usûla îmla fran-sîzî, ji lêkerê cihê dinivîsîne⁽²⁾.

Ji ekola *Hawarê* Osman Sebrî⁽³⁾ û Dr. Nûredîn Zaza⁽⁴⁾ daçeka neyîniyê her bi lêkerê ve dinivîsînin.

Ev daçeka neyîniyê cihê an bi lêkerê ve nivîsandin di ekola *Hawarê* de çima rûnenîşt ? Çima hevûdu baş pê serwext nekirin ? Bê şik Mîr Celadet zana bû, lêbelê sedemên van têveliyên çi bûn ? Awayê Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza pratîktir e, lê, Mîr Kamuran çima bi temamî bi eksa vana çû. Belkî bersîv heye, lê, ez rast lê nehatime.

Ez di mentîqa awayê Mîr Celadet de têngihîştîm. Herwekî:

Tofa A; 1, 2, 3, 4 çima cihê ne, di 5 û 6 de çima bi lêkerê ve ne ?

Ku mentîq ev be, “daçeka neyîni bi hiltîne”, wê gavê meriv dikare bêje ku têveliya “di” û “bi” di aliyê fonksiyonê de ji hev çi heye ? Di A;1,2; B;1,4,5 de bi lêkerê ve ne “di” û ne jî “bi” hene, lê çima daçeka neyîniyê di vana de jî cihê ye ?

Tofa B; teşeyên neyîni yên 3 û 6 nayên nîşan dan. Bi dîtina min ji bo 3, “ezê ne keti bim, ezê ne çû bim”, ji bo 6 “ezê ne keti biwama, ezê ne çû biwama/ezê ne çû bûma” di zimanê axaftinê de tê bikaranîn.

Dîsa bi dîtina min neyîniya ANÎNê mefne an meyne
ya ÊXISTINê mexe an mexê ye.

Mîr Celadet jî Mîr Kamuran jî dibêjin ku neyîniya wêbêyê
(futur) tune ye an neyîniya nihoya pêşkerî (présent de l'indica-
tif) ya wêbêyê ye jî.

Gelo bera tune ye ? Ez ketim şikê. Çend pirs û bersîvên
teşeya wêbêyê hatin bîra min. Ka em bi hev re lê binihêrin:

- Tê herî Diyarbekirê ?
- Na, ezê neçim.
- Tê rojîya xwe bixwî ?
- Na, ezê nexwim, lê Ahmed wê bixwe.
- Tê mêr kî ?
- Na, ezê mêr nekim.
- Tê malê bifroşî ?
- Na, ezê malê nefroşim.

Bi vê teşeyê awayê axaftinê heye û gelemper e jî.

Rast e, bersîva bi neyînî ji bo teşeya wêbêyê bi ya nihoyî jî
heye, lê maneyek dinê dide:

- a)** Bi neyîniya wêbêyê
- Tê herî Diyarbekirê ?
 - Na, ezê neçim (nerim)

- b)** Bi neyîniya nihoyî
- Tê herî Diyarbekirê ?
 - Na, ez naçim (narim).

Di bersîva “a”yê de hezîr û ihtîmal heye. Lê di bersîva
“b”yê de biryardayînek heye: Kirin û nekirin gihîştîye biryareke
dawînî.

Herwekî tê dîtina di bareya rastnivîsîna teşeya neyînî yên

lêkeran de ji ekola *Hawarê* sê şax derketine û her sê şax jî awakî dîtir pêk anîne.

Di vê nivîsarê de min awayê Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza pêk anî, lewra min ew pratîktir dît.

Belê pirsra li ber me ev e, yekîtiya rastnivîsîna kurdi bi alfa-beya latînî wê çawa pêk bê ?

Malzemeya berdest: Ekola *Hawarê* sê rê derkiriye. Ji vana kîjan

- di aliyê ilmî de rastir e ?

- di nivîsandinê de pratîktîr e ? Û çima ?

Divê bersîvên vana bên dayîn ku meriv bikaribe bigihîje sentezeke bijûndar (sihhî).

Ji vê nivîsarê mebesta min di rastnivîsînê de gelşeke piçûk berpêş kirin û di dawiyê de, di navbera zimanzanan de vekirina vê minaqeşeyê ye.

(*Hêvî*, hejmar 1, Îlon 1983, Parîs)

* Pirsên rêzimanî hê di kurdi de baş bicih nebûne. Yên vê bendê ji ber kitêba Prof. Kamûran Bedirxan "*Langue kurde*" hatine girtin û em wan tevî wergerandina wan a fransîzî didin. Lapêrîn (bilapêre!) a lêkerê bi mana kişandina, bikar anîna fi'lê ye. Gotina borî ji borandinê tê û dema borî nişan dide. Kurdên Iraqê jê re rabirdû û ji wêbê re dahatû dibêjin. Teşe şekl (forme) e.

⁽¹⁾ Emir Djeladet Bedir Khan et Roger Lescot, *Grammaire kurde (Dialecte kumandji)*, Librairie d'Amérique et d'Orient, Adrien MAISONNEUVE, 11, rue Saint-Sulpice, Paris vi^e. 1970.

⁽²⁾ Kamuran Bedir Khan, *Langue kurde, Tome I et II, Éléments de grammaire extraits des cours donnés à l'École Nationale des Langues Orientales Vivantes*, Paris 1953.

⁽³⁾ Osman Sebrî, *Ziman di Jîna Miletan de*, Hêviya Welêt (Berhevok) 1976, rûpel 22-24.

⁽⁴⁾ Dr. N. Zaza, *Şerê Mêşa*, Hêviya Welêt (Berhevok) 1976, rûpel 62-64

LI SER BATEYÎ ÇEND GOTIN

*Meclîsa bê saz û heyhey min nevêt naçimeyê
Bê def û bê çeng û bê ney min nevêt naçimeyê
Bezmeya bê yarê Batêy min nevêt naçimeyê
Bê feraxet yarê Batî îşwekara min nehat.*

Bateyî ()*

Xanî – Mem û Zîn, Cizîrî – Dîwan, Herîrî – helbesta nivîsandî ya pêşîn di edebiyata kurdî de çawa muteradifê hevûdu bin, Bateyî jî an Mele [Ahmed an Huseyn]ê Batî(**) û Mewlûda kumancî her wisa bê hevûdu nayên bilêvkin. Ew mewlûda ku bi

*“Hemdê bê hed bo Xwedayê alemîn
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn”*

dest pê dike, ji aliyê her kumancê sunnî ve di jiyana xwe de bi hindikî du-sê caran bi wecd û jixweveçûyinek dînî hatiye guhdarîkirin. Hin ferd û beyitên wê ji aliyê xwenda û nexwenda ve ji ber tên zanîn.

Bê şik bareya mewlûdê li ser bûyîna pêxemberê dînê îslamê ye. Lê, ev ne çîrokek besît e. Bi munasebeta bûyîna Hezretî Muhammed, di çerçewa felsefa îslamî de “Tekwîn” an afrirandîna kaînatê jî bi şîrîyeteke bilind hatiye dayîn.

Di medresên Kurdistanê de piştî xwendina Qur’anê bê îstisna Mewlûda Bateyî tê xwendin. Di îslamiya Kurdistanê ya sunnî de feqehêk berî her tiştî divê bi xwendina du tiştan biza-nibe; a yekem “Yasîn” û ya duyem xwendina mewlûdê. Bêşik ev,

aliyê wê yî dînî ye. Lê di aliyê sen'et û edebiyatê de Mewlûda Bateyî yek ji hêjatirîn eserên edebiyata kurmanciyê ye. Helbet ji kurmanciyê mebesta me kurmanciya jorê ye.

Hetanî şa'irên *Hawarê* (Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can), şa'irên edebiyata kurmancî gişt mutesewwif in. Di bareya şa'irê me yê pêşîn Eliyê Herîrî de zanîneke me ya fereh tune ye. Lê herçî yên mayî di evîna xwe ya mirovîn de jî di kujekî, di kuncikekî de xwe avêtine dawê Xwedê an yê pêxember. Di daxwaziya “dewlet”a Xanî de bi xwe “dewleteke rût” tune, “dîn û dewlet” heye:

*Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêkra bikira me inqiyadek
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet
Xanî, Mem û Zîn*

Bateyî bê fetil û çiv sofî ye. Ew evîndarê pêxemberê îslamê hezretî Muhemmed e. Bi evîna wî, bi evîna şefaeta wî keledoşî dibe.

*Hilo rabe Ebul-Qasim hilo ey qasidê ekber
Hilo fexra benî Haşim hilo rabe tu î rehber*

....

*Hilo carek ji wê xakê siyarê heft eflakê
Belê sultanê lewlakê tu î ey saqiyê kewser*

....

*Here pêş î Xwedayê me, rehîm û rehnumayê me
Şefaet ke xetayê me, li dîwanê bike mehder.*

Di lêhûrbûna şa'irekî de çend nuqte hene:

1. Ziman û uslûb,
2. Wezin û qafiye,
3. Aheng û lîrîzm
4. Afirandin û nûyîtî
5. Îdeolojî an felsefe

Di şa'îrên kurmanc ên klasîk de yê zimanê wan herî sivik û xwerû ne; Bateyî û Feqiyê Teyran in. Tevî ku şa'îrê pêşîn e, zimanê Herîrî jî sivik û xwerû ye.

Bateyî mewlûdê bi zimanekî sivik û xwerû nivisandiye ku ev xwerû bûn, bi nîsbeta zimanê dîwanê yê Cizîrî û yê Mem û Zîna Ahmedê Xanî çî bigire ji sedî heftê-heştê ye.

Bateyî hem bi zimanê muxlaqê dîwanî û hem jî bi zarê gundiyan dikare di şî'rên xwe de biaxife:

*Ey ne'tê tu ez 'erşê heta ferşê şehîra
Ez pertewa nûra te cihan geşte munîra
Ey seyidê 'alem bike perwayê esîra
Qed kane lek-el-fesl û lek-el-cûd û kesîra
Ursîlte îlel xelqî beşîren we nezîra*

Di hemberî vî zimanê muxlaq de, ew dikare wek gundiye-kî kurmanc bêje:

*Ji Çîrya paşiyê pê da Melayê Bateyî kanê
Sefer kêşa be Miksê da li ser qewlê Zivistanê*

*Zivistanê evê yolê, evê berryê, evê çolê
Mijê avête der dolê xunavê girtî Kîstanê*

.....

*Binê daxa me êxsîra, xezel zer bûn rezê mîra
Reyhan barî di avê da, reyhan barî di eywanê*

Bi devoka Botan-Hekarê herwekî ku meriv gazî hevalekî xwe bike, bêje “Hilo Hesen!” an “Hilo Fatê!” wisa xîtabî pêxember kirin, ji hostayiya ziman bikaranînê tê.

Di şî'ra kurmancî de hunermendiya bikaranîna wezna arûzê û dewlemendiya qafiyê de du hosta hene: Cizîrî û Bateyî. Tu şa'irekî me î dinê nagihîje aheng û lîrîzma van herdû hostayan.

*Derd û dax im, bê qerar im, bê bihar im, bê çemen
Bê hebîb im, bê tebîb im, hem xerîb im, bê weten
Şîbhê Ye'qûbî ji eşqa Yûsîfê gul-pîrehan
Mûnisê derd û xeman im, sakînê beyt-el-hezen
Tarûmar im, întizar im, şehsiwara min nehat.*

*Pertewa şem'a cemalê min disojit dem be dem
Îştîyaqa zilf û xalan têk kirim deryayê xem
Dame ber pêça fîraqê weslê qet nakit kerem
Ma medetkarê me bit “îna fetehna” sibh û dem ?
Werne sotim ateşî dil şehriyara min nehat.*

*Meclîsa bê saz û heyhey min nevêt naçîmeyê
Bê def û bê çeng û bê ney min nevêt naçîmeyê
Bezmeya bê yarê Batêy min nevêt naçîmeyê
Bê feraxet yarê Batî îşwekara min nehat.*

Bêl lêartilîna ziman, mîna herikîna avê bikaranîna zimên, bi mûsîqî rabûn û rûniştina pêlên ahengê û li gora xîtab û

mebestê kurmanciya xwerû an zimanê dîwanî bi hostayî bikaranîn, lê di dawiyê de newestandina xwenda û guhdar: Ev e şî'ra Melayê Batî an Bateyî.

Bi dîtina min mezinahiya Xanî ne ji şa'irî û hunermendiya wî (ya edebî) ye, lê ji ber aliyê wî yê îdeolojîk e. Ew dewleta kurd, rizgariya Kurdistanê dixwaze. Di sedsaleya wî û ya berî wî de di nav mîrekên Kurdistanê de lipijîn, raperikîna li hemberî osmaniyan hene. Li Çiyayê Şengalê misêwa serxwerabûn hene. Evdal Xan mîrê Bidlîsê bi mîrxasî li hember Melek Ahmed paşayê osmanî şer dike. Bo çêra pezê xwe yê li zozanan, Mihemed Beg mîrê Melazgirê û hin mîrekên Kurdistanê bi leşker û eşîrên xwe di milê paşayê osmanî de şerê xanê Bidlîsê dikirin. Xanî di wan heyaman de gihîşt.

Gelo di sedsaleyên Herîrî, Cizîrî û Bateyî de rewşa civakî û siyasî çawa bû ? Zanîneke me ya zelal di vê xîsûsê de tune ye. Gava tarîxa me ya siyasî bê berhevkerin û bihevexistin, derbareya tarîxa me ya edebî de, fikra xwe bi awakî rastir gotin hê mumkin dibe.

Şa'ir dev û guhê civaka xwe ye; hezkirin, daxwazî, ecibandin û darazên (hukim) civaka xwe bi kurtî, bi tundî beyan dike. Ha em dinihêrin Eliyê Herîrî herwekî esman biqelişe û jê were wisa tê û dest bi şî'ra nivîsandî dike.

*Dilê mehzûn! Kefaret bit ke îm şeb taze mîhman têt
Be mizgînî beşaret bit ke mîhman canê canan têt*

*Ke mîhman canê canan e, le ser çahvê me mîhman e
Be mala cumleê xane, ke şahê cumleê xan têt^(*)*

Belê Herîrî “le ser çehvê me” hat, lê çawa hat ? Hoyên civak-aborî û siyasî çî bûn ku Herîrî dest bi şî’ra nivîsandî ya kurmancî kir ? Û çima Cizîrî got:

*Ger lu-luê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer şî’rê Melê bîn, te bi Şîrazî çî hacet ?*

Ev pesindayîneke rût bû ? An jî ji medreseyan heta qesrên mîrekên kurdan bi rêgeha edebiyata dîwanî di bin gefa “şîrazîyan” de bûn ? Li ber edebiyata farisî, kurmancî di xeterê de bû ? An bi mebesta serxwebûna xwe mîrekên kurdan xwestin edebiyata xwe ya serayê biafirînin û vê bi Herîrî û Cizîrî dan kirin ? Gelo Mewlûda Bateyî mertalê xweparastina kurmancî bû li hemberî siyera erebî an ayînên erebî yên dîtir ? Belê ev gişt pirs in, hezîr in. Heta tarîxa siyasî ya Kurdistanê bi awakî zelaq neyê bihevexistin, bersîvdana van pirsan jî ewê ji daxwaziyên şexsî wê de neçe.

Em paşîya gotinê dîsa bi Bateyî bînin:

*Dîlberek min di di xew da, dêm wekî bedla şefeq da
W’ez kirim dîwam û sewda, ax gelo derman heye ?*

*Dêm wekî bedra hilal e, şu’le ye b’husn û cemal e
Nezerek bo min helal e, min diye fetwa hey.*

(Hêvî, hejmar 2, Gulan 1984, Parîs)

(*) *Dîwana Kurmancî*, Ebdulreqîb Yûsif, Baxa[Bexda] 1971, çapî ewel, çapxaneyî Necef.

(**) Dîtinek heye ku dibêjin navê Melayê Bateyî Huseyn e, ne ku Ahmed e.

ŞA'IRÊ RONAHÎ Û HIŞYARIYÊ CEGERXWÎN

Mele Şêxmûsê Hesenê Hesarî di çaryeka pêşîn a sedsala bîstî de bi peyatî kete meydana şî'ra kurmancî, li hespê têkoşîna rizgariyê siwar bû, bi navê Cegerxwîn pêncî û neh sal bêî ku raweste hespê xwe li vê meydanê bezand. Bi dostan, bi neyaran, bi kalan, bi sûtalan navê xwe da bihîstin û pejirandinê. Ev nav bû mertalekî nependî, zexim û stûr, li ber pejinên welatparêziyê li hemberî tîr û êrîşên propaganda û kirên dewletên Kurdîstanê parvekir û tevkarên wan ên hundirîn. Dengê wî bû tovê hişyariya li şexsiyeta xwe ya milî ya kurdî xwedî derketinê, bi taybetî di nav me kurdên Kurdistanê bakur de.

Dengê Cegerxwîn bi destê feqeh û melayên welatparêz cara pêşîn hate di guhên me de olan da. Ji ber xisûsiyeta xwendina wan ku ew gund bi gund, bajar bi bajar li cih û deverên welêt digeriyan, ji ber ku metoda hînbûna wan li ser jiberkirinê bû û di nav rewşenbîrên kurdên wê demê de yên ku xwe wari-sê tevgerên milî yên Kurdistanê wek yên Şêx Seîd, Şêx Ubeydullah, Şêx Şehabedîn-Seyid Elî-Mele Selîm didîtin, ew bûn; vê qasidiya mêjûyî jî li xwe girtin.

Di çûnûhatina xwe ya xwendinê de feqeh bi navtêdan û piştgiriya seydayên xwe şî'rên Cegerxwîn ji devkî ji ber dikirin, li gora xwe bi awayê bêlimteyê (bêrûte/bêlûte) bi meqam vedikirin, di dawet û dîlanan de wek dîlok distran:

*Welatê min tiwî bûka cihanî
Hemî bax û bihişt û mêrg û kanî*

Di civatên mela, şêx û axayên welatparêz de şî'rên wî bi meqamên xezel û qesîde dihatin xwendinê ku di wan civatan de ji mêj ve timî Cizîrî, Feqiyê Teyran, Bateyî, Xanî û Axtepî bi wec-deke bilind dihatin xwendin. Di civatên wisa, hînbûyiyê şî'ra kurdî de bi dengêkî zîz û sotî ku melakî destê xwe bide ber guhê xwe û bistrê:

*Nalînek tê guhê min, lê winda û nîhan e
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dûxan e
Barek da ser milê min, lê barekî giran e
Dane ser hev kulê min, hemû derd û bela ne*

*Îro roja xebatê, serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li kû maye soza we
Hon tev şêrên di latê, rovî kete koza we
Şikestine di matê; dijmin biriye boza we.*

Kî heye gelo ku xwe li berê ragire; şewat, pêt, dû û dûxanên li welêt bi bîr neyne ?

Ji civatên mela, şêx û axayên welatparêz herwekî ku xuya ye mebesta me helbet giştahiya mela, şêx û axayên Kurdistanê nîne. Ji xwe ku bi giştan re ev pejinên welatparêzî hebiwa; tevgerên milî teknediçûn, qîrîn û nalîna Cegerxwîn jî tebiî ye ku bi vî awayî hilnedibû.

Şî'ra Cegerxwîn hêdî hêdî ji hucrik û medreseyên feqeh û melayan derket, li nav xwendevanên xwendegehan, li nav gen-

cên nûhatî, li nav sazband û mitribên Kurdistanê belav bû. Di “mîtingên rojhilat” de dehol û zirne li pêşiya karwanê welatparêzan ku ji Qers, Agirî, ji Cizîr û Hekarê, ji Dêrsim û Ruhayê hatî, meqamê

*Welatê Kurda tev xêr û bêr e
Hemî maden e, tev zîv û zêr e
Lê çi bikim îro maye j' xelkê re*

lêdixistin. Li ser kursiyê axaftinê “Heval Paul Robson” dihate xwendin. Di salonên mehkeme û di hewşên bendîxanên siyasî de şîrên wî bi sirûdî ji devekî li hember kirinên kolonyalîzmê dihatin gotin. Li hember biryarên mehkemê yên 8-16 sal hebsa giran, bi sirûdî xwendina “Ala Min” ku ji devekî digotin:

*Te bi zîv zêr tevde kil dim
Roja cengê ez te hildim
Ger ez bimrim ger ez rabim
Cegerxwîn im, serbilind im.*

Ev xwendin an şîrên wî helbet jimara salên bendîxanê danedixistin, lêbelê hêza xwe lipiyahiştinê xurt dikir.

*Welatê kurdan hemî çîmen e
Egîd û şêr û piling tê hene
Hemî heval û pismamê me ne.*

Ji devê dengbêj û bi awazên spehî yên sazbandên Radyoya Erîvanê li panahiya Kurdistanê gava diweşiya, pê re kaxizê piştrastiya huwiyeta milî dikir berîka gelê kurd.

Îro ji heft heta heftê salî yên ku carek an du car ji Aramê Dîkran, Mihemed Şêxo, Mehmûd Ezîz, Temo, Şivan-Gulîstan, Ciwan Haco, Dilgeş, Şiyar li yekî guhdarî kiribin, lê nav û şî'ra Cegerxwîn nebihîstibin, pê besta wan a kurdbûnê, hêrsa wan a raperikînê geş nebûbe, gelo heye ?

Ne bi tenê di nav kurdan de, di van salên dawî yên berî 12ê Îlona 1980yî hin şa'irên tirk ên pêşverû wek sembolekê navê Cegerxwîn, Xanî, Mem û Zîn bi hevdû re di şî'rên xwe de bi kar tanîn.

Seyda çî bigire nêzîkî şêst salî bi mexlesa xwe ya Cegerxwîn jî. Navê wî herwekî xwendevan pê dizanin Şêxmûs bû. Lê wî mexlesa xwe ya Cegerxwîn ew çend li xwe girt ku gengaz e carna navê xwe yê berayî ji bîr kiribe.

Di edebiyata dîwanî de mexles çî bigire hêmaneke esasî ya vê edebiyatê ye û çî bigire zerûrî ye, herwekî navên artistîk ên aktor û aktrîsên îroyîn.

Cegerxwîn mexlesa Seyda ya dudiwan e. Cara pêşîn wî mexlesa "Mûsayê Hesarî" an tiqûtenê "Mûsa" bi kar anî ye. Di nivisandina "Cegerxwîn" de, Seyda tucar bi awakî nenivisandiye: "Cegerxwîn", "Cigerxwîn", "Cîgerxwîn", "Cîgerxûn", "Ciger (bi)...xûn". Herwekî li ser dîwana pêşîn û ya dudiya "Cegerxwîn", lê li ser ên dinê yên dûmahiyê "Cigerxwîn" hatiye nivisandinê ku gava meriv bixwaze wek Seyda mexlesa wî bini-visîne, bivênevê dikeve dudilîyê.

DI ŞI'RA KURMANCÎ DE CIYÊ CEGERXWÎN

Cegerxwîn şa'irekî ji şa'irên kurmanciya jorîn e ku rûpela şî'ra kurmancî ya sedsala me bi navê wî geş biye. Giringî û mezinahiya wî ku dergehê şî'ra têkoşînê li edebiyata kurmancî vekirîye.

Şî'ra kurmancî helbet bi Cegerxwîn dest pê nake. Hetanî Cegerxwîn şî'ra kurmancî pênc sed – şeş sed salekê li pey xwe hiştiye ku di destpêka wê de hê hisûpîsa hin ziman, gel û dewletên modern ên îroyîn tune biye.

Çawa ku şî'ra kurmancî bi wî dest pênekirîye her wisa jî ostayê mezin ê şî'ra kurmancî yê pêşîn jî ne ew e. Di rûpelên şî'ra kurmanciya jorî de Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî (Batî), Axayê Bêdarî, Ahmedê Xanî, Smaîlê Beyazîdî, Siyehpûş, Axayok, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Hacî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Nûredînê Birifkanî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Şêx Evdîrehmanê Axtepî (Aqtepi), Mensûr Gergaşî, Mîna, Macin, Sadiq, Bekir Begê Erzî, Pertew Begê Hekarî, Evdîrehîm Rehmî hatine înzayên xwe avêtinê. Ji vana yên di huner û edebiyatê de herî xurt sê-çar osta ne ku her yek ji xwe re rêke arizî vekirîye, yên mayî çî bigre bûne dûvajoyan an teqlîdkirên wan. An jî di şa'irî û arizî bûnê de lewaz mane.

Di rêzeçiyayê şî'ra me ya bûrî de ostayên navser ev in:

1. Melayê Cizîrî,
2. Feqiyê Teyran,
3. Melayê Bateyî,
4. Şêx Ahmedê Xanî.

Çi bi osta, çi bi şagirt û niv-ostayên xwe ve şî'ra me ya heta dema Cegerxwîn, şî'ra dîwanî bû.

Bêî pêzanîna bi xisûsiyetên edebiyata an şî'ra dîwanî, têgi-hîştina ji şî'rên me yên wê demê ne gengaz e, û tesbîtkirina ciyê Cegerxwîn di şî'ra kurmancî de wê yaxurî be. Ku kevin neyê zanîn; hêjayî bi nû dayîne li rû dimîne. An di xisûsa “qels” de pêzanîneke me tune be, dê emê çawa bizanin ku “xurt” çi ye ? Ji ber vî çendî ji bona pêzanînên hin xwendevanan teze bikin, divê piçekê li ser xisûsiyetên şî'ra dîwanî rawestin, di pey de wê û ya Cegerxwîn bidin ber hev, da bikaribin jê bigihjin netîcekê.

XISÛSIYETÊN ŞÎ'RA DÎWANÎ

Bi derketin û belavbûna dîne îslamê, ji ber ku zimanê Qur'anê bi erebî bû, erebî di nav gelên bisilmanbûyî de bû zimanê resmî yê dîni û kete rewacê. Li Misrê û li bakurê Afrîkayê zimanên gelêrî yên medeniyetên kevin ji meydanê birand, zimanê samî yên rojhilatanavî di nava xwe de asîmîle kir.

Erebî herwekî welatên dîtir bi rêgeha Qur'anê kete nav jiyana gelên îranî û tûranî jî. Îran di navbera Romayê (rojawa) û rojhilatadûr (rojhilat) de merkezeke siyasî ya navendî bû. Ji ber vê xisûsiyetê di adaptebûn û adaptekirinê de zîrek bû. Bi deriyên xwe vekirina ji zimanê erebî re şî'ra farisî û şî'ra erebî leqayî hevûdu bûn. Cazîbeya muzîka wezîna şî'ra erebî, erûz li xweşa şa'îrên Îranê çû. Sîstema wezîna, qafiye, redif û hunerên belaxetê yên erebî anîn tevî terkîb û mezmûn (sembol) ên erebî-farisî adapteyê zewqa jiyana xwe kirin. Ji vê, modeya edebiyateke nû afirî ku ev edebiyata bilind bû. Ev edebiyateke bilind bû, lewra

xîtabî ehlê serayê û medreseyan dikir, şairên wê kultureke bilind a zadeganî stendibûn û xîtabî tebeqa bilind dikirin. şairên wê şîrên xwe li gora herfa paşîn a qafiya şîrê, ji “elîf”ê heta “yê” li rêzê di defterek de dicivandin ku ji vê defterê an berhevokê re dîwan dihate gotin. Navê şî’ra dîwanî ji vê “dîwan”ê tê.

Ev edebiyata ha di Îranê de hate dinyayê, givrik bû. Hêdî hêdî şewqa xwe da ser edebiyatên hawirdorî. tirkên azerî, çaxatayî û osmanî ketin binê tesîra wê û hewil dan xwe ku bigihîjin ostaya şairên faris.

Kurd jî xelkekî ji xelkên rojhilatanavîn bûn, îranî bûn. Bivê nevē ew jî li gora modaya wê rojê li riya şîrê kudandin.

§ Ev edebiyat bi ziman, kultur û zewqa xwe xîtabî tebeqa bilind dikir. Cî û warê wê seray û koşkên şah, sultan, mîr, tekye û medreseyên şêx û melayan bûn.

§ Wezin an pîvana ristê (misraê) erûz e. Erûz ji gelek behran û her behrek jî ji gelek qaliban pêk tê. Qalib li ser hîmên kîteyên (heceyên) kin (an vekirî) û dirêj (an girtî) hatine avakirin.

§ Yekîneya nezmê beyit (malik) e. Beyit du rêzik in. Mane û mentîqa gotinê ji serê beyitê dest pê dike û di dawîya beyitê de diqede. Di xezelek diwanzdeh an qesîdeyek bîst û çar beyit de tiştê ku beyitan bi hevûdu girê bide ne mane, ne mentîq an jî ne mijara tevahî ye, lêbelê tiqûtenê qafiye, redîf û wezin e. Beyita pêş an ya di pey de yekîneyên serbixwe ne.

§ Ev edebiyat bi jêderk û xîtabkirina xwe ya şêx, mela, mîr, şah û sultan an ya xwenda û hakim an e. Şa’ir ji wan e û xîtabê zewq û kultura wan dike. Ji ber vê jî zimanê wê ji yê xelkê awartetir e. Ji terkîbên erebî-farisî yê giran û mezmûn (sembol) ên mîtolojiya kevin zimanekî çêkirî tê pê ku carna zimanê eslî yê milî di şîrê de nayê xuyan kirin. Herwekî:

*Mezmûnê miraselatê lareyb
Meşhûdê mikaşefatê bîlxejb*

*Mehbûbê qulûbê men lehul-qelb
Qelban tu dikî bal xwe ve celb
Xanî, Mem û Zîn (1/6,7)*

Di şî'ra Dîwanî de Mijar û Tema

Di şî'ra dîwanî de awayê jiyana zadeganî ya îranî û zewqa honandina bêjeyê ji ya farisî, hakimê mijar û temayê ye.

Mîtolojiya Îran û ereb a bisilmankirî ku di eslê xwe de bi çend sed an çend hezar salan berî Îslamîyetê hebiye, tevî qehremanên xwe ve mijarên vê edebiyatê ne.

Cogrfayake ku bi tixûbên xwe li ser riyê erda dinya me bi xumam e; Çîn û Maçîn, Milkê Fireng, Çiyayê Qaf cogrfaya wê ye.

Evîn

Evîna şî'ra dîwanî bi xetên xwe yên gelemper ne evîna însanî ye. Aşiq heye, maşûq heye. Aşiq şa'ir bi xwe ye; zelîl e, mexdûr e, mezlûm e, hêsîr e. Maşûq di sifetê keçekê an jinekê de tê wesif kirin, lêbelê ew bi eslê xwe Xweda ye (li Cizîrî binêrin), resûlê Xwedê ye (li Bateyî binêrin), şah e, sultan e, mîr e. Di Mem û Zînê de Zîn dewlet e.

Dibe, ji ber ku dewleta me tune biye û gelê kurd bê şah û sultan bûne, şa'irên me yên dîwanî Cizîrî, Feqiyê Teyran, Xanî Xwedê û Bateyî jî pêxember ji xwe re kirine maşûq.

Pejin bi meznûnan (sembol) tên vegotin ku pêzanîna wan meznûnan bi serê xwe şaxeke ilmê ye di nav edebiyatê de. Merîx, Zelîx, Zuleyxa û Sureya ku Cizîrî gilî dike, ne stêrkên rût ên li asîmanan e; ew di mîstîsîzmê de îşaretên hin derece û meqamên

gihîştina fenafilahiyê (di xwedeyî de/di riya Xwedê de tune-
bûyîn) ne. Bi van maneyan jî ew kesên ku kultureke bilind a
mîstîsîzmê nestendibin, pê nizanin.

Felsefa Şî'ra Dîwanî

Can û cesedê şî'ra dîwanî ku pîvan (wezin), teşe (form),
mijar, tema, evîn û zîhniyeta cografî ya wê be, bêguman ruhê wê
jî felsefa wê bi xwe ye.

Felsefa şî'ra dîwanî, ne felsefêke bi xasê şî'rê bi tenê ye,
lêbelê di her awayê jiyandê de hakimê dîtina wê derûdorê ye.

Ev felsefe ji sê hêmanên girîng tîn pê:

- a. Mîstîsîzm (mysticisme),
- b. Sê hêmanên baweriya îslamî,
- c. Duperestî (dualisme) ya Misir, Hind û Îranî

a. Mîstîsîzm

Mîstîsîzma herî kevin û ya ku biye bingehe mîstîsîzma
yûnanî û rojhilata navîn ya Misira kevin e ku jê re Hermesîzm jî
tê gotin. Li gora vê ruh ronahî, made jî tarîfî ye. Ronahî ji tebe-
qa hefta ya esmana datê dinya tarî, dikeve made ku ev jî cesed e.
Ev dahatin îmtihan e. Ji bona ku ruh dîsa bigihîje nemiriyê divê
têbikoşe ku here tebeqa heftan a jê hatî. Di vê de heft gehînek
hene:

Heyv: Li tebeqa pêşîn a esman e, dehaya (zîrekiya) rama-
nê ye.

Utarîf: Li tebeqa didiwa ye, dehaya toriniyê (esaletê) ye.

Zuhre: Li tebeqa sisiya ye, dehaya evînê ye.

Roj: Li tebeqa çara ye, dehaya bedewiyê (xweşîkî) ye.

Merix: Li tebeqa pêncya ye, dehaya dadiyê ye.

Mușterî: Li tebeqa şeşa ye, dehaya zanîne ye.

Zuhel: Li tebeqa hefta ye, cihê sirên eqlê kañatî ye. Ji vê derê meriv yanî ruh derdikeve bêmiriniyê. Di destpêkê de ruh wekî ronahî ji vê derê dahatibû dinyayê ya cihê made û tarîtiyê.

Kesên ku ne ehil bin, ne layiq bin, nikarin bigihîjin vê bêmiriniyê. Ev bêmirinî heqîqet e, heqîqeta mezin e, ya Xwedê ye. Lê ne ew Xwedayê ku Mûsa, Îsa û Muhemed jê behs dikin. Ji ber ku herkes ne ehil e, divê bi vê heqîqetê herkes nizanibe, ev nependî bimîne. Tiqûtenê yên ehil hêdî hêdî di pey hin îmtîhanan de pê bizanibin. Orfeyîzm û Pîsagorasî ya Yûnana kevin, batînitî û hurûfîtî yên îranî ya bisilman dûvajoyên vê ne, lêbelê di nav herikîna zeman de hin reng û rûçikên nû wergirtine.

Bi kurtî mîstîsîzm (nependîtî) ev e; ji ber ku herkes ne ehilê xwe gihandina rastî û zanîna mezin (an mutleq) e, divê rastî û zanîn nependî bê hiştin, ji herkesî re neyê gotin.

b. Sê hêmanên baweriya îslamî

Di bareya felsefa jiyane ya dinyayê de felsefa îslamî di sê niqteyan de dihêwire:

1. Bê hewil û qeweta Xwedê tu tişteki nabe, çênabe, nayê kirin, nayê guhartin. Razîbûna bi qedera xwe çara tiqûtenê ye.

2. Qedera ku Xwedê hê di weqtê “qalûbela” yê de li eniya meriv nivisandiyê, bi tu awakî betal nabe, nayê guherandin. Li hember vê (qederê) têkoşîn û kefteleft bereday e. Divê meriv di her awayî de bi tewekul xwe bispêre li heviya Xwedê.

3. Li dinyayê rehetî tune ye. Dinya bi mirin e, fanî ye, lewra jiyana li vê dinyayê ne hêja ye ku meriv serê xwe pê re biêşîne. Li vê dinyayê li rehetiyê gerîn karê ehmeqan e.

“La hewla wela quwete îla bîlahî-l elî-yul ezîm”, “El qeder

la muxeyyer” û “La rahetî fî dunya” di bawerîya felsefa Îslamê de ewçend hişk û qutibir in ku wek qanûn in û redkirina wan an nerastiya wana gotin, kufir e: Cezayê wê jî di rêzika şerîetê de kuştin e, yanî qetila yê gotî helal e.

c. Riya gilî û gazinan: Duperestî

Dualîzm (dualîtî an duperestî) dîtineke felsefî ya gelek kevin e. Li ser bingehê duyîtiya maldaran û bêmalan ava biye; di dîn de xwe wek qencî û xerabî daye nîşandanê. Xwedeyên erdê û esman ê sumerîyan, xwedeyên qencyê û xerabiyê yên misriyên kevin, xwedeyên ronahiyê û tariyê yên Çîn, Hind û Îrana kevin numûneyên dualîtiya dîmî ne.

Di Îslamê de herçend Xweda û Şeytan hebin jî Şeytan xwede nîne. Quwet û qudreta li ser qedere û dahatûya mirovan tiqûtenê di destê Xwedê de ye. “Cuz’a ixtiyarî” di destê meriv de heye, lêbelê ev jî nikare qederê biguhêre. Û ev li ber “îradeya kullî” yanî îradeya Xwedê ne wek di quweta ronahiya gûstêrkê ya li hember quweta ronahiya Rojê de ye.

Ku mirov ji rewşa xwe ya têdayî razî bibûna wê zûbizû negihîştî gehîneka medeniyeta îroyîn. Xisûsiyetek ya mirovbûyî-nê jî ev e ku li hember bendên qedexê û qanûnan çî yên tebîetê, çî yên dîn û ekonomiyê tucar destgirêdayî nemane. Wan qedexê û qanûnan hêdî hêdî guhartine û kirine bin emrê xwe.

Şa’îrên edebiyata dîwanî jî bi vî awayî jî xwe re riyek bijartine. Ev rê nerazîbûna ji qedere nîne, lê rexnegirtina li bext, talih an qirdê xwe ye... Li hember derketina Qadirê qedere (Xwedê) nîne, lê raperikîna li hember eva ku çerx û dolaba bextê meriv digerîne; “feleka xayîn, feleka bi fetl û ger, feleka bêbext” e.

“Qeder, qencî û xerabî ji Xwedê ne” şertekî ji şeş şertên îmanê yê dîne Îslamê ye. Ji bilî Xwedê tu hêz û tişt nikare bi serê

xwe tiştêkî bike, ev jî hîmekî ji hîmên baweriya îslamê ye. Li berevajiyê vê fikirîn, şerîk û heval ji Xwedê re çêkirine ku ev jî “şirk” e û şirk jî kufr e. Li hemberê vê “felek” heye ku li ser bext (talih, qird) ê meriv, bi rastî li ser qedera meriv xwedî qudret û gotin e, lê ev wek “şirk” nehatiye dîtin. Ev “felek” biye kevirê çikandî yê kevirê gilî û gazinan avêtinê.

Ev bermayeya dualîtiyek jibîrkirî ye. Yê ku nikaribiyê bi zîhnîyetê re têbikoşe, kevirê xwe dawêşandiye felekê.

Form û Pîvanên Nezma Dîwanî

Li ser hîmên malikê (beyit) xezel, qesîde, mesnewî, mustezad û yên bi teşeyên xwe ji vana rakişandî ne.

Li ser hîmên rêzê (misra) rubaî, tuyûx, musemmat in.

Pîvana nezma dîwanî pîvana (wezî) erûzê ye.

XISÛSIYETÊN ŞA'IRÊN ME YÊN OSTA YÊN ŞI'RA DÎWANÎ

Melayê Cizîrî: Ostayê mezinê pêşîn ê edebiyata kurmançî Melayê Cizîrî ye. Di lîrîzm û hunermendiya edebiyatê de tu şa'irekî me hê negihîştiye dereca şarezatiya wî. Herikîna şî'riyeta şî'ra wî û mîstîsîzma wî ya kûr û bilind di şî'ra kurmançî de numûna yekta ye. Zimanê şî'ra wî zimanê seray û medresê ye, giran e.

Di tesewufê de ji ehlê "Wehdet-ul-wicûd" e.

Di warê xezelan de şî'razî yê kurdî ye.

Feqiyê Teyran: Di edebiyata kurmançî de çîroka menzûme ji wî dest pê dîke. Di mîstîsîzmê de kûr e. Ji ehlê "wehdet-ul-wicûd"ê ye. Zimanê wî yê şî'rê ji yê Cizîrî siviktir e, lêbelê di bikaranîna pîvana 'erûzê de bi qasî Cizîrî şareza nîne.

Melayê Bateyî: Di tesewufê de aşîqekî mirî yê Muhemed pêxember e. Mewlûda xwe ya kurmançî jî bi vê mebestê nivîsandîye. Di ahengê de xurt e, nezma wî herikandî ye. Zimanê şî'ra wî çî bigire zimanê şî'van, gavan û gundiyên kurmanca ye. Ew bi xwe bi zimanê bilind î serayê bi qasî hevalên xwe dizane, lêbelê ji ber ku erka propagandaya Muhemed pêxember û dînê wî li xwe girtiye, zimanê propagandayê yê xelkê ji xwe re bijartîye ku viya jî bi zanîn kiriye.

Mewlûda wî bi forma mesnewî hatiye nivîsandin. Ji bilî Mewlûdê xezel û musemmatên wî jî hene ku gelek şepî ne.

Şêx Ahmedê Xanî: Bavê fikra dewlet danîn û rizgarîxwaziya kurda ye. Di mijarê de milî ye. Tevî ku şa'îrên di dema wî û yên berî wî di mijara çîrokên menzûm de ji xwe re “Leyl û Mecnûn”, “Ferhad û Şîrîn”, Wamiq û Ezra”, “Yûsif û Zuleyxa” dibijartin, lê Xanî mijara çîroka xwe ya Mem û Zîn ji çîrokek gelêrî ya kurmancî ji ya Memê Alan û Zîna Zêdan hilbijart.

Di tesewufê de sofiyekî musulman e.

Zimanê wî yê şî'rê nemaze di Mem û Zînê de gelek giran e. Wisa ku meriv dikare bêje di aliyê ziman de tu şa'îrekî kurmanc bi qasî wî zimanekî ji terkîbên erebî-farisî tevlihev û giran nenivisandiyê.

HETA DEMA CEGERXWÎN REWŞA SIYASÎ Û CIVAKÎ YA KURDISTANÊ

Xanî şa'îrekî mezin bû: Mezinahiya wî ew bû ku rewş û dahatûya milletê xwe dît, vê tesbîtê kir ku heta kurd dewleta xwe ya serbixwe daneynin ji ber tomik û teşqeleyan nafilitin, di nav milletên dinê de serfiraz najîn.

Wî di nav kelîna reş-ewrên li ser serxwebûna mîrîtiyên Kurdistanê de çavê xwe li jiyane vekir. Hê 125 sal di ser lihevki-rina Sultanê Osmanî Yavûz Selîm û mîrên Kurdistanê de derbas bûbûn an nebûbûn ku osmaniyan niyeta xwe ya kirêt a di mijara Kurdistanê de hêdî hêdî azlû dikirin. Di 1639an de serxwebûna Çiyayê Şengalê, di 1665an de berxwedana Evdal Xan mîrê Bidlîsê xwe nîşan dan. Çi bi serxwerabûnî, çi bi berxwedanî te-verên gelê kurd li hember niyet û kirên osmanî ranewestan. Di 1805an de serxwerabûna Evdirehman Paşayê Babanî, 1820 serx-

werabûna kurdên zaza, 1828-39 serxwerabûnên Rewandizê, Hekarê, Tûr-Abidîn (Torê), Çiyayê Şengalê, Diyarbekirê, 1847 serxwerabûna bi mebesta dewlet danîne ya Bedir Xan beg mîrê Botan, 1857 tevgera Yezdan Şêr, 1890 tevgera Şêx Ubeydullah, 1909 tevgera Şêx Mehmûdê Berzencî, 1910 tevgera Şêxên Barzaniyan, 1914 serxwerabûn û cara pêşîn alaya serxwebûna Kurdistanê hilkirin a Seyid Elî, Mele Selîm û Şêx Şabedîn li Bidlîsê, tevgera Koçgirî, 1925 serxwerabûna Şêx Seîd efendî, serxwerabûna Agirî û 1936-38 ya Dêrsimê; xelekên zincîra têkoşînên rizgarîxwaziya milî yên kurdî ne.

Gava Xanî çavê xwe li dinyaya siyaset û zanîne vekir, bîhna xetereta li ser serbestî an nîvserbestiya Kurdistanê hilanî. Ji ber dûrbênahiya xwe ya rewşenbîrî hunerê edebiyatê kir xizmeta îdeolojiya xwe ya siyasî ku ev jî fikra “dewleta kurdî” danîne bû. Xwest dengê xwe bigihîne xan û mîrên kurdan. Lêbelê çî ji ber kurtebênahiya wan çî ji ber hoyên siyasî û civakî yên wê rojê, wan dengê Xanî nebirin xwe.

Di pey Xanî de gelek şa'ir hatin meydana edebiyata kurmancî, lê ew jî wek mîrên kurdan kurtebîn bûn, heqîqeta komeleyetiyê nedîtî, riya navdarbûyîne di dûvajoyiya mistîsîzma Cizîrî û Feqiyê Teyran, di sofîtî an heyraniya Muhemed pêxember de dîtî. Teqlîd her teqlîd dimîne, nabe orjînal. Lewra a wan teqlîda lirû ya kêmbêr bû, ji ber lirûbûyîna kûrahiya xwe ya rewşenbîrî dêlva ku ewê aliyê Xanî yê siyasî ji xwe re hilbijêrin, aliyê wî yê sofîtîyê teqlîd kirin.

Ji 1898an bi derketina rojnama “Kurdistan”ê pêde pêlên pejinên kurdayetiyê hîlbûn, mîlmîlîn. Li paytexta osmanî li Îstembolê destek xwendekar û rewşenbîrên kurd ên bilind derketin ku di cîgahên bilind ên seltenetê de xwedî nav û nîşan bûn. Tenê ne di cîgahên burokrasiyê de, lê di jiyana kulturî û rojna-

megerî, di jiyana siyasî herwekî damezrandin û têdekarkirina di Îtîhad Tereqî de xwedî paye û gotin bûn. Ev desteya bijarte ya rewşenbîrên kurd li gora rewş û hoyên rojê bi baldarîke nûjen bîra kurdayetiyê geş dikirin, li hember despotîzma seltenetê têdikoşîn. Bi kurdî-tirkî rojname û kovar derdixistin. Li bajarên Kurdistanê yê navendî “Qlûba Kurdî” dihatin damezrandinê ku serekên wan ew rewşenbîr bûn ku di nav rewşenbîrên Împaratoriyê de naskirî bûn.

Feqe Şêxmûs di van hoy û rewşan de li gora îro li çar, li gora wê gavê li du perçeyên Kurdistanê çî bigire ji serîkî heta seriyê dinê gund bi gund peyatî digeriya, feqetî dikir. Di wan gavan de dengê Hacı Qadirê Koyî çiyê neçiyê pê nizanîm, lêbelê di hucrikên medresê de piçek teqlîda Xanî û hin bêtir dûvajotiya Melayê Bateyî kir. Şî'ra wî ya herî pêşîn ku di dawîya dîwana wî ya sisiyan de bi navê “Sebebê Çêkirina Ristê Min” çapkirî, vê baweriyê dide meriv ku Seyda bi dengê Melayê Bateyî û bi teqlîda Xanî dest bi kudandina li riya şî'rê kiriye, 1925.

*Wextê min dî qewmê kurdî pir delal
Ew di nêv ehlê cihan de bê heval*

*Ba sexawet, ba diyanet, ba hiner
Min li goşê lewhê qelbim kir xeter*

*Ko beyan kim esl û ewsafên di wan
Milk û hikm û padişah û hem ziman*

*Der belaxetgahê çûme pêşî ye
Da nebêjin: Qewmê kurdî wehşî ye.*

Tevî ku bi çend sed salan berî wan şî'ra nivîskî ya kurmancî dest pê kiriye û dêwekî mîna Cizîrî wê kompleksa kêmdîtina kurdîtiyê nedîtîye; tişteki pir ecêb e ku çî Xanî, çî Axtepî û çî Cegerxwîn sebebê bi kurmancî şî'r nivisandinên xwe anîne bi vê girêdane: "Bila miletên dinê nebêjin ku qewmê kurd hov e, wehşî ye, bêmarîfet e... Bi zimanê wî şî'r nehatiye nivîsîn û h.w.d" Helbet bi zimanê xwe yê neteweyî nivîsandin, eser afirandin welatparêzî ye, ji ziman û edebiyata gelê xwe re xizmet e. Lêbelê ku qabiliyeta şa'irî an nivîskariyê di meriv de tunebe, herçend meriv bi pêlên welatparêzî û xîretkêşîya neteweyî dagirtî be jî; gelo meriv dikare rîstekê an rêzekê binivîsîne. An jî ku ev qabiliyet bi meriv re hebe ji xwe dê meriv bi zimanekî binivîsîne ku zimanê -herî çêtir yê bîr, raman, xwezî û daxwaziyên meriv axleb di şî'rê de dê bi kêrî vegotinê bê- yê meriv î gelêrî ye. Wê gavê jî ne hewce ye ku meriv mineta nivîsandina xwe li gelê xwe an li zimanê gelê xwe bike.

JI ŞA'IRÊ MEDRESÊ, BÛYÎNA ŞAÎRÊ SERXWEBÛNÊ

Mele Şêxmûs di 1924an de li ber destê Şewqî begê Erxeniyê li bîra Kurdaiyê şiyar dibe (Keyo Cegerxwîn, *Hêvî* hej. 3 – Sebat 1985). Di tenga xwe de ez ji vê kira Şewqî beg re spasdar im ku xizmeteke mezin ji bo me kiriye.

Di pey serxwerabûna Şêx Seîd efendî de dest bi xebata siyasî dike. Di 1928an de dibe seyda û dizewice, di 1930 de şoreşa nefsa xwe dike; şaşik, cube û rihê meletiyê davêje.

Seyda cara pêşîn li ser destê Şewqî beg li siyasetê şiyar dibe; lêbelê di pey de bi kîjan rewşenbîrên kurdan re dide û dis-

tîne, ji kê îstifade dike, an kî ne ku dîna wî ya kurdayetiyê pêşve dibin, mixabin ji ber ku nehatine nivîsandinê an jî çavê min pê neketiye pê nizanîm. Bîranînên wî yên çapkirî tune ne. Li gora ku min ji Azad Cegerxwîn bihîstiyê bîranînên Seyda yên nivîsandî hene li gora programa wan dê bînan çapkirinê. Hêvîdar im ku Seyda çêl li vî aliyê xwe kiribe da ku ev aliyê wî derkeve ronahiyê.

Serxwerabûna Şêx Seîd efendî di 1925a de dest pê kir û di nava çend mehan de mixabin têk çû. Lêbelê hê berî vê hin rewşenbîrên ji pêşkêşên doza kurdayetiyê yên bijarte derbasî Sûriyê ya bi hikmê Fransayê bûbûn, li wê derê xebata xwe ya siyasî dimeşandin. Tevî lihevkerina peymanê Lozanê ya di navbera Tirkiyê û dewletên alîgir jî heta dawîya şerê dudîyan ê cihanê hêviya van rewşenbîr û kurdperwerên hanê ji danîna Kurdistanêke serbixwe an otonom nehatibû birînê.

Ji alîkî ve li Kurdistanê dû û dûxan hildibû û ji aliyê dinê ve pêşkêşên vê dozê li gora hoy û rewşên wê rojê û di tenga karîna xwe de xebatên rêxistinî, siyasî û çandeyî pêşve dibirin. Pêşkêşên vê dozê ew kes bûn ku di nav civaka kurdî de hem ji aliyê rewşenbîrî hem ji aliyê cîgeha civakî ve xuyanî bûn yanî torin bûn, maqûl bûn. Di wê gavê de ji xwe kurdayetî karê maqûlan bû, lewra di Kurdistanê de sinifa karkêr tune bû û gundîtî jî bi têkiliyên şidandî yên êl û eşîrî girêdayê bi sermiyanên (serek) xwe yên feodal ve bûn.

Seyda jî bi rêgeha xwendatiya xwe yek ji maqûlên, rewşenbîrên civaka kurdî bû. Wî jî di vê çeperê de ciyê xwe yê ber bi pêşveçûna tarîxê fesiland û girt. Ji şair “Mûsayê Hesarî” gêra bû Seyda Cegerxwîn.

Netewayê kurd an doza kurdayetiyê li benda şairekî gelêrî bû ku wî ev pejin hilanî, bersîva erînî ya vê hewcedariyê dayê.

Rewşenbîr û pêşkêşên doza kurdaiyê rûmetek bilind dan Seydayê Cegerxwîn. Mîr Celadet di hejmeta 26, 27 û 28 ên Ronahiyê de bi qedirdayîneke bilind û pesindayînen hêja çêl li Cegerxwîn dike. Mîr Kamûran di *Roja Nû* de şîrên Seyda wergerandiye fransîzî. Bi munasebeta ola Yêzîdiyan Osman Sebrî bi Şêxên Yêzîdiyan re roportajek an lêkolînek çêdike, di vê nivîsara xwe de gava çêl li Cegerxwîn dike, wî “şairê me yê milî Cegerxwîn” dide nasînê ku paya “şa’irê milî” payeke wisa hêsan nîne. Ji Haco axa heta Qedrî Cemîl Paşa gelek welatparêz û rewşenbîrên kurd çî bi madî çî manewî piştgiriya Seyda kirine. Bi dîtina min ku piştgiriya wan hêzan tune biwa, êrîşên Seyda yên li hember xurafe, şêx, axa, beg û “dewlemendên bêşeref” yanî yên newelatparêz an negelperwer wê piçek dijwar biwa. Ew kesên ku kuştina mêrek û ya mêşek li cem wan wekî hev bûn, ku paxava wan ji van hêzên piştgirên Cegerxwîn ên welatparêz tune bûna, bi dîtina min an wê Seyda ew çend nejiya an jî wan şîrên xwe yên xweş ên dîdaktîk dê nenivisanda. Lê divê meriv ji bîr neke piştgirî tevkar e, lê cewher bi xwe cewherê Seyda ye, Seyda bi xwe ye.

XISÛSIYETÊN ŞÎRA CEGERXWÎN

Şa’ir û seydayê me yê gelêrî Cegerxwîn bi tarîxa ku em pê dizanin ji 1925an heta mirina xwe bêrawestan nivisand. Di warê ferhengê, gramerê, tarîxê, cografyayê de jî nivisand. Îro di kutubxana kurdî de heşt dîwanên wî hene, dîwaneke wî jî li ber çapê ye ku di nêz de dê bikeve destê xwendevanên kurd.

Di van heşt-neh dîwanan de ji heşt sedî bêtir bi formên cihê cihê şîr hene ku tu şa’irekî kurmanc ewçend şîr nenivisan-

diye. Helbet di aliyê hejmarî de pir an hindik şî'r nivisandin nabe sedemê hêjabûn an nehêjabûna şa'irekî. Hêjayiya şa'irekî bi hêjayî, nûyîtî û xurtiya hunera edebî ya şî'rê wî kesî ve girêdayî ye.

Ji bona têgihîştina hêjayiya şî'ra Cegerxwîn, divê meriv şî'ra wî li çar bêjingên şî'rê xe. Ev bêjing jî ev in: Mijar, teşe û pîvan, nûyîtiya bi nîsbeta kevin an têkiliya bi ya kevin re, felsefa hunerê û jiyanê.

I. JI ALIYÊ MIJARÊ VE

A. Şî'rên siyasî û komelayetî: Xîstûsiyeta herî nû û mezin a şî'ra Cegerxwîn ji vê tê. Di şî'rên xwe yên li ser mijara siyasî û komelayetî de Seyda dîdaktîk e, yanî hînkir e, şîretkir e. Ev di şî'ra kurmancî de nûyîtîkî ye ku bi wî dest pê dike.

Aa. Şî'ra Cegerxwîn têkoşer e: Ji bona rizgariya Kurdistanê, ji bona serbestiya gelê kurd, ji bo wekheviya qor û çînên civakî, ji bo rakirina damezranên kevnare ku li ber serbestiya gel û wekheviya qor û çînên civakî dibin bend, ji bo maliştina xurafe û baweriyên pûç û ji bo avakarina dinyake aşîtxwaz têdikoşe. Êrîşên şî'ra wî yên li ser dewletên Kurdistanê dagirkir, bi mebesta rizgarkirina Kurdistanê û gelê kurd e. Piştî ku Kurdistan rizgar bibe, gelê kurd bigihîje serbestiya xwe, wê çî dijminahiya Cegerxwîn yanî ya gelê kurd li hember ereb, faris û tirkan bimîne. Divê meriv viya jî ji bîr neke ku gava çî Cegerxwîn çî yekî mîna wî bi êrîşkirin ji “ereb”, “faris”, an ji “tirk” xeber dide, mebesta wî ji bilî hêvotkarên dewletê û çînên hakim ên wan welatan pêve tişteki dîtir nîne.

Şî'ra Cegerxwîn têkoşer e:

*Kurdino, merdino, pîr xweş e serxwebûn
Ew demên tar û teng ko me dîn vane çûn
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat yan mirin ya memat
Roj li me hate der, zû şiyar bûn ji xew
Ev dema ceng û şer, paş ketin êdî hew
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat yan mirin ya memat*

Ab. Şî'ra Cegerxwîn ronîkir e: Ji ber şer û êrîşên leşkerî yên Romayî, Bîzansî, Mongolî, Erebb û h.d welatê me kurdan timî biye ciyê talan û tajanê, dû û dûxanê. Di zemanê osmanî û dewleta kemalîst de çî bigire ji deh salan carek ev hatiye carî kirin. Herçend me serî li ber dijminên xwe dananîbe jî, ji aliyê leşkerî ve em têkçûne. Di vê têkçûnê de hebûna me ya madî yanî dewlemendiya me ya aborî ji aliyê talankeran ve hatiye maliştin. Di pey her têkçûnê de gelê me li jiyana aboriya xwe xebitiye, piçek piştî xwe rast kiriye dîsa bi ser de lehiya êrîşeke nû hatiye. Gava şerê leşkerî li Sêrtê, Hekarê çêbiye; ew der ji xwe hatine talankirinê, lêbelê pê re jî kurdên Sêwas û Meletê jî bi riya bertilên şexsî an alîkariya ji bo dewletê hatine talankirinê. Ev bûyer bi sed salan her wisa berdewam biye. Xizanî maka nezaniyê ye. Hingî em têk çûne em xizantir bûne, hingî em xizantir bûne em nezantir mane. Xurafê û baweriyên pûç di tarîtiya vê nezaniyê de xwe li me rapêçane. Cegerxwîn bi vê dizane û lewra di her firsetê de dixwaze gelê xwe ronî bike:

*Bes e paçik ji guh derxe çî hawar û çî qîrîn e
Xwe rapêçe ji bo cengê bi zor heqê xwe bistîne*

*Dizî û cirm û bêş û zor, bes e millet li te şerm e
Dema tang û firoka ye, çî xişt û def û tizbî ne ?*

*Bixwîne da ku serbest bî, bi xurtî bighê doza xwe
Binêr her tişt li dinyayê wekî cenga Filestîn e.*

*Cegerxwîn tim dikî qêrîn, sitem dimrî bi hikmê dem
Ji min bawer ke ey millet nebê dîn e ne bê dîn e.*

Di ronîkirina xwe de Cegerxwîn rexnekir e jî:

*Nifrînekê ji Yezdan dikim, tu bêje amîn
Şêx û melayên kurdan belengaz û geda bin*

*Lewra yekî ji wana qanûn bi zarê kurdî
Ji bo me çênekir qet, ji ber vê em nezanin*

*Feqî bi xwe nezan e, seyda dinêrî qamûs
Her yek bi dil dibêjin em miştiyê zeman in.*

*Bi kurdî ger bixwînin bê renc û bê giranî
Bê qeyd û şerh û haşî cahil bi xwe dizanin.*

Ac. Şî'ra Cegerxwîn qîrîn, hawar û gaziya gelê kurd e: Li ber çavê dinyayê, li ber çavê azadîxwaz, demokrasîxwaz, aşîtxwazên dinyayê welatê kurdan dû û dûxan, gelê kurd li ber zor û sitemê di gola xwînê de bê dost û heval û perîşan e.

Mafê gelê kurd ên di dest de bi tenê qîrîn û gazina wî dimîne.
Diqîre ka ku dengê wî bibihîzin, ka ku yên ji wî bi xwe dengê
xwe bibihîzin:

*Welatê Kurda tev xêr û bêr e
Hemî maden e tev zîv û zêr e
Lê çi bikim îro maye j' xelkê re*

*Welatê Kurda hemî çîmen e
Egîd û şêr û piling tê hene
Hemî heval û pismamê me ne*

*Koma miletan ma qey tu ker î
Çavê te kor e tu l' me nanêrî
Yaxud dijmin î, ji me nagerî*

*Gunhê me çiye bo çi deng nakî
Pirsê ji halê me Kurdan nakî
Em kêm ketine, tu me ranakî*

*Ma ne hêja ye, em herdem ba kin
Ax û xweliyê bi ser xwe dakin
Yan bibne dewlet, yan bêne kuştin
Yan dilxweş bimrin, yan dil bi matem.*

* * *

*Xakî Kurdistan bi qurban pir ciwan û paqij î
Xwîn rijandin pir kurên te wa li her alî rijî
Miletê kurd ta ku sax e ew ji vê rê nagerî*

*aferî... aferî..
Qadî Mihemed aferî*

*Ey Tirûman kuştina Qadî Mihemed ka çi ye ?
Qey edalet tim wisa ye, hukmê dîmûkratî ye
Lê bi kuştin û bi zîndan miletê kurd namirî*

*aferî... aferî..
Qadî Mihemed aferî*

Meriv dikare şîrên siyasî û komelayetî yên Cegerxwîn li gora temayên wan bi vî awayî par veke:

1. Li ser rizgariya Kurdistanê
2. Li ser yekîtiya an yekîtxwaziya gelê kurd
3. Pesnê qehremanên tarîxî-mîtolojîk ên kurd û îranî
4. Êrîşên li dijî şêx, axa, beg û dewlemendên ku li ber yekîtiya gelê kurd û rizgariya Kurdistanê bend in û tevkarê dijmin in.

5. Aşîtî û demokrasîxwaziya cihanê
6. Li ser têkoşîna çîna proletar û gundiyan
7. Şîretên li ser pîr û pergala, rabûn û rûniştinê
şîrên wî yên siyasî-komelayetî bi piranî bi mebesta propaganda û ajîtasyonê hatine nivisandinê. Ji ber vî çendî dengê wan gurr e. Yên xwendina li meydana û kolanan e, yên lixwexistina serxwerabûnê ne.

B. Şi'rên evîndariyê: şî'rên Seyda yên evîndariyê di du tofan de berhev dibin. Tofa pêşîn ew in ku dilketiya Seyda jin e an keç e, lêbelê ev jin an keç an dayik bi xwe sembola Kurdistanê ye. Di xwendina şî'rên ji vî celebî gava çêl li dilketiya xwe dike, jineke bi ser û sinc, bi laş û gewde dixuye. Lêbelê ev jina ji aliyê Seyda ve hembezkirî û li ber ramîsana nişkave dibe “dayika welat”, “dayika Kurdistan”. Şî'rên wî yên ji vî tofê meriv dikare bêje ku berdewama şî'ra me ya klasîk e, bi vî têveliyê ku di şî'ra klasîk de “Xwedê” di ya Cegerxwîn de cihê xwe daye “welat” an “Kurdistan”ê.

Şî'rên wî yên tofa diduyan rasterast yên li ser evîna muşexes (konkret) e. Dilketiya Seyda jineke an keçeke zindî ye: Bi çente, qundere, kember, bazin, guhar e. Bi seyda re li konser, meyxane û tiyatroyê ye, di locayê de carina bi hev şadibin. Bi hev re şerabê vedixwin, Seyda bi sêvên wê dileyize.

Şî'rên Seyda yên tofa pêşiyê dûmahîka şî'ra me ya klasîk e ku şa'ir evîna xwe ya beşerî ji ber şerm û fediya dinyayê ku bixwesta jî nikaribû bianiya ziman, çêl lê bikira. Kirasê Xwedê li dilketiya xwe kirin meşrûiyet dida evîna şa'ir. Ku meriv hin şî'rên Cizîrî ji “kirasê xwedetiyê” bi şêlihîne ewê rasterast bibin şî'rê evîndariya beşerî, belkî piçek bîhna mustehceniyê jî jê bînin. Seydayê Cegerxwîn vî “kirasê xwedetiyê” jê şêlihandiye, lê belê “kirasê welat an Kurdistanê” lêkiriye.

Di şî'rên tofa diduyan de Seyda rêçîka evîndariya folklorîk ajotiye. Di stranên folklorîk an gelêrî yên kurdî de ji hezkirina keç û xort, jin û mêr re tixûbek kişandî tune. Nemaze di dûrikan de ji navê berjêr û ji navê berjor ew çend tişt têne gotin ku yên hîn nebûyî ji berê şerm dîkin. Ji aliyê bi serbestî gotina li ser evîna beşerî Seyda rêçîka folklorê ajotiye; lê di aliyê form, aheng û gotinê de ‘en’eneya xezelê meşandiye.

II. JI ALIYÊ TEŞE Û PÎVANÊ VE

Çi yên siyasî-komelayetî çî yên evîndariyê şî'rên Cegerxwîn ji aliyê teşeyên (form) xwe ve klasîk in. Piraniya wan bi teşeyê xezel û mesnewî hatine nivisandinê. Wekî “Paul Robson” mustezadên serbest û hin ên dîtir ên mustezad jî hene. Wekî dinê bi teşeyê musemmat jî şî'rên wî hene ku ev gişt ji aliyê teşe ve teşeyên klasîk in. Ji bilî vana Seyda bi teşeyê dûrikên ber tembûrê jî çend şî'r nivisandîye ku “Ji Hevalekê re”, “Gulperî”, “Padîşeha Evînê” ji vana çend numûne ne.

Ji aliyê pîvanê (wezin) ve şî'rên Seyda piranî bi erûz in.

Çi ji aliyê teşe çî ji aliyê pîvanê de şî'ra Cegerxwîn şî'reke nû nîne, bi maneya kevinî klasîk e. Lê divê meriv vê jî ji bîr neke heke ew bi teşe û pîvana xwe ji ya kevin awarte biwa ji aliyê xelkê ve belkî ewçend nehata girtin û hezkirinê, di xwendina li meydanan û kolanan belkî ewçend tesîr li gel nekira.

III. JI ALIYÊ NÛYÎTÎ Û KEVINTIYÊ VE

1. Ji aliyê teşe, pîvan, deng û ahengê ve şî'ra Cegerxwîn şî'ra Cizîrî ya bê mîstîsîzm, ya jiyana sedsala me ye. Qalib kevin e, ruh nûjane.

2. Ji aliyê ziman û xîtabî xelkê kirinê de Cegerxwîn Bateyî yê sedsala me ye. Bi zimanekî ku herkes jê têbigihîje û bi mebesta propagandayê herdû jî şî'r nivisandîne. Bateyî propagandaya dînî ya hezretî Muhemed dikir, Cegerxwîn ya rizgariya Kurdistanê dike.

3. Xanî fikra dewlet danînê bi diyarî berpêşî miletê kurd kiriye. Lêbelê Xanî di vê de bêtir wek alim, filozof û dîplomat

xebatê kiriye. Xanî dayînî û mamostayiya vê fikrê kiriye, lê Cegerxwîn milîtan û ajîtatorê vê dozê ye; gotina xwe rasterast bi hêrs, qîrîn û navtêdanê dibêje. Ji bona ku meriv ji Xanî fêm bike divê ku meriv xwenda û zana be, lê ji bona fêmkirina ji Cegerxwîn ne hewce ye ku meriv xwenda û zana be. Herdû ji hunerê xwe kirine xizmeta siyasetê û civakê, lê hunera Xanî arîstokrat e, ya Cegerxwîn gelêrî ye.

IV. JI ALIYÊ FELSEFA JIYANÊ VE

Di şî'ra kurmanciya bakur de şa'irê pêşîn ku felsefa jiyane ya komelayetî û şî'ra kevin girtiye avêtiye Cegerxwîn e. Di hoyên îroyîn de ev ji me re gelek manîdar neyê jî, di hoyên salên 1920 hetanî 1960î yên Kurdistanê de gelek manîdar e. Şa'irekî ku ji melatiyê hatiye, bi salan bi vê felsefa kevnare ya di ruhê mirovan de hestîgirtî xwendin û gihîştina xwe biriyê serî, belkî heta wê demê ew û felsefa nûjen a rojava qet bi rûbarê hevdû neketibin, di nav komela kurdî de bi carekê radibe li dijî prensîbên binge-hîn ên vê felsefê derdikeve. Li hember "La hewla wela quwete îla bilahî-l 'elî yul 'ezîm", "El rizqû 'el-ellah", "El qeder la muxeyyer", "La rahetî fid-dunya"; ji bona ku miletê kurd, karker û gundî, mirovên li dinyayê ji sitem û bindestiyê bifilitin, di dinyake xweş û şîrîn de bi hev re bijîn; rabûn û qîrîn, navtêdana di komelake mîna komela kurdî ya paşvemayî de tiştekî hindik û hêsa nîne, rasterast şoreşa bîr û ramanî ye. Gava ku meriv bide bîra xwe di hoyên îroyîn yên 1986 an de tevî pêstûrî û site-ma kemalîzmê li ser dezgeh û damezranên dînî yên Tirkiyê gurr e, ji bo ray stendîne partiyên sosyal demokratên endam an nîvendamê Enternasyonala Sosyalîst diçin xwe davêjin şêxê

Bîngolê, Bidlîsê, di ber wan digerin. Hebûna van şêx, dede, pîr û ruhbanan, nîşana bi hêzbûna vê felsefa kevin e û hê ji hev nebişkifîna avahiya komelayetîya kevnare ye. Di vê rewşê û di hoyên 1920, 30, 40, 50yan de bê piştgiriya siyaset an îdeolojiya resmî ya dewletekê li hember vê felsefa kevin têkoşîn barekî giran, karekî zehmet e.

Ruhê ku jiyane dide şîrên siyasî û komelayetî yên Cegerxwîn ev felsefa wî ye. Ev felsefa wî ye ku bizota têkoşînê û ji kurdbûna xwe nefedîkirinê, berevajî ji kurdbûna xwe serê xwe bilind ragirtinê da nîşa me.

BÊŞANSIYA CEGERXWÎN

Rewşenbîrên hevalên Cegerxwîn yên wekî Bedirxaniyan, Cemîlpaşazadeyan li Îstembolê, li Ewropayê li gora hoyên wê rojê xwendina bilind û nûjen xwendibûn. Bi hindikî bi çend zimanên rojavayî zanibûn, ew û kultura rojava rûbarî hevûdu bûbûn. Bi hindikî di aliyê şîr û edebiyatê de naskiriyên Namik Kemal, Tevfik Fikret û Halit Ziya bûn ku ew jî neynika edebiyata fransîz ya li Dewleta Alî Osman bûn. Îstembol merkeza tevgera huner û edebiyatê bû. Cegerxwîn ji van îmkanên hevalên xwe bêpar bû. Teoriya wî ya edebiyatê teoriya belaxeta li hucrik û medreseyan, ya di navbera melayan de bû. Feqehên ji nav malan şîv (tayîn) berhevker, melayên mirîşo ku ne bi alîkariya hin “bisilmanên xwedanxêr” be, nikarin kitêbên xwe yên xwendinê bikirin, di ku de ewê kitêbên kultura giştî ya ji dervayê xwendina mecbûrî an yên li ser huner û edebiyata nûjen bikirin.

Cegerxwîn di wan hoyan de jî. Di jiyana xwe de timî çî bigire “qaçax” bû. Gava Nazim Hikmet ji Tirkîyê reviya; cihekî mîna Sovyetê lê sitarî dikir, lêbelê cihekî ku li Cegerxwîn sitarî

bikira tunebû. Ne Tirkîye, ne Sûrî, ne Iraq û heta şoreşa 1961-1975an jî lê sitariyê nekir.

Şa'ir, nivîskar, hunermend ku dîsa û dîsa nexwîne, nege-re, nebîne, lênekole dê çawa xwe pêşve bibe ? Ku ew xwe pêşve nebe dê çawa bikare tiştên nûtir û hêjatir biafirîne ? Ji Sûriyê heta Iraqê, ji Iraqê heta Lubnanê, ji Lubnanê heta Swêdê Cegerxwîn ji ber zor û sitemê reviya, ne ku geriya. Ev ger ne gera kulturî bû, lê reva zerûrî bû. Loma ji dîwana diduyan Sewra Azadî pê de êdî nûyîtiyek, xweberiyek di şî'rên wî de dîtî, dengekî nûtir bihîstî zor e.

GOTINA DAWÎ YA VÊ NIVÎSÊ

Şî'ra kurmanciya bakur ku bi şî'ra Cizîrî li asoyê edebiyata me geş bûbû, bi şî'ra Xanî kete xizmeta îdeolojiya milî. Di pey Xanî de hebûneke xurt nîşan neda, di nav man û nemanê de ma. Cegerxwîn bi giyanê nû jiyane dayê, şî'rê jî dîwana dîwanxanan derxist bire meydan û kolanan.

Cegerxwîn rûpela dîdaktîzmê li şî'ra kurmancî zêde kir. Dîdaktîzma Cegerxwîn di hindava guhartina rewşa siyasî û komelayetî de ye: Hişyarkir e, ronîkir e, têkoşer e. Heta şoreşa Kurdistanê biserkeve ewê şî'ra Cegerxwîn jî aktueliya xwe, ji jîndariya xwe tu tiştêkî wînda neke, wê her van erkên xwe bi cî bîne û bi vî awayî jî ewê Cegerxwîn bijî.

(*Hêvî*, hejmar 6, Tebax 1987-Paris)

EDEBIYAT Û REWŞA ME YA ÎROYÎN

"Edebiyat huner û ilmekî ye ku ji bona gihîştina kultureke bilind ji aliyê pejin, raman û xeyalê de merivan perwerde dike û bi meriv dide hînkirin. Ji bona bigihîje vê armancê navgînên vegotinê yên devkî û nivîskî bi kar tîne. Edebiyat lê dixebite ku ev navgîn di maneya estetîkî de bedew, pêbawer, pejinşiyarkir bin û merivan ber bi fikirandin û xeyalkirinê de bajon."⁽¹⁾

Bi gotineke kurt û tijî danasîna edebiyatê ev e.

Ji roja dest bi axaftinê kirinê mirov xwestine xwezî, daxwazî, raman û baweriyên xwe ragihînin kesên dîtir. Ji vê xwestinê bi rê ketine, ji xwe re riyên vegotinê afirandine. Ji van riyên vegotina axaftinî yek jê nezim ya dinê jî nesir e.

Nezim vegotina bi wezin û qafiye ye. Ji nezimê re herçend bi şaşî şî'r bête gotin jî her perçeyên bi wezin û qafiye ne şî'r in. Şî'r di nezimê de ji aliyê honandin, pejin, aheng û ramanî ve afirandina bilintir e. Kitêbeke sê sed çar sed rûpel dibe ku seranser bi wezin û qafiye hatibe nivisandin, lêbelê gengaz e ku tê de şî'rek jî tune be. Nazimekî (nivîskarê bi nezim dinivîsîne) dibe ku di jiyana xwe de bi çend sed, çend hezar rûpelan menzûme (perçeyên nezimê) nivisandibe, lêbelê tenê sê-çar şî'rê wî hebin.

Ji destpêkê heta sedsaleyên XVIII-XIXan li tevahiya cîhanê rêgeha nivisandina edebî ya sereke çî bigire menzûme bû; çîrok, kurteçîrok, tiyatro bi nezimê dihatin nivisandin.

Şî'r ku bi kurmanciya jêrê (sorani) hin jê re helbest, hin jî hunrawe an honrawe dibêjin, ji menzûmeyê bi kesafeta xwe ya pejin, aheng, raman vediqete; di nezimê de mêweya gihaştî û dereceya herî bilind de ye.

Di sedsala XIIIan de bi derketin û belavbûna makîna çapê rojname ket nav jiyana civata Ewropayê. Erka rojnameyê ya eslî belavkirina nûçeyên li ser bûyerên rojane û xelkê ji van bûyeran agahdar kirin bû. Di hindava vê erka eslî de zimanê vegotinê diva ku zimanê rojane biwa ku ew jî bi nesirê gengaz bû. Bi riya rojnamegeriyê nesira ku berê di rêza protokolê de di pey nezimê de cih digirt, bi enerjîyek gurr qevaz da ket rêza pêşîn a edebiyatê û jiyana civatê ya edebî.

Rojname bi fonksiyona xwe ya eslî navgîneke nûçe belavkirinê û agahdarî dayinê ye. Rasterast mēweyêke edebî nîne, lêbelê bi xizmet û xebata xwe mîna katalizatoreke kîmyayî rasterast tevî bûyera kîmyaya edebî nebe jî pêşveçûna edebî bi lez dixîne.

Ji destpêkê hetanî îro, rojname:

- Mirovan li xwendinê geş kirine, hînbûyîna xwendina heroj kirine perçekî ji jiyana xelkê.

- Ji nesirê re bergêh vekirine û îmkanên pêşvebirina wê hazir kirine.

- Bi weşandina tefrîqayên çîrok û romanên xwendevanên xwe li xwendina mēweyên edebî banîne.

- Di rûpelên kulturî de bi cih danîna meqale, bend, lêkolîn, rexne û nivîsarên dîtir ên edebî pêşveçûna teorî û nesira edebî destek kirine.

- Di warê kultura gelemper a her babetî de xwendevanan perwerde kirine.

- Ji merkezekê pêşvebirina yekîtiya zimanê nivîskî, dû re yê devkî bi lez xistine, di bikaranîna ziman de ahengek peyda kirine.

DU HÊMANÊN PÊŞVEÇÛNÊ

Di zayîn û pêşveçûna edebiyatê de du hêmanên gelek girîng hene ku bêt wan vejîn û pêşveçûna edebî qet ne gengaz e:

- Xwendevan,
- Nivîskar.

Di zimanekî de ku xwendevanên nivîsarên bi wî zimanî tune bin, di dereca pîsporî de herçend pêzanên wî zimanî hebin jî, bi wî zimanî afirandina afirandineke edebî ne gengaz e. Sanskrîtî, hîtîtî û zimanê Misira kevin ê berî îslamê di nav beşên filolojiyê de îro li gelek unîversîteyên dinyayê tîn xwendinê, gelek pîspor ku gihîştine dereca doçentî û profesoriyê li serê doktora xwe dane, li ser wan zimanan lêkolînên xwe dikin, mêweyên wan ên folklorîk û yê ku berê hatine nivisandinê berhev dikin, lêbelê bi wan zimanan ji nû ve tiştên edebî nivisandinê tucar naynin bîra xwe. Naynin bîra xwe lewra ku ew binivîsîn ji wan pêve dê kî bixwîne ? Di zimanekî de ku xwendevanên bi wî zimanî tune bin, nivîskarên bi wî zimanî jî dernakevin; wek numûne yek du kesên mustesna derkevin jî bi hejmarî û hêjayî pêşveketina nivîskariyê ne gengaz e. Lewra pêşveçûna edebiyatekê ji nivîskaran bêtir girêdayê bi hebûna xwendevanan e. Di dereca pêşîn de zêdebûna hejmara xwendevanan, di dereca diduyan de bilindiya hêjayiya xwendevanan sedemê pêşveajotina edebiyatê ye. Ku li welatekî jimara xwendevanan sed hezar bin, lê di aliyê hêjayiyê de gişt di sewiya kultura cengnameyên hezretî Elî an çîrokên Mîrze Mihemed de bin, nivîskar herçend bi teoriya edebî ya dinya nûjen tîr û tijî be jî, ewê çiqas bikare xwe bigihîne wan xwendevanan ? Li bervajiyê vê, ku li welatekî bi tenê sed xwendevan hebin û lêbelê gişt jî ji aliyê teorî

û têgihîştina edebiyata dinyayê ya herî nûjen de bi qasî pisporek xwedî gotin bin û ji bilî wan êdî xwendevan tune bin, dê kîjan nivîskar rabe ji bo sed nusxeyan kitêbeke edebî binivîsîne.

Nivîskar gava dest bi nivisandina nivîsara xwe dike, serê wî bi wê baweriyê tijî ye ku ewê mesaja xwe ragihîne piraniyê: Ew hezîr û bîr, ray û şewir, pejin û raman, çêj û bîhin, derd û şahiyên wî ji yên tenêtiya nefsa wî derkevin bibin yên gelek. Ev “gelek” an “piranî” jî xwendevan in. Ku ev bawerî bi nivîskar re tune be, pênuşa wî nikare xêzekê jî reş bike.

Mirovan li xwendina rojane geşkirin, xwendatiyê gêrandina wan a bi hêjayiyê ve yanî bi gotina kurt perwerde kirina xwendevanan, xizmet û xebata rojnamegeriyê ye ku gelek bi kêrî pêşveçûna edebiyata cîhana nûjen hatiye.

Di çerçewa mêjûya edebiyatê de heta îro tiştên ku li ser edebiyata kurmancî hatine nivisandin destpêkê bi Eliyê Herfîrî dest pê dikin. Ji vê edebiyatê mebest edebiyata kurmancî ye, ji kurmanciyê jî mebesta vê nivîsarê kurmanciya jorê ye ku kurmanciya jêrîn (sorani) li dervayê çerçewa vê nivîsarê ye.

Ji destpêkê heta serê sedsala me ya bistî edebiyata kurmancî li ser şopa edebiyata rojhilatanavîn dimeşiya. Ji bilî Melayê Beyazîdî di warê nesirê de tu ber nehatine dayîn. Giraniya heta seranseriyaya edebiyatê li ser şî'rê (nezim) bû ku ev jî mîna moda edebiyata wan dema dîwanî bû: Wezin bi erûz, teşeyên şî'rê; xezel, qesîde, mesnewî, mustezad, rubaî, musemmat, zimanê şî'rê bi gotina rastî nezimê; zimanekî li gora zewqa wê rojê bi terkîb û bêjeyên farisî-erebî gurr, vegotin; bi hunerên edebî wek teşbîh, îstî'are, mecaz, sembol, mubalexeyên xemilandî, felsefe; felsefeya tesewufî ya îslamî, mîtolojî ya ereb û farisan.

Ev dem dema edebiyata me ya klasîk e. Ev klasîzm ne bi maneya klasîzma edebiyata Ewropî de lêbelê di aliyê formel

bûyîna xwe ya di çarçewa rojhilata navîn de klasîk e. Ji aliyê kurmançî ve jî, di çarçewa ziman bikaranînê de gihîştîye standartekê. Tevahiya şa'îrên vê demê bi kurmançiya muşterek a nivîskî nivisandine ku ev devoka kurmançiya Botan-Hekar-Behdînan e.

BERGEHEKE NÛ

Di 1898an de bi derketina rojnama “*Kurdistan*” di edebiyata kurmançî de bergehêk nû vedibe:

- Edebiyata hişyariya niştîmanî dest pê dike.
- Nesîr bi awakî gurr dikeve jiyana nivîskariya kurdî

Di edebiyat û siyaseta kurdewarî de hişyarî bi îtîfaq ji Ahmedê Xanî tê destpêkirin. Bi gumana min ev, ‘li xwe hişyarî’ hê ji Cizîrî dest pê dike ku Mela dibêje:

*Ger lu-luê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn te bi şîrazî çî hacet ?*

Lêbelê ev eşkere ye ku ew gurrî û ferehiya pêşniyariya ku Xanî berpêş kiriye bi Cizîrî re tune bû. Lewra di dema Cizîrî de rewşa Kurdistanê ya siyasî ne wek a dema Xanî bû. Berî ku Xanî bê dinyayê û hê di xortaniya wî de rewşa Kurdistanê ya siyasî di gehînekeke nû de ye. Li Çiyayê Şengalê kurdên yezidî di berxwedana serfînetewandina li hember sultanê osmanî de ne. Evdal Xanê mîrê Bidlîsê li hember osmanî têdikoşe, dixwaze otorîteya mîrekiya xwe ji nav tixûbên mîrekiyê derxîne hawirdor û ferehtir bike. Lê yekîtiya beg û mîrekên kurdan bi hevûdu re ne baş e; hercar osmanî bi ser dikevin, lê xelkê kurd perîşan dibe.

Di destpêkirina edebiyata hişyariyê 1898an de jî hem rewşa siyasî ya osmanî hem jî ya Kurdistanê ne pak e. Ku dînamîkên siyasî yên kurdan bikarin bibin yek, ji vê yekîtiyê dengêkî bi hêz derxin çî bi otonomî çî bi serbixweyî dê bigihîjin azadiyê, mafên xwe yên mirovî, demokratîk, siyasî dê bi dest xin.

Bingehê derketina rojname û kovarên mîna “*Kurdistan*”, “*Kurd*”, “*Rojî Kurd*”, “*Hetawî Kurd*”, “*Jîn*” siyasî ne û di vê vegotîna de hatine rokirin. Aliyê wan î edebî di dereceya diduyan de tê.

SÊ KATEGORÎ AN EKOL

Edebiyata dema “Hişyariyê” ne ku ekoleke edebî û ne ku ji aliyê hin mêjûnasên edebiyatê ve bi vî navî hatiye binavkirin û lewra bi kar tînim. Ev tesnîf tesnîfa min e, ku şaş be şaşiya min e.

Meriv dikare vê demê di sê ekolan de tesnîf bike.

1. Ekola berî *Hawarê* an ekola pêşîn,
2. Ekola *Hawarê*
3. Ekola Sovyetê

Ekola pêşîn: Ji aliyê edebî ve bi maneya nûjen, nesirê kiriye jiyana nivîsara me ya kurmançî. Ji ber tevahiya jimareyên çî kovarên wê demê li ber destê me tune ne, li ser hêjayiya ziman û sewiya edebiyatê ya vê ekolê hûrbûyîn û gihîştina biryareke çê ne gengaz e.

Ekola *Hawarê*: Maka vê ekolê *Hawar* e, mêjî Celadet Bedir-Xan e. Zimanê nivîskî kirasê xwe yê ji alfabe ya kurdî-erebî avêtiye, kirasê xwe yê kurdî-latînî rapêçaye. Ji bona zaravayê kurmançî gramereke tekûz hatiye çêkirin. Rastnivîsîna zimanê nivîskî hatiye tesbît kirin. Di nav nivîskarên vê ekolê de zimane-

kî nivîskî yê rûniştî heye. Çîrok, bend, menzûme û şî'r gişt di riya geşkirina ruhiyeta yekîtiya milletê kurd û azadiya Kurdistanê de tên nivisandinê. Giraniya nivîsaran ji sedî heftê û pênc-heştê nesir, yên mayî menzûme ne.

Ekola Sovyetê: Di piştî şoreşa Oktoberê de bi pêşkêşî û rêberiya partiya komunîst mafê nivisandina bi zimanê xwe di nav kurdên Sovyetê de hatiye naskirin. Rojnama “Riya Teze” di warê rojnamegerî de derketiye û derdikeve. Nivîskarên roman û çîrok, pisporên folklorê û zimanzan gihîştine. Zimanê nivîskî kurmanciya navçeke gelek teng e û gelek ji gotinên tirkî, ermenî, rûsî, erebî pêk tê. Ji aliyê paqijkirin û di dewsa gotinên nekurmançî de li yên kurmançî gerîn an bikaranîn çî bigire qet nehatiye bîra nivîskarên vê ekolê. Ev ekol hê jî berdewam e.

Ji gotina “ekol”ê ku ez li vê derê bi kar tînim, hêviya min ew e ku xwendevan nekeve wê gumanê ku ew di maneya “ekol”ên edebî yên ewropî de ne, an di kurmançî de gelo ev bi hin tesbît û dîtînen edebî hatine cem hevûdu û komikek ava kirine. Di wê maneyê de ev ne “ekol” in, lêbelê kategorî ne ku di aliyê keriyê zeman, di bikaranîna alfabeke an rastnivîsînekê de belkî jî ji şertên tarîxî û civakî yên wê rojê hatine cem hev, komikek pêk anîne, bi hin sedeman jî ji hevûdu belav bûne. Divê di vê maneya kategorî an keriyê zeman û cîgehê tevgera weşanê de wek “ekol” bê fikirîn.

Ji van ekolan tu yek ji bo nivîskarên kurmançî ên Tirkiyê hetanî 1970 yî nebû pêmaye da ji hêz û şarezaiya nivisandina bi kurmançî ya wan bê îstifade kirin.

JI NÛVE RAPERIKÎN: Çendekî berî bi darbeya leşkerî ya 1960 î bi girtina “çil û nehan”, di pey de jî bi girtina “pêncî û pêncan” rojnameyên Tirkiyê li hember kurdan kampanyeke

neyînî ya nû vekirin. Li bajarên Kurdistanê kampanya “Vatandaş türkçe konu!” ji aliyê xortên kemalîstên kurd ve bi gurrayî hat ajotin. Li ser van bûyeran pejinên kurdayetî yên bi têkveçûnên tevgerên Şêx Seîd, Agirî û Dêrsimê hatibûn terpişandin ji nû ve vepejilîn. Li Iraqê darbeya Ebdulkerîm Qasim û xwe nêzîk kirina wî ya ber bi kurdan ve, li ser birayetiya “kurd û ereb” sirûdên ji radyoya Bexdayê, veger û serxwerabûna Barzanî vê vepejilîne geş kir, pêşve bir. Bi “Anayasa”ya 1961 î rewşenbîrên kurd xwestin ji mafên mirovî û naskirî îstifade bikin, bi hindikî bicêribînin. Dêlva ku hêzên xwe yên aborî û pênûsgiri bikin yek û pêkve rojnameke xurtir derxin, bi çavlêkirinî bi rojname û kovaran sê weşanek derxistin ku di nav vana de ya herî jî û li welat belav bû bi gumana min *Dicle-Fırat* bû.

VEPEJILÎN

Vepejilîn dewam kir. Di 1963 yan de “bîst û sê” welatparêzên kurd hatin girtin. Lê ji dervayê vana jî ev pêl dikeliya, hat nuqteyek wisa ku li Meclîsê bû sedemê polemîkan. Wezîrê karûbarên hundirîn Hıfzı Oğuz Bekata ji kursiyê axaftinê wezîrê karûbarên saxiyê Dr. Yusuf Azizoglu, bi gotineke dîtir a wan rojan “liderê Kurdistanê” vedixwend hizûra Meclîsê da beyan bike ka “tirk e ? An kurd e ?” Serekwezîr İsmet Paşa ji vê re bêdeng ma, neket navbera herdû wezîrên xwe. Kemal Badıllı nimîndeyê Ūrfayê û hevalbendê Yusuf Azizoglu rabû li ser hebûna kurdan a li Tirkîyê û di hatina tirkan a Anadolîyê de li ser tevkarî û piştgiriya kurdan a bi tirkan re li hember qeyserê Bîzansê, axaft. Di 1965an de gramera kurdî ya zaravayê kurmançî weşand ku ev gramer bi tirkî bû û di mahiyeta îsbata hebûna zimanê kurdî, bi xulase û bi heliz hatibû berpêş kirin.

Ji vê tarîxê pê de çî resmî çî nîvresmî bi kurmancî çend kitêb derketin. Lêbelê nivîskarên giştan jî hatin mehkeme kirin, hin jê ketin ber efiya gelemper. Mûsa Anter; “*Birîna Reş*” û “*Ferhenga Kurdî-Tirkî*”, M.Emîn Bozarşan; “*Alfabe*”, “*Meyro*”, “*Ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa*” weşandin.

Di navbera 1960-1970 de kovarek dinê bi navê “*Yeni Akış*” derket ku di rûpelên dawîn de hin tiştên bi kurmacî hebûn.

Di warê kurmancî de di pey dawîya 1974 an de û pê de kovar derketin ku *Özgürlük Yolu*, *Rızgari*, *Roja Welat*, *Devrimci Demokrat Gençlik* û *Dengê Kawa* bûn. Di dawîya 1979 an de jî bi navê Tîrêj kovareke seranser bi kurdî û kulturî derket. “*Xulasa Gramera Kurmancî*” ya Kamuran Bedirxan bi destkariya Dr. Şivan, “*Şivanê Kurd*” romana Erebb Şemo, “*Dastana Memê Alan*”, kitêba şîrên Eskerê Boyik derketin û bûn sedemê serbilindiya welatparêzên xwendevanên kurd ku di refikên kitêbên xwe de çend ên bi kurmancî jî bibînin.

ALİYÊN ERÎNÎ Û NEYÎNÎ YÊN ROJNAMEGERIYA 1960-1980

Di çerçewa kurmancî de derketina van kovar û kitêban helbet tiştinên hêja bûn: Kêvjika çavên xwendevanên kurd dimaliştin, lêbelê di serê wan de ji pirsan geremoleke bêbersîv dihiştin.

- Sê awayên alfabe ya kurdî-latînî derketin holê ku xwendevan nedikarin têderxin ka kîjan rast e ? Awayê Kemal Badillî, yê Mûsa Anter an yê M. E. Bozarşan ? Vê paşiyê jî yê *Hawarê* hat nasîn ku bûn çar awayê cihên cihê.

- Rastnivîsîna tu kesî li ya nivîskarê dîtir nedinihêrt. Ji “ez di kim” an “ez dikim” kîjan rastir bû ? “Hesp ditewlêdeye” çêtir e an “Hesp di tewlê de ye” ?

- Di hin tabîran an navan de rasterast wergerandina ji tirkî herwekî “1 Mayıs” bû “Yek Gulan”, ne “yekê Gulanê” an “serê Gulanê” ku şahiyana serê Gulanê bêî maneya xwe ya cejna karkerên cîhanê wek erf û edetek kevin hê jî li gund û bajarên Kurdistanê tê pîroz kirin, jinemêr xelk derdikevin çixariyê, ji sibê heta êvarê geşt û seyranê dikin.

- Bêî li eslê gotinê bê gerîn li hember derketina hemî gotinên ku hem di tirkî û hem jî di kurmancî de dihatin bikaranînê. Di tirkî de “gençlik” û “genç” hebûn ku diva kurd jî wan bi kar banîna, lêbelê di dewsa vana de pêwîst bû ku bêjeke kurdî bidîtina: Ew jî “ciwanî” û “ciwan” bû. Çi heye ku ji heft salî heta heftê saliyên me ji “gênc/genc”, “gêncî”, “gêncîti” têdigihîştin lêbelê “ciwan” û “ciwanî” wê maneya termînolojîk a siyasî nedida.

- Li gora avakirina hevoksaziya bi tirkî, nivisandina bi kurmancî.

- Anîna gotinên ji derva û gotinan îcad kirin. Di dewsa “şîr”ê de “helbest” ji soranî hat anîn ku îro em pê dihisin “helbest” bi soranî ne “şîr” e. An herwekî “Sîn” (Çîn), “Yaban” (Japon/Japan), “sewr” (şoreş), “kareba” (elektrîk)... bêjeyên şoreşger hatin îdxal kirin.

Weşanên wê demê çi rojname çi kovar û çi kitêb ji aliyê pêşveçûna edebiyatê ve çi anîn ? Bi gotina “edebiyat”ê re tiştinên ku tafilê tên bîra meriv helbet şîr, çîrok, kurteçîrok, roman û piyes in. Ji van mēweyan di nav weşanên wê demê de yek bi yek û cihê cihê dîtin gelek hêsa ye. Lêbelê romanek dibe ku “roman” be, lê ne romaneke edebî be. Herwekî vê, şîrek ji aliyê teşeyê xwe ve dibe ku şîr be, lê nayê wê maneyê ku edebî ye. Mēweyek

an afirandinek edebî hin xisûsiyetên taybetî dixwaze ku ev di paragrafa pêşîn a vê nivîsarê de, di çerçewa tarîfa edebiyatê de hatine berpêş kirin.

Herçend bi mebesta dîtinên xwe yê îdeolojîk-polîtîk derketibin jî di aliyê zêdekirina hejmarî ya welatparêzan de ev weşan xizmetên bikêrhatî kirin. Di warê nivisandina bi kurmancî de bizavê geş kirin, bergehê vekirin. Di aliyê perwerdekirina xwendevanên kurmancî de heryek di çerçewa sêmpatîzanên xwe de qîsman bi ser ketin jî.

Çi di warê weşana bi kurdî çî di warê fikrên siyasî de heke piçek bêtir azadî hebiwa, bêguman hem rojname û kovarên berî 1970 û hem jî yê piştî wê dê bêtir di riya vê xizmetê de gavên bikêrhatî bavêtina. Weşan wê ji kovargerîyê derketa derbasî rojnamegeriya rojane bibiwa ku wê gavê kortala kûr û fereh a di navbera edebiyata me û ya cîhanî ya nûjen di demeke kurt de zûtir bihata dagirtin.

Dewletên Kurdistanê parvekir vê serbestiyê nedan me an ji destê me stendin. Îro ew kesên ku wek “nivîskarên kurmanc” tî nê nasîn an xwe wisa didin naskirin, li Ewropayê di nav nêzîkî çar sed hezar kurdî de dijîn. Ev jî mecaleke dîtir e ku lê bixebitin da piç bi piç be jî edebiyata xwe pêşve bibin, piç bi piç kûrayî û ferehiya vê kortalê ji holê rakin. Ji bo vê jî ku di tabîra wê de gunehkariyek tune be, ji hin kes û derûdorên fedakarî divê.

Berî her tiştî divê ku nivîskar şêla xwe ya heta niha wer-girtî biguhêrin. Ne di maneya neyînî de, lê di maneya hevûdu teşwîq kirinê, bêtir û bi kalîtetir berhem dayînê de hemberiya hevûdu bikin. Ew wehîma “nivîskarê mezin”, “şa’irê ustad” divê bê avêtin. Divê bi hindikî sê nivîskarên kurmanc bikarin li cem hevûdu rûnên, di esna rûniştinê de bikarin li ser edebiyata kurmancî ya niha û li ser teoriya edebiyata cîhanî bi axifin, muna-

qeşe bikin. Nivîskarên me ji ber xebata xwe ya xîretkêşiyê bi me hêja ne, ji kevir nermtir çî nivisandibin û çî binivîsînîn bi me şîrîn in; lêbelê divê ku ew jî bi dilekî paqij xwe bi nivîskarên milletên dinê re bidin ber hev, perîşaniya xwe bibînin.

Ku yekî kurmanç ji kurmançekî dîtir re bêje “tu bi kurmançî nizanî”, heke serê wî neyê şikandin jî dê ji ser şikandinê xerabtir tişteke bê serê wî. Ne tenê nivîskar lêbelê ew kesê ku dibêje “ez damîşê xurbetê nabim” jî nezanî an kêmezaniya xwe ya kurmançî li xwe napejirîne.

BI ZIMANÊ XWE ZANÎN

Di termînolojîya her milletî de, têgihîştina ji gotina zimanê axaftinê û yê nivisandinê cihê cihê ye. Hetanî ji gotina “zimanê axaftinê” zimanê merkezî cihê û yê navçeyî an devok cihê ye. Wê baş bê bîra kurdên Tirkîyê ku ji parodiyên televîzyon û radyoyê heta karîkaturên rojnameyan herkes tinazên xwe bi tirkî nezanîna serekwezîr Süleyman Demirel dikirin. Ew Süleyman Demirelê ku ji zarûkiya xwe de li malê û di tevahiya jiyana xwe de bi tirkî peyivîbû, unîversîteyê bi wî zimanî xwendibû, di esil û fesilê xwe de ji miliyetek dinê rehek lê negeriyabû, çawa dibû ku bi tirkî nizanibû ? Dîsa serekwezîr Bülent Ecevit ku di dereca perestînê de miriyê bikaranîna tirkîya nû bû “olanak” (îmkan), “olanaklı” (mumkun) û “olası” (muhtemel) tevlîhev dikir. Wekî vana bêhejmar nivîskar, rewşenbîr, rojnamevan û siyasetgerên tirk, tirkîya zimanê resmî û xwendin û nivisandinê bi şaşî bi kar tanîn ku sekreterê giştî yê Türk Dil Kurumu Ömer Asım Aksoy di lêkolîneke xwe de (Dil yanlışları, Ankara-1980) berpêş dike.

Sedemê dayina vê numûnê ev e ku bi çî maneya zimanê axaftinê yê rojane, çî bi maneya zimanê nivisandinê yê edebî,

çerçewa zanîn an nezanîna zimanekî gelek fereh e. Tu şika min tê de tune ye ku bi qasî Süleyman Demirel bi tirkî zanibû tu yek ji me an nivîskarekî me ewçend bi kurmancî nizane. Lê gava ku hin kes digotin “Demirel bi tirkî nizane” ji dilreşiyê nedigotin, tê de rastiyekek hebû. Lê ev rastî an nerastî îzafî bû ku em hê hîni pîvana îzafî nebûne.

Di jiyana modern de pêvajoya ziman hînbûnê çî bigire li vê rêzê dimeşe:

1. Li malê ji dê û bavê
2. Li hawirdora xwe ya civakî (tax, gund, bajarê xwe)
3. Xwendegêh (5-15) sal, bi hem pratîkî û hem gramatîkî
4. Radyo-televîzyon-rojname
5. Kitêb û nivîsarên hêja

Di pêvajoya ziman hînbûyina me de paplûka pêşîn û ya didiyan heye, lê yê sisê, çar û pêncan heta ku em derketine der-vayê welat çî bigire nebiye para me. Ev ên ku nebûne para me helbet di pêvajoya hînbûnê de valahiyek mezin e ku lazim e em vê valahiyê bi awakî gurr di demeke kurt de dagirin. Ev çî ji bo xwendevan çî ji bona nivîskar pêwîst e. Lê ji bo nivîskar pêwîstîke wisa girîng e ku jêrevîn an tengsistiyek piçûk dibe sedemê xwekujiya wî ya manewî.

Pêşîn ji hînbûyîna kurmancî, dû re ji ya kurdiya tevahî em gişt berpirsiyar in. Lêbelê nivîskar, çî yên edebî çî yên meslekî bêtir, herî bêtir berpirsiyar in. Lewra perçeyên nivîsarên wan bi mijarên xwe , bi hevoksaziyên xwe yên li rêzîka gramerê, bi usûlên xwe yên rastnivîsînê, bi uslûbên xwe yên edebî, bi ramanên xwe yên afirandinî, bi xewnerojkên xwe yên ramanzayok dê bibin numûneyên rûpela edebiyata me ya demekê ku ev jî di

neynika zeman de rûreşî an rûgeşîya me nîşan de. Ji ber vê ye ku berpirsiyariya nivîskarên me ya bêtir hînbûyîna kurmancî û xwe tê de pêşvebirinê bêtir pêwîst e.

Hînbûn û pêşvebirina zimanekî bi van rêgehên gengaz e:

1. Hakimiyeta li ser gramerê,
2. Hakimiyet û hukimkirina li ser rastnivîstinê,
3. Berhevkirina bêjeyên xwerû bi kurdî yê li koşê û kuncikê devokên xelkê de mayî,
4. Niqandina bêjeyên xwerû kurdî ji metinên nivisandî yê kevin,
5. Raçandina bêjeyên nû (ku îro jî bo pêşveçûna zimanê me gelek bi talûke ye. Hetanî giştî bêjeyên kurdî neyên berhevkirin, heke ji berê xwe herkes bêjeyek raçîne; ev, ziman pêşve nabe lê anarşizma di zimên de gurrtir bike.)

SÊ PAPLÛKÊN NIVÎSARÊ

Bi ziman baş zanîn ji bona nivisandinê têr nake. Sê paplûkên nivîsarê hene ku nivîsara edebî bi hilkişîna ji van paplûkan digihîje qora edebî bûnê.

Nivîsara Rast: Ew nivîsar e ku li gora awayên rêzika gramerê hatiye nivisandin, hevokên wê li cihê xwe rûniştî ne. Nivîsar ji aliyê naverok û rastiya ilmî ve ne maqûl be jî, ji aliyê pîr û pergale gramerî ve rast e.

Nivîsara Baş: Berî her tiştî nivîsar ji aliyê teşeyê “nivîsara rast” ve rast e. Ji aliyê naverokê ve mukemmel e. Nivîskar berî ku dest bi nivîsandina nivîsara xwe bike li mijara xwe baş fikiriye,

planê nivîsara xwe bi awakî tekûz daniye. Di nivîsarê de dubareyên zêde tune ne. Bêje bi baldarî hatine bijartin ku tam daxwaziya nivîskar vedibêjin, dudilîkî nakin maneyê.

Nivîsara Bedew: Nivîsara edebî ye ku riya wê ji herdû paplûkên pêşîn derbas dibe û bi zîrekiya arizî ya nivîskar tê pê. Bi tabîreke kevin ev zîrekiya arizî “dayina Xwedê” ye ku bi hînkirinê nayê hînbûyîn.

Riya li ber me avakirin û pêşvebirina edebiyata me ye. Ji pêşiyên me ji me re koşkeke kevin maye ku ev edebiyata me ya kevin e. Lêbelê ev koşk li gora hoyên jiyana îroyîn ji me re teng tê û têrî me nake. Ji alîkî ve pêwist e ku em vê koşka xwe wek pêmayeke milî biparêzin, ji alîkî ve jî li gora hewcedariya xwe û hoyên jiyana îroyîn a dinya me ya pêşveketî avahiyana lê zêde kin.

Ji bo avahiyên nûjen, teknîk û teknoljiya me ya berdest bê guman têr nake. Di nîsbeta ya me de, teknîk û teknolojîya mirovên li dervayê me gelek gelek pêşve çûye ku em jî perçekî ji wan mirovan in. Yanî ew teknîk û teknolojî bi destê mirovên hin civakên ku ji dervayê civaka me ya kurd pêşve çûye û pêşve diçe, lê ew teknîk û teknolojî malê beşeriyetê ye û di xizmeta beşeriyetê de ye. Em jî perçekî ji bedena wê beşeriyetê ne; herçend ew bi destê me yê kurd pêşve neçûbe jî mafê me heye em jê îstifade bikin û heta heta em mecbûr in jî.

Ev teknîk û teknolojî teoriya edebiyatê ye û edebiyata cîhanî ye.

Ku meriv bi çavê nivîskariyê li xwe binihêre divê meriv bizane “folklor” çi ye û mîweyên folklorîk çawa tîn berhevkin? Meriv ew berhev ke û wek berhevkirî îmza bavêjê ne wek nivîskar? Divê meriv bizane “çîrok” çi ye û hê dest bi nivîsandina çîrokkê bike, divê meriv bizane roman çi ye çi teba ye... Ji bo vê jî bi her zimanî – ji bilî kurmancî – bi dehan kitêb hatine nivîsandin

û weşandin. Nivîskarê kurmanc an ew kesê ku bi çavê nivîskariyê li xwe dinihêre ku bixwaze xwe pêşve bibe divê wan bixwîne.

Di pêşveçûna edebiyatekê de barê giran li ser milê nivîskarên edebî yên wî miletî ne, lêbelê ev nayê wê maneyê ku tevahiya bar li ser milên wan e. Heta ku gengaz be divê pisporên ilmî yên wî miletî jî bi wî zimanî binivîsînin. Mêjûzanên me divê ku bi kurmancî binivîsînin da hem zimanê me ji aliyê terminolojîk hem ji aliyê bêjezanî de ferehtir û dewlementir bibe û hem jî nivîskarên me yên edebî wê fersendê bi dest xîr ku ji wê kaniya mêjûya me avê vexwin. Edebiyat ripîrût bi serê xwe tiştêkî nîn e. Ew herçend îskeletonê xwe ji ziman bistîne jî goşt û xwîna xwe ji şaxên zanîne yên dîtir weldigire.

Mêjû li vê derê tenê nimûneyek ji şaxên ilmê yên dîtir bû. Ev daxwazî ji bo ilmê siyasetê, ekonomiyê, felsefê, cografayê, welhasil ji bo her şaxên ilmê ku jê pisporên me digihîjin divê bê xwestin.

Nivîskar mîmar û xizmetkarê zimanê miletê xwe ye ku zinarê zimanê devkî bi hunermendiya xwe dirihoje, jê afirandîneke jîndar çêdike. Nivîskar bi rêgeha edebiyatê xwendevanên xwe ber bi fikirandinê dajo, çêja bedewiya pejin, xeyal û afirandinên ramanî dide çêstinê. Şair an nivîskarê pêşîn xişim e; bi kilûkemasî ye, lê dûvajoyên wî li ser aliyên wî yên çê avahiyên xwe ava dikin, ji xişimî û kilûkemasîyên wî dersa ducarî nekirinê distînin. Xwenda, xwendevan û organîzasyonên miletekî mîna me, pêwîst e ku bêtir li nivîskarên xwe xwedî derkevin.

Ji “rênesans” (renaissance)ê vê de edebiyat bi hîmayekirina hin otorîteyan gewz biye, pêşve çiyê. Di dinya me ya îroyîn de an dewlet an hin organîzasyon an jî xwendevan bi xwe li kultur û edebiyata xwe xwedî derdikevin, ji bo pêşveçûna wê ber-

geh hazir dikin. Herwekî ku dewletek me tune ye, ev bar û piştî ji aliyekî ve dikeve ser milê rêxistinên me yên çî kulturî û çî siyâsî. Alîkarî û fedakariya mezin ku ewê organîzasyonên me bikin; kirîn, frotin û belavkirina mêweyên çandî-edebeî be. Bêî ku endamî an peyrewiya rêxistin an komela xwe ji nivîskar bixwazin, divê alîkariya belavkirina kitêbên wî bikin. Bi hindikî qenciya wan a herî mezin ku ambargo daneynin ser nivîskaran, kitêb, kovar û rojnameyên kurdî û bi taybetî ser yên kulturî-edebeî.

Li Ewropayê îro di derûdora çar sed hezarî de kurd hene. Ji sedî yekê wan xwendevan bin, dike çar hezar xwendevanên kurdî li Ewropayê. Lê mixabin tu kitêbeke kulturî-edebeî yê bi kurmançî, li ser hemdê xwe, li ser daxwaziya xwendevanan di salê de pênc sed nusxe nayê kirîn û belavbûn. Helbet ew kitêbên ku ji aliyê rêxistinên siyâsî bi awakî mîltanî tên belavkirin, ji şerma riyan an ji xatirê dilan tên kirîne, ne di nav vî hesabê me de ye.

Ku nivîskarekî bi mehan û salan xwe bide xizmet û xebateke kulturî, kitêbek bine wicûdê, pênc sed an hezar nusxe çap bike; bi firotanê di salê de nikaribe nîvê wê belav bike û çavê her xwendevan an rêxistinê li belaş bidestxistina wek malê mîratê be, dê çawa besta wî nivîskarî vebe xwe pêşve bibe an afirandinên hêjatir biafirîne ?

Ji bona ku em bikarin ji vê gêdûkê bifilitin û ku em bixwazin jê bifilitin divê çî nivîskar, çî xwendevan, çî rêxistinên siyâsî an kulturî tevde ji nû ve rewşa xwe ya hazir di ber çav de derbas bikin, li şaşî û kilûkêmasiyên xwe mikur werin, ji bona pêşveçûnê hewil bidin, milê xwe bidin bin vî barî.

Problema sereke ku divê mîletê me bibişkêfe û bi ser keve helbet gihîştina siyâsî ye ku ev jî bi metodên siyâsî mumkun e. Lêbelê pêşveçûna kulturî-edebeî her tim biye û dibe enerjîya

geşkirina rûhiyeta yekîtiya siyasî di nav çînên civakî û pejinên milî de. Kultur û edebiyat pejinên bixwebaweriyê, fikirandinê, ferdiyeta di nav piraniyê de heliyanê, hevkarîyê dide gelekî, dide miletekî, dide beşeriyetê.

(Çarçira, hejmar 1, Stockholm-1986)

⁽¹⁾ *Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, Dr. L. Sami Akalın, Varlık Yayınları, İstanbul-1984

Serbilindiya Berxwedan û Biserketinê: Dr. ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ

Sosyolog Dr. Ismail Beşikçi di 25ê Gulanê de ji bendîxana Entabê ya Arizî, bi kişandin û tamamkirina cezayê xwe derket. Kovara pêşverû û demokrat a Tirkiyê “*Yeni Gündem*” rûpela xwe ya pêşîn bi wêne û nûçeya ji bendîxanê derketina vî alimê mêrxas xemiland, giraniya tema vê jimareya 64a da nûçe û reportajên li ser doza wî.

Ji wê jimareyê bi vê de ev bûn pênc hejmar ku derdikevin, tu hejmarek jê tune ye ku di rûpela “*okur forumu*” (meydana xwendevanan) de selav li Beşikçi neyên kirin û ji ber şêla xwe ya demokratîk e ku cara pêşîn kovareke tirk a li Tirkiyê bi vî awayî bi piştgirî cih daye Beşikçi ku ewê ev kovar bi xwe çawa neyê pîroz û teqdîr kirin.

Bi rastî jî şêla *Yeni Gündemê* bi awake demokratîk nêzîkayî bi pîrsa kurd û di nav entelektuelên tirk de bi temsîlkarê wê Dr. Beşikçi dayîn, bi her awayî layiqê teqdîr kirinê ye.

Bendîtiya Beşikçi ya paşîn ji ber nameyek bû. Hê di bendîxanê de ji sereka Yekîtiya Nivîskarên Swîsê, stî Boulanger re wê nameyê dinivîsîne. Ji ber ku ev name digel hin xerûperên wî yên dîtir ji aliyê karbidestên bendîxanê têne derdestkirin, êdî nikare bişîne. Ev nameya neşandî bi vî awayî dest pê dike:

“Îdeolojiya resmî; dîtina xwe ya, li Tirkiyê tunebûna neteweyekî ku bi navê kurd tê nasîn, zimaneke ku bi navê kurdî tê zanîn, bi îsrar û bi înad dimeşîne. Vê îdeolojiya ku bi kurtî em dikarin bi navê kemalîzmê binav bikin, xisûsiyeteke wê ya binge-

hîn bi awakî mutleq anti-kurd bûyîn e. Nijadperest e û kolonyalîst e. Û ev îdeolojiya resmî bi unîversîteya tirk, bi mehkemeyên tirk, bi partiyên siyasî yên tirk, bi navgînên agahdarî yên gelemperî; weşan, radyo û televîzyonan dane qebûl kirinê. Di vê pêvajoyê de navgînên bi her awayî yên îdeolojîk ên dewletê û navgînên zordayîna cebrî hatine bikaranîn.” (Yeni Gündem, jimar 64, rûpel 10)

Ji ber vê nameya arizî ya neşandî û li tu derê neweşandî, 10 sal cezayê bendîtiya giran danê ku bi kişandina vî cezayî di 25ê Gulanê de ji bendixanê derket.

Ji Hezîrana 1971 heta 25ê Gulana 1987, di şanzdeh salan de deh sal û deh mehên wî di riya baweriya wî ya ilmî; di riya têkoşîna hebûna neteweyê kurd li Tirkîyê, hebûna Kurdistanê li Tirkîyê, hebûna mafê neteweyê kurd yê serxwebûn û azadî, di bendixanan de derbas bûn.

Di tarîxa dewletên Kurdistanê parvekir de ev cara pêşîn e ku alimekî ji neteweyê serdest li dijî îdeolojiya resmî ya dewleta xwe ji bona hebûna neteweyê kurd, welatê wan î Kurdistanê bi raya gelemper bide qebûl kirin ew çend têbikoşe û di vê riyê de ewçend ceza bixwe.

Li dewletên Kurdistanê parvekir de li unîversîteyan alimên, di piyasa kulturî de nivîskar û şa'îrên navdar ên, di hikumetan de wezîrên, di meclîsên neteweyî de nimînendeyên, di partiyên siyasî de pêşkêşên bi eslê xwe kurd jî hebûne û hene; lêbelê tucar mîna Beşîkçi xwe berpirsiyar dîtina ji têkoşîna di riya namûskariya rastiya hebûna neteweyê kurd, ji xwe re nekirine bar û piştî, û serêşana bereday (!). Li bilûra îdeolojiya resmî xistin û pê neteweyê kurd mîna pez xewirandin, ji bona wan her tim hêsatir biye.

Di riya îsbata hebûna neteweyê kurd, welatê wan î Kurdistanê û tarîxa wan a serxwerabûnan de Bêşikçî bi tenê li dijî îdeolojiya resmî tênekoşîye; li hember rewşenbîr û pêşkêşên siyasî yên kurdan jî têkoşîneke bêçavniqandin meşandiye. Ji van rewşenbîr û pêşkêşên siyasî yên kurdan hin jê heta van sê-çar salên dawî, hin jê jî hê jî neteweyê kurd ne wek netewe lê wekî grûbeke etnik an wek gelek (xelk) ku tabîê Cumhûriyeta Tirkiyê û di nav tixûbên “*mîsakî Milî*” (sonda milî ya Mustafa Kemal) dîtine an dibînin. Serxwerabûnên neteweyî û demokratîk ên bi navê ya Şêx Seîd, Agirî û Dêrsimê li hember Cumhûriyeta kemalist a înkîlabperwer dijrabûneke feodal û kevneperest dêrîne an didêrin.

Di xisûsa van rewşenbîr û siyasatgerên legal de Dr. Bêşikçî vê teşxîsa hanê danî:

“Neteweyê kurd organîzmake zindî ye, ku bedena wî, welatê wî Kurdistan e. Rewşenbîrên netewekî mêjiyên wî ne. Kurdistan ji dervayê îradeya neteweyê kurd ve hatiye perçekirin, biye çar perçe. Yanî herdû ling û herdû milên wê birîne. Gava bedena organîzmayek perçekirî be, ewê êş û jana wê perçebûnê bide mêjî, mêjî jî dê nikaribe fonksiyonên xwe bi tendurustî bi cî bîne. Rewşa ku rewşenbîrên kurd îro tê de ne, ev e.”

Dr. Bêşikçî di 1971 î, di bendixana leşkerî ya Diyarbekirê de xwest ku rewşenbîrên kurd xwedî li serxwerabûna Şêx Seîd a neteweyî-demokratîk derkevin. Berevaniya xwe ya siyasî li ser hebûn û daxwaziya mafên demokratîk û mirovî yên neteweyê kurd ava bikin, ne ku bi delîl-anînên ji Nutqa Mustafa Kemal, ji axaftin û xebatên wî yên derxistûsa neteweyê kurd de li fetwayan bigerin. Di vê xisûsê de Bêşikçî gelek têkoşî, lê bi ser neket. Bi vê têkoşînê û bi rexneyên xwe yên li hember berevanînameya TIPê (Partiya Karkerên Tirkiyê) ya ku şandibûn “Anayasa Mahkemesi”

Beşikçi dilê gelek kesan ji xwe hişt, lê di dilê gelek welatparêzan de jî mezin bû.

Bêî qebûlkirina hebûna neteweyê kurd û naskirin û teslîmkirina mafên wî yên neteweyî-demokratîk-mirovî, bi cih bûyîna demokrasiyeke tekûz li Tirkiyê ne gengaz e. Di vê riyê de têkoşîna demokratîk a entelektuelî, bêî rexnekirin û deşîfrasyona kemalîzmê û kirên dîktatoriya dema yekpartî ku bi qanûnên gelek hişk hatine parastin, dîsa ne gengaz e. Rexnekirin û deşîfrasyona kemalîzmê bi tenê ne benda li ber bişkaftina pîrsgirêka neteweyê kurd e, lê her wisa benda li ber pêşveçûna fikrên demokratîk û pêşveçûnên tevgerên civakî ne jî. Dr. Beşikçi vê nuqteya girîng berî 16-17 salan fesilandiye û di deşîfrasyona wî de têkoşîneke bêrawestan daye. Şerefa bi awakî aşkere destpêka vî karî jî bêguman a Beşikçi ye.

Dr. Beşikçi di riya baweriya xwe de bê çiv û fetl, bi serbilindî di ber xwe da. Îro jî di hêşiya biserketinê de ye. Li Tirkiyê êdî pîrsa kurd a tabû di nav derûdorên demokrat de jî tabû bûyî-nê derketiye, kovarên demokrat bi bizav li serê dinivîsînin. Yek mîna Ecevît ku tobekekarê îfadekirina gotina “kurd” bû, êdî dibizive vê gotinê telafûz bike, ku me di xewna xwe de jî bidîta me yê bawer nekira.

Ji ber kirên xwe Dr. Beşikçi ji aliyê siyasetger û alimên du welatên cihê yên Ewropayê navdayiyê ji bona perûya aşîtiyê ya Nobel hatiye pêşkêş kirin. Ev li Tirkiyê wek şoqekê tesîr kir. Ewê vê perûyê bidinê an nedinê, li ba dilê min ew çend ne girîng e. Ji aliyê îmkanên madî, ji aliyê tesîra psîkolojîk û bilindkirina moralê mirovên demokrat helbet girîng e. Lê ew perûya ku dan Menahem Begîn dikarin îsal bidin Xumeynî û Sedam jî.

Perûya herî mezin ji bona Beşikçi Kurdistaneke yekbûyî, serbixwe, demokrat û azad e. Ji bo hina ev îro xewneke şa'irane

ye: Belê çûna Hîvê, ya Merîxê berî çend dehsaleyên xewneke şa'irane ya çîroknivîsên zarûkan bû; lê îro mirov çûnê û hatin, diçinê û tên.

(*Berbang*, hejmar 43, Stockholm-1987)

DÊRSIM Û DERSÊN JI DÊRSIMÊ

Îsal salvegera pêncîhemîn a têkveçûna tevgera berxwedaniya me ya neteweyî ya Dêrsimê ye. Bi mebesta parastina mafên xwe yên xwezayî yên neteweyî; li hember siyaseta hikûmata tirk ya talana Kurdistanê, bi kotekê asîmîlekirina gelê kurd û nenasîya mafên wî yên demokratîk, gelê me rabû ser xwe, dest avête çek, li hember kolonyalîstan têkoşî.

Gelê me di vê têkoşînê de bi ser neket, lêbelê pêmayeke hêja û serbilind ji nifşên me yên têkoşer ên îro û yên dahatû re bi diyarî hişt. Serwerê tevgerê Generalê Dêrsimê Seyid Rîza rewşa gelê kurd û kirên hikûmeta tirk di nameya xwe ya 30 Temûz 1937an de bi vî awayî beyan dike: “Serê çend salan e ku hikûmeta tirk lê dixebite da gelê kurd asîmîle bike. Bi qedexekirina rojname û weşanên bi zimanê kesên ku bi zimanê xwe yên bavûkalan dipeyivin, bi mecbûrkirina koçkirin û nefiyê, rakirina mirovan ji axa wan a bi bihnûbereket a Kurdistanê ber bi aliyê Anadolîya bêweç ve li vî xelkî zulm dike, ku ji çûyîyan gelekê wan telef bûne.

...”

“Li hember vê bûyerê gelê kurd heta ku herin di rê û dirbên koça mecbûrî de can bidin, ji bona xwe biparêzin herwekî di 1930 li navsera Agirî, li Geliyê Zîlan, li deşta Bazîdê kirin, her wisa dest avêtin çekên xwe.”⁽¹⁾

Di vê nameya ku ji wezareta karûbarê derva ya Brîtanyaya Mezin re hatiye nivîsandin û şandin, sedemên tevgerê û rengê

wê diyarkirî ye. Tevger, berxwedana gelê kurd e û li hember kotek û zulma rejima kolonyalîst e.

Generalê Dêrsimê Seyid Rîza yek ji sedemên têkveçûna tevgerê hê berî têkveçûnê di vê nameya xwe de nîşan dide: "Tevî newekheviya îmkânên şer û bombayên şewatê yên balafirên bombavêj û bombayên gazê yên fetisandinê, ez û welatîyên xwe, me ordiya tirk têkve bir."

Li hember berxwedanê, balafirên tirkan bajarên bombebaran dikin, dişewitînin. "*Zîndan bi xortên gelê kurd ên sernerm tijî û bi dev re bûne, xwendekar têne gulebaran kirin, têne daleqandin an ber bi navçeyên tecrîdkirî yên Tirkîyê ve têne surgûnkirin.*"⁽¹⁾

Sedemek ji yên têkveçûna vê tevgerê herwekî yên beriya wê di şer de ji aliyê îmkânên leşkerî ve newekheviya tevgerê û hêzên dijmin e. Wekî piraniya tevgerên berî wê, navçeya tevgerê ji dinya derva ve tecrîdkirî ye. Berî her tiştî di aliyê îkmal û lojîstîk de kurd di çembera dijminê xwe de mane. Hin neyar an jênexweşên dijminên kurd çendekî rê dabîn çûnûhatin û îkmalê jî, paşiyê bi hin tawîz stendinan ew û dijminên me bûne dostên hev û bi hev re em kirine hesarê, bi hev re tînik li me şidandine. Bûyerên Fransa û Tirkîyê ya di tevgera Şêx Seîd de, ya Îran û Tirkîyê di tevgera Agirî de, ya Îran û Iraqê di tevgera Barzanî de ji van numûneyan çendên zindî ne.

Newekheviyên îmkânên şer bi tenê mesela îkmal û lojîstîk jî nîne. Di şerê Dêrsimê de, herwekî şerên berxwedan û azadî yên kurdî di vê sedsala bîstî de jî dijmin bi topên giran, balafirên bombavêj û keşifê, bombayên gaz û şewatê êrişê ser hêzên pêşmerge û xelkê sivil kirine; debir û zevî şewitandine, avên vexwarinê jehrî kirine. Ji ber timî şer di Kurdistanê de bûye, her xesara madî û manewî ya mezin gihîştîye Kurdistanê. Li hember

van îmkanên fereh û mezin ên dijmin, gelê kurd bi tifingên piyade û nêçîrê yên îbtîdayî li ber xwe dane. Sedemek têkveçûnê yê dîtir jî, ji ber rewşa têkiliyên mulkiyeta êl û eşîriyê neyekîtiya eşîran a li dora serekatiya tevgeran e. Her êl û eşîr çî bigire xwe merkeza cîhanê û jiyane dibîne. Menfeet, dostanî, dijminahî, dilmaniya li ser çêra pez a bi qasî gerra palasekê dikare bibe sedemê ji hevûdu mêr kuştinê, berberiya bi dirêjahiya sedsalan, di çarçewa tevgerên neteweyî de jî xiyaneta welatî. Ji ber ku jiyana meriv an a endamê eşîrê di nav eşîrê de dest pê dike û di nav eşîrê de diqede, ji bona wî kesî hebûn û kêrhayên eşîrê, dîtinên serekê eşîrê eşîrparêziya herî mezin e ku di ser hemî mefhûmên wekî dînperwerî û welatparêzî de ne. Ji xwe ji bona wî kesî mefhûma “welat” zozan, germiyan an war û gundê wî ye.

Bi dîtina min ev sedem ê herî girîng û mezin ê neyekbûnê ye ku biserneketina tevgerên me yên neteweyî ji ber vî ne.

Gava Evdal Xan mîrê Bidlîsê xwest bi serbilindî li mafên xwe xwedî derkeve, xûgî û bac nede sultanê osmanî, Melek Ahmed paşa tevî leşkerên xwe ve çû ser Bidlîsê. Di vî şerê 1655an de yên ku di milê paşayê osmanî de li hember vê mîrîtiya kurd a serbilind şer kirin ne bi tenê leşkerên tirk ên osmanî û ne jî xan û begên ji gelên dîtir ên peyrew bûn; lê mixabin ew; kurdên eşîr yên xwerû kurd bûn: Begê eşîra Mehmûdî bi heşt hezar, begê Melazgirê bi şeş hezar, Şeref begê Mehmûdî bi şeş hezar leşkerên xwe ve û wekî dinê begê Bazîdê, begên Erdîş, Elcewaz, Mûş, Pasîn, Avnîk, Xinisê û paşayê Hekarê bi hêzên eşîrên xwe ve li hember vê mîrîtiya kurd a merkeza ilm û irfanê, ji bona berberiya xwe ya eşîrî û piştgiriya osmanî şer kirin.⁽²⁾

Yek ji pêşkêşên tevgerên Koçgirî û Dêrsimê Beytar Dr. M. Nûrî Dêrsimî di bîranînên xwe de dibêje ku: “*Li Dêrsimê*

şêst eşîr hebûn ku di navbera van eşîrên piçûk de tucar danûstandin, biratî û dostaniyeke ji dil tune bû."⁽³⁾ Di vê fesla bîranînên xwe de bi awakî hêvîşikestî behsa kefteleta xwe, Seyid Rîza û Elîşan Beg ya di xisûsa lihevanîna eşîran dike ku mixabin dawiyadawî bi ser neketine.

Ji serê 1800î ku em dest pê bikin, dibînin ku tevgerên kurdan li pey hev in: 1806 tevgera Evdîrehman Paşayê Babanî, 1834 a Mîr Mihemed Begê Soran, 1840 ya Bedîrxan Beg, 1855 ya Yezdan Şêr, 1880 ya Şêx Ubeydullah, 1914 ya Seyid Elî û Şêx Şabedîn, 1921 ya Koçgirî, 1925 ya Şêx Seîd, 1930 ya Agirî û 1937 ya Dêrsimê.

Çi bigire di navbera tevgerên kurdan de zemanek ew çend dûrûdirêj tune ye. Di navbera tevgera Mîr Mihemed û ya Bedîrxan Beg de zemanek gelek kurt heye. Dengê xwe nebirine hev da ku pêkve têbikoşin. Yezdan Şêrê ku di serî de bi apê xwe yê Bedîrxan Beg re ye jê vediqete, yanzdeh sal di pey têkveçûnê de dest bi rabûna xwe dike. Tevkarîke pak û aktîf a di navbera tevgerên ku ji aliyê navçeyî ve nêzîkî hev in wekî Koçgirî û Dêrsimê de jî dîtî mixabin zehmet e. Di aliyê nêzîkayiya zeman de ji hevûdu belavbûyînek xirab heye: Ji tevgera Şêx Seîd û pê de serxwerabûnên mîna ya Mala Eliyê Ûnis, ya Erohê, ya Seyidxan û heta ya Agirî navçeyî mane, nebûne şerê gerîlayî û ne jî yê yekfermandariyeke nîzami. Sedemê vê ji perçewerçetiya me ya eşîrî ye.

Li herêmek ku sê eşîrên cîran hebin muheqeq dido ji wan an jî hevûdu ne xweş in, an jî dijminên hev ên xwîni ne. Gava eşîra dijminê eşîrekê bi tevgera kurd a neteweyî re be, eşîra dijber muheqeq bi dijminê tevgerê re ye. Êdî ev dijmin kî dibe bila bibe, bi tevayî çiqas dijminê gelê kurd dibe ji bo wê eşîrê ne xem e.

Dijminên me yanî dewletên ku Kurdistanê par vekirine di vê xisûsê de ji me bêtir zana ne û xwedî tecrube ne. Selteneta Osmanî û dîwajoyê wê dewleta Tirkîyê di wextê xwe de û niha ji bona li Kurdistanê parastina têkiliyên eşîriyê di tenga xwe de bi zîrekî xebitîne, berberî û dijberiyên di navbera eşîran de geş kirine û timî zindî hiştine. Kovara tirkî ya bi navê “2000’e Doğru” di hejmara xwe ya 51/1987 de raporeke “gelek veşartî” ya dewletê azlû û belav kir. Di vê raporê de gişt eşîrên Kurdistanê li çar para hatine parvekirin: **1.** Eşîrên pênebawer, **2.** Eşîrên piştgirên kurdaiyê, **3.** Eşîrên xwe wek piştgirê welat (Tirkîyê) nîşan didin, **4.** Eşîrên sadiq ên welat (Tirkîyê).” Di raporê de navê her eşîrê digel navê serekê wê, zimanê axaftinê, nifûsa wê, berberî û dostaniya wê bi eşîrên derûdorê re, erf û edet, qencî û xerabiyên wan cihê cihê tesbîtîrî ne.

Tevî gelek şaşî û çewtiyên wê, divê ev rapor bibe zixtik; welatparêz û têkoşerên kurd ji xewa xefletê rake, me giştan kûr bide fikirandinê.

Rakirina têkiliyên eşîrî û eşîretan helbet bi rakirina sîstema mulkiyeta wê qabil e. Ev jî ya bi şoreşê ya jî bi guherandineke ekonomîk a esasî mumkun e. Lêbelê ya herî dijwartir rakirina zihniyeta eşîrî ye. Gelo emê bikaribin di dil û mêjiyê xwe de, di xebatên xwe yên kulturî û siyasî, di karûbarên komele, partî, cebhe, û h.w.d de şel, têkilî û zihniyeta eşîriyê rakin ? Gava em vê bikaribin, ez bawer dikim ku emê pêgaveke mezin ber bi pûçkirina sedemê têkveçûna tevgera Dêrsimê – ku ev sedem maka hemî têkveçûnên tevgerên me yên neteweyî ye- bavêjin û wê ji ser devê rîya xwe bimalin.

Bi raperikîna li hember zulmê şehîd û tengezarên tevgera Dêrsimê rûpelek zêrîn a serbilindiyê li tarîxa me zêde kirin. Ji bona em layiqê wê tarîxê bin, divê ku em ji kilûkêmasiyên wê

tevgerê ders hilînin da ku di dahatû de em an nişên wê bên,
rastî wê encama têkveçûnê nebin.

(Berbang, hejmar 53, Stockholm 1988)

BALKIŞANDIN: Tabîra “*Generalê Dêrsimê*” an “*Generalê Kurdistanê*” naznavê (leqebê) Seyid Rîza yê di nameya wî ya li jorê jêbehskirî de ye. Di nameya xwe de naznavê xwe wek “*generalissimo*” datîne ku tê bi maneya serfermandar an fermandarê giştî. Min jî di dewsa “*generalissimo*” an “*serfermandar*” de biwêja “*general*” bi kar aniyê, hêvîdar im ku şaş neyê famkirin. Binêre li (1).

⁽¹⁾ *Nameya Seyid Rîza, Nokta* Dergisi, yıl 5, sayı 5, İstanbul 1977.

⁽²⁾ Evliya Çelebi, *Gördüklerim*, C.II, İnkılap ve Aka Kitapevleri, İstanbul 1977.

⁽³⁾ Vet. Dr. M. Nuri Dersimi, *Hatıratım, Roja Nû*, Stockholm 1986.

REWŞA EDEBIYATA KURDÎ LI EWROPAYÊ

Hevalên dilsoz, nimînendeyên hêja yên komele û damezranên kurdî û mêvanên birêz! Bi rêzgirtineke kûr selavên xwe pêşkêş dikim.

Karbidestên Federasyona Komelên Kurd li Swêdê ji min xwestin da ez di babeta “edebiyata kurdî li Ewropayê hazirî bikim û vê hazirîya xwe di hizûra civata we de berpêşî civînê bikim.

“Edebiyata kurdî” ji vê mebest çî ye gelo ?

Ji vê mebest:

a. Rewşa edebiyata kurdî ya bi koça nivîskarên kurd û hatina Ewropayê û li vê derê meşandina karê edebiyata kurdî ji bona gelê kurd ê li Kurdistanê ye ? An

b. Edebiyata kurdî ya di nav civaka kurd a li Ewropayê de ye ?

Ev herdû pirs ji hevûdu ji bingehê nebe jî di mebestê de bi temamî ji hev cihê ne. Di pirsê pêşî de meşandina rewşa edebiyata kurdî ya bûrî û nihoyî heye. Di pirsê diduyan de avakirin an li darxistina edebiyateke nû û cuda heye.

Ji gotina “edebiyata kurdî” ez wê edebiyata kurdî fam dikim ku edebiyatên hemû zaravayên kurdî dikevî nav; edebiyata kurmanciya jorê (kurmançî), edebiyata kurmanciya jêrê (sorani), edebiyata hewramanî, edebiyata dimilî (zazakî) û h.w.d.

Ez bi xwe ji bilî kurmançî (ya jorê) bi zaravakî kurdî yê dîtir nizanim. Ezê li ser edebiyata kurmançî rawestim û birêz

Dr. Cemşîd Heyderî jî li ser ya kurmanciya xwarê ango ya sora-nî-mukriyanî raweste.

Belê herwekî min sedemên wê ji we re vegot ezê li ser babeta “edebiyata kurmancî li Ewropayê” biaxifim. Berî ku bikevim babeta edebiyatê, divê ku em tarîfa edebiyatê bînin bîra xwe. Gelek kesên ji vê civata birêz, tarîfa edebiyatê ji ber zanin. Lê ji bona zanîna guhdarên hêja yên ku ji bîr vekirine teze bikin, bi destûra we ez vê tarîfê carek din jî bikim.

Edebiyat: Ilm û sen’etê hînkirin (talîm) û perwerdekirina (terbiye) mirovan e, ku wan ji aliyê his (pejin), fikir (raman) û xeyalkirinê ve digihîne kultureke bilind. Ji bona gihîştina armanca xwe navgînên vegotinê yên devkî û nivîskî bi kar tîne û lê dixebite ku ev navgîn yanî vegotin ji aliyê estetîk ve bedew be, îqnaker be yanî mentiqî be, mirovan bide fikirandin, his û besta mirovan hilke (geş ke), mirovan bide xeyalkirinê û li ser mirovan tesîrek bihêle.

Herwekî tê dîtîne tarîfa edebiyatê ji du hêmanan pêk tê. Hêmana pêşî armanca edebiyatê ye, hêmana diduyan navgînên edebiyat”ê ye.

Armanca edebiyatê ev e: Ilm û sen’etê hînkirin û perwerdekirina mirovan e, ku wan ji aliyê his, raman û xeyalkirinê ve digihîne kultureke bilind.

Navgînên edebiyatê jî vegotina devkî û vegotina nivîskî ne.

Berhemên vegotina devkî dikevin nav warê folklorê ku ji dervayê babeta me ye.

Berhemên vegotina nivîskî; nivîsar in, nivîsarên edebî ne ku babeta me ya li serê rawestinê ev e.

REWŞA EDEBIYATA KURMANCÎ LI EWROPAYÊ BI ÇI AWAYÎ YE ?

Berî ku meriv bikare bersîva vê pirsê bide, divê ku meriv bîstekê li ser rewşa welat raweste û bi bîr bîne, da bikare di wê nîsbetê de muqayese bike. Ji gotina “welat” li vê derê mebest Kurdistana bakur ango ya keriyê li Tirkîyê ye.

Herwekî ji aliyê we ve tê zanîn ji 1925an heta salên 1960an bi kurmancî nivisandin ne gengaz bû. Zordestiya dewletê li ser kurdî gelek xurt bû. Kovar û weşanên bi kurmancî li derveyê tixûbên Tirkîyê derdiketin. Yên wekî *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû*, dîwanên Cegerxwîn keysa belavbûna di nav gelê kurd ê li Tirkîyê de nediditin.

Hetanî 1959an kurmancî zimanê axaftina rojane yê gundî û nîvgundiyên li bajaran dihate dîtinê û di warê edebiyata klasîk de jî yê dîwanên şêx, axa û melayên welatparêz bû ku ew kes ji ber sedemên çî siyasî çî dîmî li hember hukûmetê bûn, û ji hukûmetê derbe xwaribûn.

Piştî 1960-61an ne gelek dûr û dirêj û bi umr be jî, ji aliyê rewşenbîrên welatparêzên kurd ve rojname û kovarên wekî *Dicle-Fırat*, *Deng*, *Roja Newe* derketin ku di nav rûpelên wan de hin perçeyên bi kurdî hebûn. Mûsa Anter *Brîna Reş* û *Ferhengê Kurdî-Tirkî*, Kemal Badilî *Kurtebira Gramera Kurdî ya zaravayê kurmancî bi vegotina bi tirkî*, weşandin.

Di dema Cumhûriyeta Tirkîyê de nivîsara kurmancî li Kurdistana bakur bi vî awayî dest pê kir.

Ji destpêka 1975an û heta derbeya leşkerî ya 12ê Îlona 1980 nîvkurdî û nîvtirkî kovar û rojnameyên wekî *Özgürlük*

Yolu, Rızgari, Roja Welat, Devrimci Demokrat Gençlik, Dengê Kawa derketin û li gora gengaziyên xwe hin rûpelên xwe ji kurdî (dimilî û kurmançî) re vediqetandin. Di dawiya 1979an de bi navê *Tirêj* kovareke çandeyî û pîşeyî ya seranser bi kurdî; bi zaravayên dimilî û kurmançî derket ku sê hejmarên wê li welat, ya çaran ji ber hatina cûntayê li dervayê welêt, li Swêdê hate weşandin.

Ji çêlîkirina tarîxçeya nivîsara kurdî ya dema cumhûriyetê li Tirkîyê mebesta min nîşandayîna du nuqteyan e.

1. Nivîsara kurmançî ya li Kurdistana keriyê li Tirkîyê dema zarotîya xwe hê tamam nekiriye.

2. Nivîskar ji aliyê ehilbûyîna nivîskariya ziman û kultura gelemper ve amator in. Ji aliyê dilsoziyê ve mîlîtan in. Armanca wan ev e ku nîşanî gel û dijminê xwe bidin “va yê zimanê kurdî heye û pê tê nivîsandin û zimanê kurdî ne devoka tirkîya Rihayê ye.”

NIVÎSARA KURMANCÎ LI EWROPAYÊ

Meriv dikare jiyana nivîsara kurmançî ya li Ewropayê li du dewran par veke: Nivîsara kurmançî ya heta 1980 û ya piştî 1980yî.

Çi ji aliyê zeman û çi ji aliyê madî ve mixabin fersenda min tune bû ku kronolojiya nivîsara kurmançî ya berî 1980yî derxim. Lê ez dikarim bi kurtî viya bêjim ku xusûsiyeta nivîsara kurmançî ya wê demê ev bû:

1. Nivîsar di çarçewa meselên îdeolojî û siyasetê de bûn.

2. Nivîsarên ku bikevin nav kategoriya berhemên edebî, çi bigire tune bûn.

3. Bergeha nivîskaran ji aliyê ziman ve ji kesên li welat ferehtir bû.

4. Nivîskarên wê demê gava di muqabilî bêjeke erebî-fari-sî-tirkî de hewcedarî bi bêjeke kurdî didîtin, bêî lêgerîneke dîrûdirêj hema ji cem xwe bêje an biwêjek îcad dikirin.

Piştî derbeya leşkerî ya 12ê Îlona 1980 bi hezaran kurdên siyasî ji Tirkîyê revîn û xwe avêtin Ewropayê. Ev bûyer pir an hindik di rewşa kurdên Ewropayê yên kevin de guherînek çêkir.

Di vê demê de kovar û rojnameyên seranser bi kurdî û weşanên sîf çandeyî dest bi jiyana weşanê kirin. Bi van bûyeran bergeha nivîsara kurmançî fereh bû; wergerandin, lêkolînên edebî, lêkolînên zimanzanî, çîrokên hunerî ji bo nivisandin û nivîskariyê bûn warên cihê cihê. Yê ku gava 10-15 sal berê çav bi kurtenameyek bi kurmançî biketa ji kêfa dê lal biya, êdî îro çîrokên dirêj ên 150-200 rûpelî naecibînin û rexnan lê digirin.

Helbet ev nankorî an dexesî nîne. Ev rasterast di nivîsara kurmançî de nîşana pêşveçûnê ye. Ev pêşveçûn herçend ne bi kîlometreyan an bi metreyan lê tenê bi dirêjahiya bejna santîman be jî, divê em vê pêşveçûn û pêşvegihiştinê bibînin, lêbelê pê razî nebin. Ji bona pêşveçûna bi kîlometreyan zorê bidin xwe.

EDEBIYAT Û SEWIYA NIVÎSARÊ

Hevalino! Ku bala we lê be ez çêlî pêşveçûna nivîsara kurmançî dikim, çêlî edebiyata kurmançî nakim.

Ji bona edebiyata nivîskî nivîsar bingeh e, lêbelê ne ku nivîsar edebiyat e an edebiyat nivîsar e. Nivîsara ku ji bona edebiyatê bingeh e, nivîsara edebî ye. Sê pêplûkên nivîsarê hene ku ya dawî û bilind ya edebî ye.

1. Pêplûka pêşîn **nivîsara rast** e: Ew nivîsar e ku li gora awayên rêzika gramerê hatiye nivîsandin, hevokên wê rûniştî ne. Nivîsar ji aliyê naverok û rastiya ilmî ve ne meqbûl be jî, ji aliyê pîr û pergalên gramerî ve rast e.

2. Pêplûka diduyan **nivîsara baş** e: Berî her tiştî nivîsar ji aliyê teşeyê “nivîsara rast” ve rast e. Ji aliyê naverokê ve mukemmel e. Nivîskar berî ku dest bi nivîsandina nivîsara xwe bike, li babeta xwe çak fikiriye, bernameya nivîsara xwe bi awakî tekûz daniye. Di nivîsarê de dubarekirin tune ne. Bêje bi baldarî hatine hilibijartin ku tam daxwaziya nivîskar tînin ziman, tu dudilî û guman nakin maneyê.

3. Pêplûka sisiyan **nivîsara bedew** e: Ev nivîsar ya edebî ye ku riya wê ji herdû pêplûkên pêşîn derbas dibe û bi jîrîtiya arizî ya nivîskar tê pê.

Bi nîsbet van tarîfên ilmî yê edebî nivîsara kurmancî –çî ya welat (a piştî 1925an) û çî ya Ewropayê- gelo dikeve nav kîjan kategoriyê an gihîştîye kîjan pêplûkê ? Bi dîtina min, bi awakî tevahî nivîsara kurmancî hê di kefteleftekê de ye ku piyê xwe bavêje ser pêplûka pêşî ya dereca nivîsara rast. Lewra kêm nivîskareke kurmancî heye ku li gora awayên rêzika gramerê hatibe nivîsandin û hevokên nivîsarê li cihên xwe rûniştibin. Sedemê vê yekê jî ev in:

1. Tu nivîskarekî kurmanc bi xwendina bingehîn a teoriya gramera kurmancî perwerde nebûye.

2. Ku nivîskarê kurmanc ji ba xwe an vê paşiyê meraq kiriye be gramera kurmancî xwendibe, devoka wî ya navçeyî bi dirêjîya bi qasî bîst salan ewçend lê tesîr kiriye ku di dema peyivîn û nivîsandinê de hînbûna xwe ya gramerê çî bigire ji binî ji bîr radike.

3. Gava ev tişt bi nivîskarên dîtir re jî bi vî awayî bin, di

nivisandin û peyivînê de ji hevûdu hînbûn, îstifadekirin an bi awakî çak li hevûdu tesîrkirin jî bêguman ne gengaz e.

Wê gavê û di wê rewşê de di destê nivîskar de çi dimîne ?
Bi tenê tiştek dimîne ku ew jî gramera dayikê, devoka taxê û çend gotinên egzotîk ji zaravakî dîtir ku zimanzaniya wî bide nîşandayinê.

NIVÎSKARÊN KURMANC DIKARIN ÇI BIKIN ?

Li hember vê rewşê yanî vê sewiya nizim a nivîsara kur-mancî, ji bona bilindkirina sewiyê meriv dikare çi bike ? Meriv yanî:

- Nivîskar dikare çi bike ?
- Xwendevan dikare çi bike ?
- Rexnegir dikare çi bike ?
- Û civaka kurd a li Ewropayê dikare çi bike ?

PROBLEMÊN NIVÎSKARÊN KURMANC

Problema wext:

Ji bilî yek-du kesan yên mayî yên bi kur-mancî bilî dibin ji bona jiyana xwe ya aborî rojê çi bigire heşt saetan karekî wisa dikin ku têkiliya karê wan dûtir an nêzîk bi nivîskariya kur-mancî re tune ye. Merivê ku rojê heşt saet karekî cuda bike, bêguman hem ji aliyê bedenî û hem jî ji aliyê zîhnî ve diweste. Di pey kar de heta westa wî here, hişê wî ji bona fikirandina entelektuelî were serê wî, bêguman ewê wextê razanê were, ku divê razê da sibetirê bikare dîsa here ser kar. Kesekî ku di vê rewşê de be ewê

kengê pê re bigihîje ku bifikire, babeta xam ya çîrok an romana xwe pêşve bibe, cihên ku ne bi dilê wî be biguhêre.

Bi vê rewşê nivîskarê kurmanc nikare xwe ji amator-bûyî-nê bifilitîne.

Problema ragihandinê:

Wek nivîskar, meriv ji bo çi dinivîsîne ? Meriv dinivîsîne ji bona mesaja meriv bigihîje wê derûdora ku meriv dixwaze dengê xwe, daxwaza xwe bigihîne wan kesan, ew kes jî civak e an jî beşek ji civakê ye. Ev ragihandin bi riya belavbûyîna pirtûkên nivîskar pêk tîn. Belavkirin an weşandina pirtûkekê dengkirin e, bangkirin e. Bangkirina ji bona bersîva banga xwe welgirtin e, bihîstina olandayina dengê xwe ye.

Pirtûkeke kurmancî ji kategoriya edebiyatê li vê derê li Swêdê herî zêde hezar nusxe çap dibin. Li gora tesbîtan tê gotinê ku li tevahiya Swêdê deh hezar, li Ewropayê çar sed hezar kurd hene. Ku em her malek kurd ji pênc kesan bijmêrin; li Swêdê du hezar û li tevahiya Ewropayê heştê hezar malên kurd dikin. Bişaftina vê pirsê an di vê babetê de çare dîtîna dikeve ser milê xwendevanan yanî civakê.

Babet û hawirdora tebî:

Nivîskarê kurmanc ê ku herî nû hatibe Ewropayê, bi qasî pêc-şeş sal e ku hatiye. Li Ewropayê îmkânên xwe yê ji aliyê ziman ve gihandinê û bi serbestî nivîsandinê ji yê welêt helbet bêtir in. Lê ji bo nivîskar aliyek neyîfî yê herî xerab heye ku ew jî dûrketina ji hawirdora xwe ya tebî ye. Hawirdora tebî; kaniya jiyana his, raman û babetên nivîsandinê ya nivîskar e.

Herçend li Ewropayê civakeke hebe jî ev civak bi his, raman, rabûn û rûniştin û bi tevgera xwe ya li hember bûyeran

ne ew civaka maka kulturî ya welat e. Bûyerên rojane yê di nav vê civakê de jî ne bûyerên li welêt in. Nivîskarê kurd wek tişteki deynê stuyê xwe an ji bêrîkirina kûr a welat dixwaze babeta çîrok, roman an şîra xwe wek ku li welat derbasbûyî be binivîsîne. Li gora xwe, lêbelê di wî dema ku ew bi xwe li welat bûye, wisa dinivîsîne. Ji vê nivisandinê tişteki derdikeve holê ku dûr an nêzîk têkiliya wê bi realîteyê re tune ye. Nivîsar an berhema ew çend li serê hatiye xebitîn, ji jiyana rojê dûr û seroqûnkî dimîne.

Civaka kurd a li Ewropayê:

Îro li tevahiya Ewropayê civakek kurd heye ku nufûsa wê digihîje derûdora nîv milyonî. Ev nîv milyon çî wek ferd bi serê xwe, çî wek malbat, di fikirandinê, tevgerê, di hînbûyinên xwarin û vexwarinê, di awayê peyivînê, di têkiliyên di navbera mirovan -dê û bav û zarûk, mezin û piçûkan – de ji awayê li welat bi awayekî dîtir diguhirin. Ev pêvajoya guhîrînê her roj bi leztir dibe. Ev bûyîn û bûyer di nîsbeta civaka kurd a welat de deformasyon e, tefesux e. Lê ku em hilhatina civakeke kurd li Ewropayê qebûl bikin, wê gavê em dikarin ji vê guherînê re bêjin ku formasyon e. Yanî civaka kurd a ferdên wê ji ber sedemên siyasî û aborî ji bo demeke demdemî (muweqet) hatibûn Ewropayê, di nav jiyana rojane de û bi tesîra jiyana civakî û hukmê qanûnên welatên lê mayî, dikeve teşeyek nû.

Ev civaka kurd a li Ewropayê wek civakek muweqet xuyan nake. Belkî hin kes ji ber bêqabiliyeta entegrasyonê rojek bizivîrin û hin jê jî piştî teqawidiyê vegezin welêt. Lê ji niha ve wisa xuyan dike ku bi temamî vegeza vê civakê ji gengazbûnê piçek dûr e.

Ev nîv milyon kurd ku ji niha ve tedbîr neyên girtin, heta deh-panzdeh salan wê şexsiyeta xwe ya kurdî parastinê bihêlin,

dev jê berdin. Ji niha ve keç û xortên kurd ku li van deran xwendine, di nav malê de bi hevûdu re bi kurdî napeyivin, bi zimanê resmî yê wî welatê lê mayî dipeyivin. Tenê di dema bersivdayina dê û bavê xwe an yên di salên wan de bi kurdiya (swêdî/almani/fransizî û w.d) dipeyivin, yanî zimanê xwendinê yê wî welatî li gora zanîn û karîna xwe werdigerînin kurdî û wisa bersiv didin.

Ez vê bûyerê li pêş nişên dahatû an dahatûya kurd a Ewropayê wek gelş, wek problem dibînim. Ku nivîskar, pedagog, mamoste û rewşenbîrên kurd di vê tesbîtê de bi min re hemfikir bin, divê ku li hember vê talûkê, li hember vê talûkeya zimanê bavûkalan windakirinê, li hember talûka winda bûyina sexesiyeta kurdî ya nişîa dahatû li ser çareyan bifikirin.

Çareyek ji çareyên ku bi nivîskarên kurd biqede ev e: Avakirina edebiyata kurdî ya ji bo civaka kurd a li Ewropayê.

Mebesta vê edebiyatê divê ev be:

1. Parastin û danasîna erf, edet û kultura kurdî û dayina şûra têkoşîna rizgarîxwaziya gelê kurd.

2. Bi uslûbeke sivik a herikandî, vegotîneke zengîn, zimanê kurdî bi nişên nû şîrîn kirin.

3. Ji aliyê rûhiyetê ve peywendiyên di navbera civaka kurd a Ewropayê û welatê wan ê bavûkalan de xurt kirin.

Ku ji niha ve ev tedbîr bînin fikirandin û bînin bicihanîn, pêncî sal şûn de ewê neviyên me yên li van deveran bicihbûyî xwe wek sêwiyên bêesil û bêfesil nebînin; ewê xwe şaxên li ser rehên gelê kurd hêşînbûyî bibînin û pê îftixar bikin.

(*Berbang*, hejmar 60, Stockholm-1989)

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN

Di dîroka neteweyan de hin kes hene ku berê herikîna dîrokê diguhêrin, herikînê bi lez dixin, an ji wê herikîna bêserûber û kêmbikêrhatî; tînin pîr û pergalekê didinê da bêtir bi kêrî daxwazê bê. Ev dîrok dibe ku bi tenê ya leşkerî, ya siyasî an jî ya çandeyî be.

Di diroka çandeyî ya kurdî (kurmancî) de Mîr Celadet yek ji wan kesan e ku berê herikîn û meşa nivîsara kurmancî guhartiye, bergehê wê fereh kiriye, xwendin û nivîsandina wê di nav piraniyê de belav kiriye û berî hertiştî zimanê nivîskî li ser hîmên tekûz daye rûniştinê.

Ev nûvejîna (renaissance) çandeya kurmancî ye, meydan û navgîna vê nûvejînê jî kovara *Hawar* e.

Di vê pêvajoya nûvejîna çandeyî de *Hawar* hem bi maneya edebî û hem jî bi maneya perwerdeyî xwendegeh (école) e. Bi maneya perwerdeyî xwendegeh e, lewra ji şa'ir û nivîskar Osman Sabrî⁽¹⁾ û nivîskar Dr. Nûredîn Zaza⁽²⁾ bigirin gelek kesên wê demê di dezgehê xwendegeha *Hawarê* de hîni nivisandinê bûn û dest bi nivisandinê kirin. Bi maneya edebî xwendegeh (école) e, lewra bi alfabeya xwe ya latînî-kurdî, bi sîstema rastnivîsînê, bi termînolojiyê, bi gramerê, bi zengîni û curbecuriya naveroka xwe *Hawar* jî kovar û rojnameyên berî xwe vediqete, di riyeke ber bi gel ve, ber bi piraniyê ve, lê bi senteza neteweyîtiyê –neteweyîtiyek nûjen- belav dibe.

Hawar meydana çandeyî ya pêşeroja kurd e ku li wê derê berhemên antîk û nûjen, rojhilatî û rojavayî, kurdî û biyanî, dîn-perwer û laîk; bêî ku hevûdu biêşînin, bi hev re dijîn.

Zanayê mezin Mîr Celadet Beg vê meydanê bi zanîn vekir da ku xwendevanên *Hawarê* digel **Tefsîra Qur'anê** nûçeya **Kitêba Totê Reb**, li rex **Hedîsên Cenabê Pêxember**, **Nivêjên Êzidiyan** jî bi dilferehî bixwînin. Ji alîkî ve wergerandinên ji **Xeyam** û ji alîkî ve yên **Victor Hugo**, ji alîkî ve şîrên klasîk ên kurdî yên tefsîr û şerh xwaz ji aliyê dinê ve dûrik, dîlok, bêlûte û stranên gelêrî.

Û di wan berhemên folklorîk de mezinahiya zanatiya Mîr ev e, ku gotin çawa ji devê dengbêj, çîrokbêj an gotinbêj derketiye herwisa bêî guhartin û destlêdan, bi navê bêjerê wê, bi bilêv-kirin û devoka wan a hêrêmî çap kiriye.

Zimanê kurdî herçend li gora axaftina rojane dewlemend bû jî dîsa bersîva hewcedariya nav û termên teknîk û zanistî nedida, ku ev valahî jî ji aliyê Mîr Celadet Bedir-Xan ve li gora şert û hewcedariyên rojê hate dagirtin. Gelek termên gramerê, yên teknîkî û zanistî afirandinên wî ne ku ji kurmancî re bi diyarî mane.

Bi alfabeya latînî-kurdî, bi *Gramera Kurmancî* di dîroka çandeya kurdî de Mîr Celadet Bedir-Xan kesê pêşîk e û herdû afirandinên wî bi tekûziyeke wisa hatine çêkirin ku di warê xwe de bingeh in. *Hawar* û *Ronahî* di rojnamegeriya kurdî de du numûneyên wisa ne ku di navberê de evçend zeman bihuriye, bi serûberî û sergiraniya xwe hê jî gelek kovar û rojnameyên me yên roja îroyîn negihîştine sewiya wan. Ji bilî vê, ev herdû hê jî kana (xezîne) bêje û termên kurmancî û embara berdest a berhemên klasîk, gelêrî û yên wê demê ne ku gava em di tengasiyê de dimînin an hewcedariya me pê çêdibe serî li wan herduyan dixin.

Ew rewşenbîrekî wisa bû ku mamostatiya rewşenbîrî ya gelek rewşenbîrên kurd kir. Di gelek waran de ew hê jî mamostatiya me dike. Ez wisa bawer im ku di sedsaleyên di pêş de jî ewê mamostatiya gelek zana û rewşenbîrên gelê kurd bike.

(*Nûdem*, hejmar 8, Stockholm-1993)

⁽¹⁾ Zaza, Dr. N. *Osman Sabrî nivîsevan û helbestvan, Apo* (berhevoka şîrên Osman Sabrî, ji aliyê Hemreş Reşo ve. Sal, cih û weşanxane nehatine nivîsandin).

⁽²⁾ Zaza, Dr. Nûredîn. Pêşgotin, *HAWAR û çanda kurdî*, berhevoka *Hawarê* ya hejmar 24-57, ji aliyê Hemreş Reşo ve. Sal, cih û weşanxane nehatine nivîsandin).

PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ GRÊDAYÎ PÊŞEROJA GELE KURD E

NÛDEM: *Gava em li dîrokê dinihêrin, em dibînin ku edebiyata kurdî ya klasîk dewlemend e, di pîvanên edebî de ne kêmtî yên cîranan e. Sedemên wê yên dîrokî û civakî çi ne ?*

R. BARNAS: Ji edebiyatên klasîk ên cîranan ez bi tenê edebiyata tirkî/osmanî dinasim. Asûrî, ereb, ermen û faris cîranên me ne û yên herî kevin in, lê mixabin di bareya edebiyata wan de bi tiştêkî nizanîm ku bikaribim ya me û yên wan bidim ber hev û bêjim edebiyata me ya klasîk ne kêmtî yên wan e an ji yên wan çêtir e. Ji edebiyata kurdî jî tiştê ku ez dikarim li serê du gotinan bêjim, edebiyata kurmancî ye.

Di pey vê zelalkirina pêwîst de bi dilekî fereh dikarim bêjim ku edebiyata kurmancî ya klasîk ji aliyê çawahîne (qualité) ve ji ya tirkî/osmanî qet ne kêmtir e. Ji aliyê çendahîne ve jî hejmeta şa'îrên me yên klasîk ne hindik in. Lê mixabin berhemên gelek ji wana wînda ne an hê derneketine ber ronahiyê.

Vêca em bî ser sedemên dîrokî û civakî yên dewlemendiya edebiyata me ya klasîk:

Şa'îrên kurmancî ên klasîk bi piranî melayên tîr xwendî û tîr gihîştî yên ilmên dînî yê Îslamê û wekî dinê yê felsefê, edebiyatê, matematîkê, stêrnasî, tarîxê û w.d. bûn. Bi erebî, farisî, tirkî û bi taybetî bi edebiyata ereb û farisan baş dizanibûn. Hin ji wana ji bona xwendina xwe çûne li Îranê, Hindistanê, Sûriyê, Misirê geriyane; alim, edîb û zanayên zemanê xwe nasîne. Ji aliyê ilmî û edebî yê li gora zemanê xwe ew bi xwe otorîte bûn. Di

medreseyan de mela digihandin. Hawîrdorên wan xwenda û zana bûn. Ew bi xwe kesên xwedî cihekî gelek gîrîng yê dîwana siyasî ya otorîteya navçeyî (dîwana mîr) bûn. Şîrên wan bi riya mela û feqehên wan (xwenda û zanayên zeman) bi hezkirinî li dîwanên mîr û şêxan (otorîteyên siyasî û dînî), li medreseyên dinê (navendên kultur û entelektuelî) di nav xwenda û zanayên dinê (rewşenbîrên welat) de belav dibûn. Li gora hêjayiya şîrê rûmeta şa'irê wê digirtin.

Ku şa'ir zana û xurt, şîr hêja û gurr, xwenda an guhdar an civak têgiha û rûmetzan be, dawîniya wê ewê çawa be ?! Dawîni dê bibe maka edebiyateke dewlemend.

— *Gelo nivşê îro çiqasî edebiyata xwe ya klasîk nas dike ? Ji bo têgihîştin û jêfêdedîtina edebiyata kurdî ya klasîk pêwistî bi çi heye ?*

— Kesê ku edbiyata klasîk a tirkî an farisî baş nexwendibe û li xwe nexunaftibe, zor e ku ji edebiyata klasîk baş fam bike û zewq jê bistîne. Zimanê edebiyata me ya klasîk mîna farisiya nû tevlihev e. Yê osmanî jî wisa ye. Zimanê ya me jî ji bêjeyên erebî, farisî, kurdî û piçek jî ji tirkî-moxolî pêk tê. Bêje carna bi serê xwe tu manekê nade, ew nima (mezmûn/sembol) ye, ku divê meriv pê bizanibe. Divê meriv ji mîstîsîzmê/sûfîzmê agahdar be ku mebesta şa'ir fam bike. Divê meriv bi hunerên edebî yên wê bizane da bigihîje zewqa naskirina ziraviya hunermendiya şa'ir.

Ji bona jê têgihîştinê, hînkirina (education) bingehîn divê, ku tirk di lîseyan de sê salan di gel edebiyata gelêrî, tekyayî û rojavayî vê jî didin xwendin. Rîyeke din, çapkirin û belavkirina berhemên şa'irên klasîk bi şerh û tefsîr ewê bibe alîkar ji bona vê jê-têgihîştinê.

Wek ferd jê feyde dîtin li ser daxwaziya meriv e, lê wek gel an netewe jê feyde dîtin bi vê riyê dibe ku ewê girêdana di navbera nîşên niha û yên pêşerojê bi pêşiyên me re zeximtir bike, serbilindiya neteweyî dê di giyanê mirovên me de biçîne.

— *Îro behsa helbesta kurdî ya modern dibe. Pîvanên modernîzmê çi ne ? Tu Cegerxwîn dixî kîjan kategoriye ?*

— Di şî'ra klasîk de hin pîvanên bingehîn hebûn: **1.** Kêş, erûz bû. **2.** Teşe an form; xezel, qesîde, mesnewî, rubaî, mustezad, murebba', muxemmes û w.d bû. **3.** Ziman, zimanê bilind ê ji erebî, farisî û kurdî têkel. **4.** Aheng, bi beşavendên (qafiye) dawiyê û redifan dihate dayîn. **5.** Bikaranîna hunerên edebî û mezmûnan (sembolan) nîşana hunermendiya şa'ir bû.

Ji kovara *Jîn* û pê de em rastî gerriyaneke (cereyan) dinê dibin: Ew ne edebiyata klasîk e û ne jî ya moderna îroyîn e. **1.** Kêşa kîteyî dewsa erûzê digire. **2.** Teşe bişihibe xezel an mesnewî jî ne ew in. **3.** Ziman, zimanê gelêrî yê sade ye. **4.** Mijara şî'rê li ser Kurdistanê û milletê kurd e, ji ber vê jî bi piranî di uslûba şîretkirin, hişyarkirin û navtêdanê de ye. **5.** Ahenga rêz an malikê li ser beşavenda li dawiya rêzê ye: Lê beşavend fena ya klasîk ne zengîn an tam e. **6.** Endîşeya şa'ir ya bikaranîna hunerên edebî ji binî tune, ew lê dixebite ku mesaja xwe ragihîne. Ebdurehîm Rehmî û Osman Sabrî du nimînendeyên vê yên herî ber bi çav in.

Bi hin şî'rên Cegerxwîn wekî "*Heval Pol Robson*", "*Kî me Ez ?*" û hin şî'rên Qedrî Can di reng, rûçik û hilma (nefes) şî'ra kurmancî de guherîn xuyan bûn. Ev guherîn hê jî berde-wam e.

Meyla froyîn a şîrê ber bi vî aliyê ve ye. Heta niha ez rastî tu pîvanên tesbîkîrî nehatime. Lê hin xisûsiyetên muşterek ên vê şîrê hene:

1. Kêş serbest e,
2. Ziman sade ya gelêrî ye,
3. Muzîk li gora hunermendiya şa'ir bi beşavendên hundir, dawîn û redifan tê peyda kirin, lê ne ewçend gîrîng e.
4. Mijara şîrê bi piranî li ser pirsên civakî, siyasî û welatî ye. Yên evînî gelek kê m in.

Cegerxwîn di şî'ra kurmancî de pireke gelek xurt û zexim e ku edebiyata klasîk û ya nû digihîne hev. Her sê dîwanên wî yên pêşî xala çaran a vê bendê, lîrîzm û forma edebiyata klasîk digihînin hevdu û di hevûdu de dikelînin.

— *Peywendiyên helbestê bi çîrokê re çi ne ? Roman çawa ji çîrokê vediqete ?*

— Di kurmanciya jêrîn (soranî) de helbest ji bona stran (klam/gotinên klamê/“gûfte”) dibêjin. Me jî vê bêjeyê bi şaşî bi maneya “şîrê” girt û bi kar anî, lê “**helbest**” ne şî'r e û şî'r jî ne “helbest” e.

Du awayê vegotinê hene: Vegotina bi nezimê û vegotina bi nesirê. Şî'r vegotina bi nezimê ye, lê her perçe-nezim an menzûme ne şî'r e. Şî'r perçe-nezim an menzûmeya bi vegotinê gurr û bi pejinê dagirtî ye.

Di edebiyata klasîk de çîrok bi nezimê dihatin nivisandin: Mem û Zîna Ahmedê Xanî, Mewlûda Melayê Bateyî, Leyl û Mecnûna Şêx Mihemed Can çîrok in. Lê êdî kes îro çîrokan bi vegotina nezimê nanivisîne.

Ji awayê vegotinê çîrok û roman bi nesirê (pexşan) têne nivîsîn.

Çîrok serpehatiya kesekî an xelemek ji serpehatiyên kesekî ye. Di çîrokê de kesekî sereke an qehremanê çîrokê heye, serpehatiyên kesên dinê yê bi serê xwe tune ne; serpehatiyên kesên dinê perçekî ji serpehatiya qehremanê çîrokê ye, yanî ji bilî qehremanê çîrokê kesên dinê figuran in.

Roman jî serpehatî ye, lê bûyer xelek bi xelek in: Qehremanê an qehremanên romanê di hin xelekên de dibe ku qet xuyan nekin an jî bikevin derêca figuranî. Di romanê de bûyer ji bûyeran derdikevin an bûyerên ji hevûdu cihê dibin sedemê hin tiştan an bûyeran û ew tişt an bûyer tên di xelekên de digihîjin hevûdu.

Çîrok bi nîsbet romanê kurtir e. Vegotina çîrokê bi nîsbet a romanê gurrtir û kintir e, ji vegotina bi hûrikî (detalj) ya tişt û bûyeran direve.

Çîrok û roman hene ku vegotina wan herikandî, teswîrên gurr û bûyerên wan pejinên xwendevan hildikin, wisa ku meriv naxwaze heta dawiyê dev jê berde: Ji yê vê cureyê re uslûba şî'irkî dibêjin.

— *Edebiyata kurdî bi giştî xwediyê pêşerojê çilo ye ?*

— Pêşeroja edebiyata kurdî bi temamî girêdayê bi pêşeroja gelê kurd ve ye: Ku gelê me bikare bigihîje mafên xwe yê siyasî û demokratîk, ez bawer dikim ku di demê kurt de emê bikarin vê valahiya mezin telfî bikin û bi hindikî bigihîjin sewiya edebiyata cîranên xwe.

Ku hema bi tenê rojnameya *Kurdistan*, kovara *Jîn*, *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû* li Tirkîyê nehata qedexê kirin û bi dest biketina, ku hema ne bi alîkariya dewletê bûna jî lê bi tenê bi kurdî nivisandin û belavkirin nehata qedexê kirin, ewê rewşa edebiyata me ya kurmançî îro bi awakî dîtir biya.

Em li van deran dikarin malê xwe yê belawela berhev bikin, xwedî lê derkevin û bergeha edebiyata xwe ya pêşerojê ya li welat xweş û paqij bikin. Edebiyata miletekî di nav wî miletî de pêş dikeve û geş dibe.

(*Nûdem*, hejmar 10, Stockholm-1994)

GOTIN Û PEYIVÎNA BEDEW: ŞÎR

“*Gotin di destpêkê de hebû, û Gotin li cem Xwedê bû, û Gotin Xweda bû.*” Încîla li gora Yûhena bi vê ayetê dest pê dike. (Binêre li Încîlê ya li gora Yûhena, bab 1, ayet 1.)

Li gora hîlbijartina te ye, te divê bêje Xweda an te divê bêje xweza (surişt/tebî’et). Wî an wê hertiştî ji bo me berdest kiriye. Her tiştên ku hewcedariya me pê hene, li hawîrê me, li gerdûnê; di axê, di avê, di hewayê û di agir de vehewandî ne.

Lê ew hewcedarê destkariyê ne. Divê bi destên mirovan ew ji hovîtî, kûvîtî an ji xamîtiyê bêne derxistin û li gora mebesta bikaranînê bêne kedîkirin û edilandin. Dexil û tene wisa bûn, pez û dewar jî bi wî awayî.

Gewherê zêr bi xwe di sînga erdê de ye, lê wek kevir e; kevirêkî bê teşe. Yê aqût jî wisa ye, yê almas jî. Ku meriv rake perçekî ji wî gewherê kevirîn bîne bi çembil û ben veke û bike stûyê delala xwe, ewê çi bedewiyê bidê gelo ?

Lê mirov; karkerên tevrûbêrê wî ji binê axê derdixin, karkêrên metalurjiyê wî gewherê nesafî dihelînin, zêr ji tebayê din safî dikin û berdidin qaliban, dikin kulînce. Kulînceya zêr wek kerpîçekî pehtî ye, çargoşe ye. Ji bilî çirisîn û bihayiya wê tu bedewiyek wê tune ye. Çi maldar, çi belengaz kes tune ku bifîkire ji dêlva xemlûxişir ve rabe kulînceke zêr bi gerdena hezki-riya xwe ve veke.

Lê gava kulînce tê digihê ber destên hostayê destkariyê, zêrînger; ew bi ziravî, bi tenikî, bi hûrikî wî zêrî li hev badide, dirîhoje, diqewêre, dineqîşîne û hê zêr dibe xemlûxişir. Û ew berhemên vê destkariya edilandinê, dibin xemla bejn û gerdenên delalan.

“*Gotin di destpêkê de hebû, û Gotin li cem Xwedê bû...*”

Lê gotin - bi çi awayî dibe, dilê wî ye – kete nav mirovan. Mirov ew kedî kirin, bi kar anîn, kirin peyivîn. Hosta derketin, rahiştin peyivînê bi destkariyê edilandin: Ew bû nutiq, bû xîtabet, bû xutbe. Û ev gihîşte ber destên hunermendên dîtir; zêrîngerê peyivînê. Ew rabû kulîncêya qirase ya peyivînê rihot, qewart, li hev honand, maneyê kûr û zirav, vegotinê kurt û gurr kir, muzîkê da ber hevîrê wê, bi xewn, xwezî û hêviyê neqîşand, di hêtûna hisan de bi ardûyên hêrs, bêrî, kerb û lavayiyê peht: Û jê şî'r çêbû, afirî.

Şî'r çi ye ? Li gora mîtolojiya Yewnan a kevin, şî'r qasidiya di navbera xwedeyan û mirovan e.

Li gora vê mîtolojiyê, piştî şerê bi dêwan re ku Zeus bi ser ket, bi xwedeya Tîtan (Dêwîn) Mnemosyneyê re zewicî û ji herduyan neh keç çêbûn, ji wan re bi giştî “musa” (muz) tê gotin. Her “musa”yek herêma xwe ya kulturî dinimand (temsîl dikir): Klio tarîxnivîstî, Thalia komedî, Erato stranên evînê, Euterpe blûrvanî û koroya trajîk, Polyhymnia lawijên dîndarî, Kalliope şî'rê mêrxasî û stranên şîn û xemgîniyê, Terpsichore lîrika koroyê û reqsê, Urania astronomî û Melpomene trajedî.

Kalliope û Terpsichore du musa, ya pêşiyê periya nezmê, ya duduyan periya şî'rê; du keçên Zeus bi vî karî bilî dibûn.

Lê zemanê pîrxwedeyî û mîtolojiyê çû, yê dînen “semawî” hat.

“Û Xwedê got: Di navbera avan de bila gunbed hebe û avan ji avan veqetîne. Û Xwedê gunbedê afirand, û avên di bin gunbedê ji avên li ser gunbedê veqetand; û wisa bû. Û Xwedê ji gunbedê re got esman. Û êvar bû û sibe bû, roja duduwan.” (*Tewrat*: Tekwîn, bab I, ayet 6-8).

- “1) Esman rûmeta Xwedê beyan dikin,
û gunbed destkariya Wî radigihîne
- 2) Roj ji rojê re dibê je,
şev ji şevê re zanîne dide nîşandan.
- 3) Gotin jî tune, peyv jî tune, dengê wan nayê bihîstin.
- 4) Ahenga wan gihîştîye hemû dinyayê
û gotinên wan heta kujê erdê,
û ji bona Rojê, Wî li ew der çadir vegirt
- 5) Ew Roj ku wekî zavakî ji menzela zavatiyê derdikeve
û wek mêrxasek kêfxweş dibe ku bikeve ser riya xwe
- 6) Hilhatina wê ji koşê asîmanan
û çerxa wê heta dawîya wan,
û tu tiştêk veşartî namîne ji germa wê.” (Zebûr, mezmûra 19.)

“Wedduha, welleylî îza seca, Ma wede’êke rebbûke we ma qela, we lel axîretu xeyrun leke mînel-ûla, We lesewfe yu’tîke rebbûke feterda” (Bi danê sibê, bi şeva ku tariya wê hedirî û tebitî, Xwedayê te te nehêla û nexeyidî, helbet axret ji te re bixêrtir e ji dinyayê, helbet Xwedayê te dê wê bide te û tê jê dilxweş bibî.) (Qur’an, sûreya Wedduha)

An jî “Wel fecrî, welleyalîn ‘eşrîn, weşşefî welwetrî, welleylî îza yesrî.” (Bi spêdê, bi dehşevan, bi fer û zo, bi şeva hatî û çû...) (Qur’an, sûreya Fecr)

Bala xwe bidin zimanê van perçeyên ji sê kitêbên “sema-wî”; çi vegotineke kurt û bedew, maneyek kûr u gurr, honandîneke ahengdar û geşkirina hisên di canê mirovan: şêweya peyivîna Xwedê... Ma şî’r ne ev e ?

“Qasidiya xwedeyî”, “dayîna Xwedê” an “şêweya peyivîna Xwedê” bila gişt bimînin li wê, heryek li gora xwe dikare mane-kê bidê.

Lêbelê gotina ku emê pê bigihên derekê ev e, ku şî'r zimanê bilind ê ragihandina daxwaziyan e ku ev ragihandin ji aliyê hisan ve dagirtî, ji aliyê gotinê ve kurt, ji aliyê maneyê ve kûr û zirav, ji aliyê vegotinê ve bedew û ahengdar e. Armanca vê ragihandinê ber bi dil û hisan ve ye ku şî'ra xurt bi pêlên xwe yên elektrîkî tafilê li ser dil û hisan tesîr dikin û pê re muhakemeya hiş û mêjî yanî mentiqê dixewirînin. Nemaze ji ber vê taybetiya wê ya dawîn e ku di têkoşîn an propagandayên civakî, dînî û siyasî de ji bona lêgeşkirinê (ajîtasyonê), zimanê şî'rê di ser zimanê berhemên edebî yên dîtir de tê girtin. Ê şa'îrên van cereyanan ji aliyê pêgirana ve zûtir û bêtir tîna nasîn û hezkirin.

(*Nûdem*, hejmar 17, Stockholm-1996)

ÎSA ŞANS Û ROJNAMEYA “SILVAN SESİ”

Berî bi çendekî berhevoka rojnameya “*Dicle-Fırat*”ê derket. Ustad Malmîsanij heşt hejmarên wê berhev kiriye û li hev sêwirandiye, weşanxana “*Apec*”ê jî ew çap kiriye. Xizmetek pir mezin... Ji aliyê min ve gelek spas ji herdû aliyên re jî.

Min bi xwe hejmarek du hejmarên wê li dezgehên rojnamefroşan dîtibû. Yên di jiyê (emr) min de hingê xwendekarên lîseyê bûn û perê me yê ku em bidin û pê rojname bikirin tune bû. Min û yê mîna min me dizanî ku “*Dicle-Fırat*” çi ye û ji aliyê kê ve hatiye derxistin; lê hew, ewçend û ne zêdetir. Lê niha bi saya cefakêşiya Malmîsanij eynika xebat û entelektueliya kurdan a 1962-63yan li ber çavê me ye.

Ji bona min tiştekî girîng î dîtir jî di vê berhevokê de hebû: Du şî'r û nivîsarên Îsa Şans (Îsa Ruhi Silvanlı) mîna makîna zemanguhezîyê ez birim Farqîna bihara 1960î.

Bihara 1960î bû, berî derbeya 27ê Gulanê bû an di pey de bû baş nayê bîra min, lê rojek bala min pêket ku komek zîlam li texteyekî daleqandî yê li dîwarê Fetwaxanê (müftülük) dinihêrin, bi dengê bilind û bi vekîtandin (hece bi hece) tiştekî dixweynin û li serê bi hev re mijûl dibin. Ji meraqan ez jî nêzîk bûm: Li ser texteyek mîna van ên îlanan an yê afîşên sînemayê rojnameke durûpel berepêş û berepaşkî pêvekirî ye û li ser rojnameyê jî dinivîse “*Silvan Sesi*” (Dengê Silvan). Xwediyê wê Îsa Şans û ciyê çapê jî li “*Silvan Sesi Matbaası*” ya li taxa Kelê bû. Bi pejinên romantîk ên xortekî panzde-şanzdeh salî şahiyek di nava

min de keliya; êdî Farqîna me jî bûbû xwedî rojname û çapxane.

Hingê li serê koşeyê hewşa Camiya Ecem yê li aliyê çarşiyê ber bi hêla Belediyê ve xanîkî yek qatî hebû ku ew der dayira muftî bû û di nav xelkê de bi navê Fetwaxane dihate binavkirin.

Ji ku derê îlham girtibû nizanim, lê Îsa Şans texteyekî çargoşeyê li berayî dirêj li dîwarê fetwaxanê, li aliyê ser cadeya mezin (Gazi caddesi) xistibû û di derketina her hejmara nû de rojnama xwe tanî yek rûpela pêşî û yek jî rûpela paşî pêve datanî. Bi vê, mebesta wî ragihandin û nasandina rojnamê bû. Bi vî awayî Îsa Şans, ne bi tenê rojname, lê “Rojnama dîwêr” mîna ya rojhilatadûr anîbû Silvan.

Ev ne rojnameya pêşîn bû ku li ser navê bajarê me derdiket. Ya pêşîn “Miya Farkin” (yanî Miya Farqîn) bû ku li Diyarbekirê ji aliyê “Abdüssettar Hayati Avşar” ve dihate derxistin û li Farqînê jî ji aliyê Mihemed Eliyê birayê vî Îsa Şansî ve dihate frotan an belavkirin. Berî ku “*Silvan Sesi*” derkeve, Îsa Şans di “Miya Farkin”ê de dinivîstî.

Bi vê “*Silvan Sesi*”yê re çapxane jî hatibû Silvan û ev cara pêşî bû ku li Farqînê çapxane vedibû. Çapxaneya ku ji aliyê Gutenberg ve hatibû peydakirin pêncsed sal bi şûn de nîhayet dihate Farqînê. Vê têjika şarsaniyetê (medeniyetê), maka belavbûna zanîn û agahdariyê ya ku li Almanyayê di sê sed salan de hatibû gihîştibû tirkên, ji Îstembola paytexta dewleta Alî Osman heta Farqînê bi rêveçûna kûsî di du sed salan de hatibû gihîştibû me.

Ez wê havînê bi qasî meh û nîv an du mehan li balê di çapxana wî de mîna şagirt xebitîm.

Çapxana Îsa Şans ji du-sê qase hurûfat (tîpên ji risasê rêti) û makîneke çapê a bi destmeşê pêk dihat ku di zaravayê çape-

meniyê de bi tirkî ji vê re digotin “prova tezgahî” yanî dezgehê sihêtîyê. Ev gişt jî yê Îsa Şans bi xwe nîn bûn, wî ew bi emanetî anîbûn.

Îsa Şans hem tîprêz bû, hem çapker... hem nûçegihan bû, hem nivîskar... hem gerînendeyê berpirsiyar û sernivîskar bû û hem jî xwediyê rojnamê. Çapxane û mala wî di xaniyekî yek qatî de bûn: Bihna hibir û xwarinê, ya kaxiz û nivînan gişt di nav hev de.

Serê Îsa Şans mîna kewara mêşan embara lihevqelibîn û xumîna fikiran bû, mîna serê çavîka kaniyek bi bilqîn li ser bilqînê misêwa dikeliya û fikir ji hevûdu dizan.

Farqînperest bû: Behsa tarîxa Farqînê dikir, Farqîna di zemanê împaratoriya asûriyan, Farqîna di zemanê vegirtina Selahedînê Eyûbî... Behsa “Esla Xoros” (an Esra Xorûs) û Kela Nîştônê dikir. Esla Xoros (an Esra Xorûs) ku telafûza wî rast be û di bîra min de rast mabe, -lewra min ev bi devkî jê bihîstiyehakim an dizdarê Farqînê yê di dema vegirtina wê ya ji aliyê Selahedînê Eyûbî de biye. Dîsa li gora gotina wî di dewsa Camiya Ecem an di navbera Camiya Ecem û Camiya Mala Mîran de dêreke pir mezin hebiye ku zemanê Sultan Selahedîn Farqînê vegirtiye, xelkê bajêr gişt xwe avêtine bextê wê dêrê û tê de sitirîne û herwisa jî filitîne. Dîsa li gora rîwayeta wî Circîs pêxember ji ber kafiran reviyaye, kafiran Circîs pêxember qefaltine û li ber şikefta Kerîm ew şewitantine. Loma giyayê wê derê tu car hişk nabe. Behsa Kela Nîştônê ya di dema asûriyan de dikir ku li gora wî Nîştôn Kela Boşatê biye. Wek rêzenivîsar di “*Silvan Sesi*” de li ser cengên împaratorên asûriyan Nebûkednezar, Asûrbanîpal û Tîgletpleser ên li dorhêla Farqînê dinivîsî.

Aşiqekî bêderman ê “Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî” bû. Ev binavkirina di nav neynokan de a wî ye, ne ya min e.

Wêneyekî Selahedînê Eyûbî bi destê xwe û bi pêñûsên cihêreng çêkiribû, li seriya dezgê tîprêziyê, li hember wî daleqandî bû.

Heyranê Mele Mustefa Barzanî û Doktor Beg (Dr. Yusuf Azizoglu) bû. Pevgirêdanek mîstîk û xwedayî di navbera navê Yûsif Selahedîn (ê Eyûbî) û yê Yûsif û Selahedîn (ên Mala Azîz, Doktor Beg û Selah axayê biramakê wî) de didît. Herwisa têkiliyek neyaxurî (netesaduft) di navbera navên Mele Mustefa Barzanî û Mele Mustefayê Berazî de jî didît. Barzanî zivirîbû Iraqê lê hê dest bi şer nekiribû. Ez Mele Mustefayê Berazî nas nakim lê wer xuya ye ku merivekî qenc biye. Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî kurdekî sultanê Îslamê, fatihê Kurdistanê, bi hindikî fatihê Farqînê bû ku wî ew kiribû bin hukmê kurdan û yê dinê jî Doktor Beg “Yusuf Azizoglu” ku hingê pêşkêşê parlamenterên ji Kurdistanê yê demokratîperwer, herêmparêz û hêviya kurdperweran bû.

Şîra Qimil a Mûsa Anter ku dibêje “Bi çiya ketim lo apo, çiya melûl bûn rebeno” bi awayê taybetî yê xwendina wî cazîbêke bêsalixdan weldigirt. Ji xwe min cara pêşî vê şîrê jê bihîstibû.

Bêguman “*Silvan Sesi*” bi tirkî derdiket û rojnameke îdeolojîk an ya propagandaya kurdîtiyê nîn bû. Ya nûçeyên herêmî bû. Di serê pêşî de Îsa Şans an “Îsa Ruhi Silvanlı” rasterast propaganda kurdîtiyê nedikir, lêbelê çî bigire di her hejmarê de bi riya bikaranîna hin bêjeyên kurmançî guhê meriv li kurdî vedikir: Em bêjin dêlva “vîraj” an “dönemeç”a tirkî de bêjeya bi kurmançî “fetlanek”ê, di dewsa “dere” ya tirkî (ku ne tirkî ye, farisî ye) “newal”a kurmançî (?) di nûçeya xwe ya bi tirkî de bi kar tanî û ev jî di nav xwendevanan de dibû sedemê nîvşadî û nîvşaşmayîne: “Wî-wîî! Bi kurmançiya me jî tê nivîsandin!”. Ne ku bera Îsa Şans bi tirkiya “fetlanek”ê an “newal”ê nizanibû. Ji şîr û nivîsarên wî yê di hejmarên 4, 7, û 8 ên “*Dicle-Fırat*”ê jî baş

xuyan e ku ew bi qasî nivîskarekî rojnameyên mezin ên Îstembolê hakimê zimanê nivîskî yê tirkî ye û di aliyê bêjezanîna tirkî de jî qet tengasî nakişîne û li xwe heyirî namîne. Wekî dinê jî zane ku çî dinivîsîne û behsa çî dike. Nivîsên wî bi serûber; kurt, zelal û dagirtî ne. Di warê axaftin û bilêvkirinê de jî mîna bi usûla “beyefendi”yekî Îstembolê bi tecwîdkî bi tirkî diaxifî. Lêbelê di nav nivîsarên xwe yê “*Silvan Sesi*” de bêjeyên bi kurmançî bikaranîna wî bi zanîn bû û ji taktîka wî ya “nerm dayina berê” an jî mîna peykên ûris “veniştina nerm” a li ser erdê bû, yanî hêdî hêdî û nermenerm bêjeyên kurmançî nivisandin û ji berevkî ve hînkirina xelkê bû.

Di payiza 1960î de mala me çû Diyarbekirê. Têkiliya min a bi Farqînê, bi Îsa Şans û bi “*Silvan Sesi*” re nema. Şeş sal di pey de gava ez zivirîm Silîva êdî “*Silvan Sesi*” nemabû. Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8an a “*Dicle-Fırat*”ê – ku mixabin ez hê nû dibînim – di 23.10.1962an de ji ber ku çapxane ji dest diçe “*Silvan Sesi*” jî êdî nema derdikeve.

Çi bi serî de tê ?

Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8an a “*Dicle-Fırat*”ê, Îsa Şans di “*Silvan Sesi*” de bi şîweya Silîvkî (yanî bi tirkîya kurmançî linavxistî) bi navê “Di Edebiyata Kurdî de Siyahmedê Silîvî” di 21ê çirî (ekim) ya 1962 de dest bi rêzenivîsekê dike û di 23yan de jî nivîsara xwe ya bi navê “Di îdeolojiya Xwedê tirkan biparêze ya nîjadperestan de em kurd jî hene an ne ?” diweşîne. Ev herdû nivîsar dibin mîna çengê xwey û dikeve nav agir. “*Müstakil Diyarbakır Sesi Gazetesi*” lê aşkera gilî dike. Li gora ji wê rojnameyê neqilkirina Îsa Şans a di vê nivîsarê de, wî di “*Silvan Sesi*” de nivisandiyê ku “eger rojhilatî (kurd) îmkana xwendin û nivisandina bi zimanê xwe yê bavûkalan bi dest bixin, hingê ewê cehalet ji holê rabe” û bi vê riyê xwendin û nivî-

sandin û weşandina bi kurdî pêşniyar dike. “*Müstakil Diyarbakır Sesi*” bi vê bi tenê lê gilî nake, lê hêviya kuştina wî ji dike. Di sala 1962yan de li cihekî piçûk mîna Farqînê di rojnameyeke mutewazî de pêşniyar an doza mafê xwendin û nivisandina kurdî kirin karê her kurebavî nîn bû.

Ew dewleta ku ehlê wê ji çep heta rast, ji nexwenda heta entelektuelan li ber gotina “*kahraman ırkıma bir gül*”^[1] bi cezbeke uxrewî ji xwe ve diçe û tê xeleyanê, ewê çawa tehemula pêşniyar, daxwazî an dîtînen Îsa Şans ên bi vî awayî bike ?

Li ser vê bûyerê dewlet bi muxbîrê xwe yê Karslıoğlu, bi “sawcı”yê xwe, bi Ali beg û bi polis Kamberê xwe ve aşkiya şidandinê lê badidin. Suat İlhan xwediyê “*Şehir Gazetesi*” şefê buroya “*Tercüman*”ê tê malzemeyên xwe yên bi emanetî paşve dibe. Mîna masiyê li kersaxê mayî Îsa Şans li aziyê dimîne û “*Silvan Sesi*” ji berê xwe ve tê girtin.

Di pey de Îsa Şans wek memûr ketibû “*Verem Savaş Dispanseri*”, lê di pey demekê de îdare ew ji kar derxistibû, doza wî di mehkemê de bû. Li kêleka dikana Seyid Tahir û li hember “yazîxana” Mahmûd axayê Kelî li ber sindoqa boyaxê bû; bi sol boyaxkirinê aboriya xwe dikirkitand. Paşiyê bi biryara mehkemê vegeriya ser karê xwe yê memûriyê.

Ji nivisandin û rojnamegeriyê re Îsa Şans jêhatî û şareza bû. Çima neçû karê rojnamevaniyê nekir û bi memûriyeta “*Verem Savaş Dispanseri*” qîma xwe anî ? Gelo destê wî ji Farqînê nedibû ?

Ji şîr û nivîsarên wî yên di “*Dicle-Fırat*”ê aşkera xuya ye ku kurdperwerekî bi hiş e. Ji ragihandinekê ya hejmara 8an tê zanîn ku ew yek ji wan heşt kesên di koma berhevkirina folklorê kurdî de ye. Lê çima tu car xwe nêzîkî komika welatparêz an “kurdçiyê” Farqînê nedikir ? Di navbera wan de gelo tişteki

qewimî bû ? Mixabin ez pê nizamim. Heke min berê ev nivîsarên wî yên di “*Dicle-Firat*”ê de xwendibiya, minê misoger van çimayan hem ji wî û hem jî ji aliyê dinê bi înad bipirsiya. Lê heywax êdî nikarim van pirsan jê bikim, lewra li gora bihîstina min di sala 1990 an 91î de ji nexweşînekê miriye. Heywax û heywax!

Peydakirê çapxanê Gutenberg jî top avêtibû û ji piyasa çapemeniyê winda bûbû. “*Dicle-Firat*” ku ji aliyê dewletê ve nehata girtin jî ji bêperetiyê li ser girtinê bû. Qedera Îsa Şans jî mîna ya Gutenberg çêbû, ew jî ji piyasa rojnamegerî, rojnamevanî û nivîskariyê bi carekê û ji binî vekîşt. Belkî îro gelek Farqînî Îsa Şans bi vî aliyê wî qet nas nekin jî. Çi heyf!

(*Nûdem*, hejmar 25, Stockholm-1998)

^[1] ji nijadê min î qehreman re bikene

ŞEREFNAMEYA BI KURMANCÎ Û BÎRA ME YA MILÎ

Di vê bihara 1998an de Şerefname “*Tarîxa Kurdistanê ya kevn*” a Şeref Xanê Bidlîsî cara pêşîn bi kurmancî çap û belav bû^(*). Kurdperwerê hêja û nefspiçûk Ziya Avcî bi wergerandina vê pirtûkê ji xwendevanên kurmancî re xizmeteke mezin a bêhempa kiriye. Destê wî terr û hêşîn be.

Şerefnameya bi hîmê xwe bi farisî nivisandî piştî wergerên xwe yên bi fransîzî, erebî, tirkî û soranî çar sed sal şûn de bi kurmancî dikeve berdestê neviyên arkinçiyên mîrîtiyên hingê û bi kurmanciya gewr a ku serhedî jî, berrîyî jî bikarin bi hêsanî jê fehm bikin û uslûbeke rewan ku ji xwendina wê meriv têr nabe, hatiye wergerandin. Werger Ziya Avcî bi rastî serê xwe di ber de gelek êşandîye, herçend wergera mamosta Hejar ji xwe re bingeh wergirtiye jî lê bi nusxeyên herdû zimanên dinê (farisî û tirkî) jî daye berhev, têvelî û neliheviyên ku hema rast lê hatibe, wan bi şandekan nîşan daye. Piştî vê kira hêja, Mîr Şeref Xan dikare êdî bi firêqetî û sersiqirandî di gora xwe de binive. Ragihandina wî winda nebû û niha gihîşte zarûkên wî welatî ku wî tevî bêîmkaniyê an kê-mîmkaniyên bidestxistina pirtûkan ên dema xwe serê xwe di ber de gêj kir, canê xwe di ber de azirand, tarîxekê nivisand û ji me re hişt. Bi munasebeta çar sed û yek saliya nivisandina vê berhema hêja selam, hurmet û spasên xwe ji gîyanê nivîskarê wê Mîr Şeref Xan re pêşkêş dikim.

Bîra merivekî hişê wî ye. Merivekî bêhiş bi bîr nayîne ku kengê li ku derê çi kiriye, çi gotiye, çi pirsîye an çi xwariye.

Merivekî wisa li eynî derê, li eynî kevirî dikare sed caran biartile, ciyekî xwe biêşîne û neyê bîra wî ku ev berê jî bi serê wî de hatiye. Ji ber bêbîrî an bêhişîya wî, ciyê wî li civatûcaxiyan tune ye. Merivên wî zûbizû wî nayinin nav civatan, herçend ew kes berî vê rewşê mêrxasekî bi navûdeng, alimekî bêhempa, xweşsuhbetekî yekta bûbe jî.

Bîra neteweyekî jî tarîxa wî ya nivîskî ye. Berî tarîxa nivîskî dîroka devkî wek çîroka Mala Zalê ye, yanî efsane û galegala vala ya li ser pesin û fortan e. Lê Şerefname tarîxa nivîskî ya perçeyekî ya bîra neteweyê me ye: Gava ew di pêş de bi tarîxa Ebûl-Ezreq û yên dinê yên temamker bê temamkirin, hingê bîra me ya neteweyî wê dest bi fonksiyona xwe ya xebatê bike.

Navê vê pirtûkê “*Şerefname Tarîxa Kurdistanê ya kevn*” an li gora ya çapa St. Petersbourg-1862 “*Şerefname Tarîxa Kurdan*” e. Lê bi rastî Şerefname ne tam tarîxa Kurdistanê ye û ne tam jî tarîxa kurdan e: Ew tarîxa xanedan û mîrîtiyên Kurdistanê ye. Bi qasî ku têkiliya wan bi mîr û xanedanan re heye behsa tişt, bûyer, eşîr, dever û kesan tê kirin. Behsa şa’irên mîna Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî ku berî Şeref Xan jîne an hemdemê wî ne nayê kirin. Lêbelê behsa şa’irtiya Yaqûb begê kurê Mihemed begê zirkî tê kirin û texmîna hebûna dîwanek wî ya şîrên bi kurdî jî tê kirin ku heta niha kesî bi vî navî şa’irekî kurd nebihîstîye. Herwisa eşîra Xerzan eşîrek mezin û melbenda wê jî heremek gelek fereh e, ji aliyê devok û kulturê ve jî xwedî ciyekî taybetî ye, lêbelê behsa wê nayê kirin. Bi tenê li derekê, tiqûtenê gotina “nahiya Xerzan” derbas dibe.

Şerefname erê tarîxa mîrîtiyên Kurdistanê ye, lê pê re jî rapora zanistî ya psîkolojiya kes û civaka kurdan e. Tesbîten Şeref Xan û yên Şêx Ahmedê Xanî yên di xisûsa karakterê ferdi û civakî yê kurdan de eynî wek hev in:

Ne bîst û çar kes, bîst û çar eşîr di rojekê de digihîjin hev (ev mu'cîze ye), federasyonek datînin (federasyona Rojî) -ev ji bona me kurdan mu'cîzeyê herî mezin e-, lê derdê giran ev e ku ji nav xwe, ji xwe re mîrekî an sermiyanekî hîlnabijêrin, ji Bidlîsê diçin Xelatê du birayên bi eslê xwe nekurd tînin yekî dikin mîrê Bidlîsê, yekî jî yê Hezoyê.

Weyaxud yekî ebasî, emewî, tirkmen, xalidî filan tê deve-rekê tafilê li dora xwe çend qebîleyên kurd dicivîne, dibe mîrê wan. Ew herêma an eyalet bi erêkirina xelîfe, şah an sultan dibe mîrîtî an milkê wî kesî û nav an naznavê wî kesî jî li wê herêmê û eşîrên herêmê tê danîn; herwekî [Behdînan](î), [Şemzînan](î), [Silêman/Silvân ?](î), [Zirkan](î) û kurd jî li dijî vê bûyerê dernakevin. Heta di bin serekatiya wî kesê nekurd de heta Gurcistanê, Xoresanê an deverên ji war û welatê wan dûr dikarin herin, xwedênegiravî li hemberî dijminê xwe şer bikin. Lê li hemberî qebîle û eşîrên kurd ên birayên xwe serê xwe danaynin û mezinatiya yekî kurd qebûl nakin û şayet gumana tiştekî wisa ji wan bikin, bêlêbûrîna bi şûr û xencer dibezin wan.

Şerefname neynika rûhiyeta me ye û bê armanceke taybetî, nîşanî me dide ku em kurd çendî biyanîperest in. Em ne ku xerîbdost in, lê xerîbperest in. Li alîkî dibînî Hulagû Xan, Tîmûrleng, Şahê ecem, sultanê romê, xelîfeyê Şamê an yê Bexdayê aliyekî Kurdistanê daye ber xwe serûbin, xopan û kavil dike, ji aliyê dinê bala xwe didiyê ku hêzên wan ên herî dijwar û şerkar hin eşîrên kurd ên ji herêmeke dinê ne.

Rewşa rûhî ya xwenda û aliman jî ji kesên sade ewçend pir ne cuda ye. Mîr behsa heşt “mewlana” yên mezin ên ji Bidlîsê derketî dike: Mewlana Ebdurehmanê Bidlîsî, mewlana Mihemed Berqelî, Şêx ‘Emmar Yasîr, mewlana Husamedînê Bidlîsî, mewlana Îdrîsê Bidlîsî, Ebû-l Fadil efendiyê kurê mewlana Îdrîs,

Şêx Ebû Tahirê kurdî, Şukrî Şa'ir. Lê di nav wan de yekî ku ji bona Xwedê rêzek li ziman an kultura kurdî zêde kiribe tune. Xizmetkarên erebî, farisî, tirkî û tirkmenî bûne.

Piraniya mîr û serwerên kurdan bi eslên xwe biyanî ne, ne kurd in: Li gora tesbîta Mîr Şeref Xan mîrekên Hekarê, Îmadiye, Mirdasî, Çemîşgezek (? selçûkî) û Kilîsê ebasî, yên Boxtan (Botan) xalidî, yên Zirkan seyid, yên Dînewer-Şehrezor û Biradostan hesnewî (?), yên Sohran û Dinbiliyan û wekî dinê gişt bi eslê xwe ereb in. Mîrekên Bidlîsê û Sasûnê sasanî, yên Kelhûrî keyanî û yên Suwêdî bermekî ne ku ev jî faris (pars) in. Yên gelbaxî tirk in. Fermanrewayê Diyarbekir û Cizîrê (merwaniyên Meyafarqînê yên dema Badê Dostik), yên Lora mezin û Lora piçûk, yên Erdelanê (ji merwaniyên Meyafarqînê ne), fermanrewayên eyûbiyan, melîkên Hesenkêfê (eyûbî) jî kurd in. Eslê mîrekên Xîzan (Hîzan), Şîrwan, Baban, Mekrî (Mukrî) û Baneyê ne binavkirî ne.

Gerçî ji edeba xwe ya bilind gava Mîr Şeref behsa her mîr an fermanrewayekî dike, bi sifetên wek aza, serbixwe, mêrxas pesnê wan dide, lêbelê tu yek ji wan jî bi maneya îro û heta ya wê demê jî azad û serbixwe nebûye. Gişt jî girêdayê hin merkezen mîna xelîfetiyan Bexda, Şam, Qahîre, di pey re Konstantîniye an mîna yên şahîtiya Tebrîz û sultaniya Konstantîniyeyê bûne. Di nav wan de yê herî mezin û muqtedir Selahedîn Eyûbî yê sultanê Misir û Şamê ye ku ji Nûredîn Mehmûd re qasid dişiine û dibêjê: *“Ne hewce ye ku tu heta vê derê cefta bikişînî, werî. Kolekî xwe bişîne bila were zîncîrê bavêje stuyê min û min heta-nî ber hizûra te li pey xwe bikişîne. Ez kolê te me”^(*)*

Ku Sultan Selahedîn bi vî awayî be, hun werin li halê rebenên dinê bifikirin.

Mîrekên dinê herwekî walî, qeymeqam, mudirê nahiyê;

piçek guhartî lê mîna memûr in û li ser kêfa xelîfe, sultan, şah, wezîr û carina jî ya paşayê (mîrmîranê) Diyarbekir, Wan an Bexdayê ji mîrîtiyê têne avêtin an jî bi cî kirin. Mîrê Hekariyê, yê Boxtan (Bohtan), yê Kilîsê tayînî Bosnayê, Buxdan û Temeşwarê dibin.

Mîrên me jî wekî me ji yekîtî û fikra yekîtiyê her dûr in. Li ser pêşniyara Îdrîsê Bidlîsî Sultan Selîm dixwaze ku mîrên me di nav xwe de mezinekî hîlbijêrin, ew kes bibe mîrêmîran an melîkê Kurdistanê ku Sultan pê re bide û bistîne. Ji mîrên me heryek xwe pêşniyar dike û ji xwe pêve kesî qebûl nake. Li ser vê Sultan Selîm ji wan re Çawîşbaşiyê xwe “Bıyıklı Mehmet (Paşa)” dişîne û dike mezinê wan û pê mîrên me jî ji vî derdî xelas dike.

Em fikra yekîtiya mîran li wê derê bihêlin, ew bi xwe di nav xwe de bi hev re xayîn in; bira bi bira re, kur bi bavê re ne rast e. Heryek ji wan li pey payeya mîrîtiyê ye û ji bona wê payeyê jî dikare bav, bira, kur û mamê xwe li bejiyê bifroşe, bikuje an bide kuştin. An jî ji bona ku herwisa mîr bimîne dikare dev ji mîrîtiya herêmeke mezin berde û bi ya qasî çend gundan qaîl bibe. Mefhûma “welat” ji bona wan ew erdê di bin hukmê mîrîtiya wan de ye ku bi berat an fermana şah, sultan an xelîfe hatiye dayîn. Mefhûma “Kurdistan”ê jî yek jê di berat û fermanên resmî de bi tenê ji bona mîrîtiya Çemişgezek (herêma Dêrsima îroyîn) tê binavkirin û ya duduyan jî gava kurd û mîrên kurdan ji welatê xwe dûr in; li Konstantîniyê, li Tebrîz an li xerîbiyê ne, ji dêlva bajar, gund an eşîra xwe bi vî navî xwe didin nasîn an têne naskirin.

Mîr Şeref Xan bi qencî, dilsozî û şîranî pesnê kurdan û mîrên kurdan dide. Di vê nivîsê de tiştên ku dibe wek rexne bêne fêmkirin ne gotinên camêr in; jêfankirin û dersihilanîna min a ji tarîxa me ye. Dibe ku ev dersjêhilanîn li xweşa merivan,

li xweşa merivan wek merivekî kurdê dilperitî neçe, lê xweşî tişteki ye û rastî tişteki dinê ye. Heta meriv nexweşîna xwe veşêre, meriv ne dermanê xwe dibîne û ne jî sax dibe. Heta meriv şaşiya xwe nebîne û li xwe daneyne, meriv jî şaşîtkirinê nafilite. Ku meriv xerabiyê ji qencyê neniqîne, çawa bikaribe qencyê bike ?

Çi ji me kême ?

Ji me sultan (yên merwanî û eyûbiyan) derketine, fatih derketine ku heta Hîcaz û Yêmenê kirine bin hukmê xwe (zarûkên Necmedîn Eyûb), mîrên me yê ji neslên tahir (seyid, ebasî, xalidî, emewî, keyanî) jî hebûne; xortên kurd hetanî Xoresan, Gurcîstan û deverên dinê çûne û canê xwe jî dane, yanî mêrxasên me yê canfeda jî hebûne û hene. Xwenda û zanayên me jî hebûne ku dîwanên şah û sultanên xemilandine, di medreseyan (zanîngehên) paytextên herêmê de dersda bûne. Li ser navê me ne tapo kirîbe jî axa me ya bi navê me binavkirî jî heye ku em bac û xeraca wê jî didin. Lê wisa be çi kême ?

Qewlî mesela Xocê Menşûr ve lê wisa be em çima helawê çênakin ?

Em nikarin helawê çêkin. Em nikarin û ku wisa here emê nikaribin jî. Lewra tiştê hevduşgirtinê jê kême: Ruhê kurdîtiyê...

Roja ku em kurd wekî ferd bikaribin kurdbûna xwe ji eşîr, navçe, dîn, mezheb, terîqet, baweriya siyasî û felsefî, partî û serekatiya partiya xwe pêştir bigirin; menfeeta kurdîtiyê di serdestî van hemûyan û helbet ya xwe ya kesî û malbatî de jî bigirin, hingê şefeqa me wê bavêje û sibeha me zelal bibe.

Roja ku wekî ferd em bikaribin bêjin: Ez pêşiyê kurd im û dû re bisilman im, ez pêşiyê kurd im dû re neqşebendî me, ez pêşiyê kurd im dû re alewî me, ez pêşiyê kurd im û dû re êzidî me, ez pêşiyê kurd im dû re komunist im, ez pêşiyê kurd im dû

re ateîst im, ez pêşiyê kurd im dû re endamê partiya xwe me, ez pêşiyê kurd im dûre bendeyê serokê xwe me û vê di nav civakê de bidin bicihkirin, di axaftin û nivisandinê, li mal û li derva, di karê rojane û yê entelektuelî de pêşîkî bidin zimanê kurdî û berhemên wê; hingê ewê rûhiyeta kurdî mîna çîmantoyê eşîr, mezheb, gundî, bajarî, kurd û esilkurdan bigihîne hevdû û ji gelê me yê bêçare re çareyê ji bûtika guliyê dara hêviyê mîna gul bibişkişîne.

Berevajiyê vê hemû xewn û hemû derew...

şerefnameya bi kurmancî bixwîne, carekî dîtir bixwîne û bi tenê ne rêzên nivîsandî, yê di navbera rêzan de jî bixwîne.

(*Nûdem*, hejmar 28, Stockholm-1998)

(¹) Navnîşana çapxanê: Apec-Förlag, Box 3318 163 03 Spånga/SWEDEN

(²) *Şerefname*, rûp.108

“YÊRÊVAN XEBER DIDE GUHDARÊD EZÎZ”

Welgira radyoyê gelek bi derengî, piştî salên 1961-62 yan de kete mala me. Li Farqîna me di sala 1952 yan de bi ferehî radyo ketin nav malên kubar û efendiyên tirkîaxêf. Taqeta me hebû, lê mala me ne tirkîaxêf bû, ji ber vê em demek bêî wê man.

Herçend hingê radyoyên bi anot û katot peyda dibûn jî yên li bajêr bi elektrîkê dixebitîn. Li Farqîna me elektrîk nîvrokî bi qasî saetek – saet û nîvekê û êvarê jî bi banga şivê (azana mex-ribê) re heta serê sibê dihate berdan. Yên ku radyoyên wan hebûn di navbera wan deman de dikarî guhdarî bikin.

Mala Zekerîya onbaşî li hafa dikana bavê min bû. Ku hema elektrîk dihate berdan Edîbeya qîza wî dê radyoyê vekira, bi xêra wê dikandariyên nêzîk ewê bernamêyên “yurttan sesler” guhdarî bikirana.

Hingê du îstasyonên Tirkîyê yên guhdarîkirinê hebûn: Ya Îstembolê li ser pêla dirêj bû ku bi rojê nedikişand û ya Anqerê li ser a navîn bû, ew çêtir dihate bihîstin.

Lê sêlikên (plak) kurmancî di 1952-53 yan de hatin Farqînê. Li qehwexaneya çarşiya jêrîn -ku Çawîşoyê marmij marqeciyê wê bû- gramofoneke mekanîk hebû, pê sêlik lêdixistin û dengê wê bi hoparlorê didan aliyê meydana biniya hewzê. Ji yên populer ên tirkî pêve hingê sêlikên Kawis Axa û Meryem Xan hebûn ku rojê çend car dihatin lêxistin.

Bi wergerandina leşkerî ya Iraqê ya Ebdulkerîm Qasim di 1958 an de ji nişkave radyoya Bexdayê ket piyasê û dest bi

weşana kurmancî kir. Belkî berê jî hebû lê Farqîna me hê wê gavê bi kurdiya wê hisiya. Radyoya dikana Muhyedînê berber çî bigire timî li ser wê îstasyonê bû û jê stranên mîna “Here Leylê”, “Hatim, hatim bi serbestî hatim”, “Her bijî kurd û ereb..” dihatin belavkirin. Dengê radyoyê mîna kişandina nixafê ji berê xwe ve pêlek bilind û pêlek nizim dibû.

Piştî ku radyo ket mala me – ciyê wê jî di oda lêrazana min de bû- ji meraq û betaliyê min îstasyonan serûbinê hev dikirin da rastî tişteki xwestir bêm. Rastî li radyoya Qahîrê, Emanê (Urdu), Şamê yên beşa kurmancî hatim. Ji ya Bexdayê û van hersiyên dinê pêve radyoyên Kermanşa û Qesrîşîrîn jî hebûn ku beşa kurmanciya wan gelek qels bû yan li ser “şoreşa spî” ya ‘Elehezret Şahînşahê Aryamêhr bû yan jî klamên Behadîne Dostikî û Mecîdê Herkî bûn ku herdû jî li aliyê me ne ew çend jêhezkişî bûn. Mele Evidirehmanê radyocî digot şah ji şeytanî ew herdû anîne danîne ser radyoyê da ku alem ji klamên kurmancî nefret bikin.

Û mala wê ava radyoya Yêrêvanê (Erîvan/Rewan) dengê xwe bilintir kir û bi ser me xist: “**Yêrêvan xeber dide guhdarêd ‘ezîz!’**”

Min ji hemû stranên kurmancî çî yên gelêrî çî yên klasîk an dînî jî berê de hez dikir û hê jî hez dikim: Lê bi şertê yê/ya ku distrê dengxweş be, yekoyeko ji hev veqetandî û zelal bêje, li meqam û bi hisiyateke gurr bistrê, neke vinevin û xulexul. Çî klam çî dîlok çî qewl û qesîde bin ku di gotinê de ji hev neyên veqetandin; di dev de bên gemirandin, mirmirandin û fetisandin tu tama jê famkirinê tê de namîne. Vêca ku meqam jî kulek û dûzaheng (monoton) be, lê guhdarîkirin dibe mîna “ezabê qebrê”. Lê timî jî stranbêj, dengbêj, derwêş an melayên dengxweş û şareza peyda nabin. Yêrêvan vê peydanebûnê rakir, bi

pispor û şarezayên serşe yên xwe rojê carek – du car vê fersendê gihandê jêhezkiyan.

Bi saya radyoya Yêrêvanê di piştî 1964-65 an de gelek xortên aliyê me mîna “ferz-ul ‘eyn” a li ser sofiyekî hişk ê bisilman di wextê de dest bi vekirin û guhdarîkirina bernameya stranên kurmancî ya Yêrêvanê dikirin: Ew qismek ji gencîneya (xezîne) me ya ku buhistek di binê toza jibîrkirinê de mabû; mîna Kerro û Kulik, Flîtê Quto, ‘Emê Gozê, Lawikê Metînî, Miho, Ahmedo Ronî, Hekîmo, Xelîlê Xazî, Kalo Siba Te Bi Xêr ‘Eyda Te Bimbarek û bi sedan yên wekî dinê bi awakî dilkêş li me dizivîrîn. Mîna brûska evîne dilê me dihingaftin û tê de bişkoja kurdperweriyê didan bişkafîtin. Heta hezkirina ji stranên kurmancî ewçend kûr û pêşve çû ku me li hevdû wesiyet dikir, digot: “Binêrin ku ez bimirim, wesiyeta min li we hunê li ser gora min dêlva telqîn û yasîne “Lawikê Metînî” û “Bêrîvanê” bistrên.

Bi saya teknîka transîstorê radyo bêtir edîlîn û Yêrêvan li şaristan û yabanê bêtir hate guhdarîkirin. Pê re jî ji folklorê devkî ya kurmancî hezkirin û li çandeya xwe ya kurdî xwedî derketin zêdetir, ferehtir û kûrtir bû. Strana Flîtê Quto yê me yî rêbirê karwanê Mamê ‘Etmankî ku bajariyên me yên heta hingê pênc pere tê nedidan, niha li ba wan ên kurdîxîret ji stranên hêja yên Zeki Müren û Münir Nurettin Selçuk jî bi qedirtir dihatin girtin. Bi rastî jî gava ku Gerabetê Xaço distra ji meriv tirê ku wayê dêwekî çirokî pala xwe daye çiyayê Meretoyê û bi ser Kevanê Qîrê, Deştê Bişêriyê de ber bi Elmedîna ve xwe xwar kiriye û distrê.

Yêrêvan xeber dide guhdarêd ‘ezîz!

Bi rastî jî Yêrêvan xeber dida.

Yêrêvan klamên me yên kurmancî bê guhartin, bê lê kêma û zêde kirin berhev dikir, bê ku bi qasî milîmekê gotin an meqa-

mê wê biguhêre; bi sazek (enstruman) an çendên munasib, lêbelê bi ostayî muzîka berpâlê ji wê klamê re çêdikir û diweşand. Muzîka enstrumanî di dezgehê radyoya Yêrêvanê de ji meqamê devkî re wek palgeheke hevrîşim e, ku di serî û di navberan de meqamê devkî û dengbêj wek balgîhekê pala xwe didinê. Muzîka enstrumanî (ya sazê) ya Yêrêvanê, muzîka (meqamê) bingehîn a stranê bi qasî mûyekî jî riya xwe şaş nake û jê averê nabe, pê re tam mîna çerm û laş lihevkiirî ye. Bi vê liheviyê muzîka enstrumanî ya kurmancî derdikeve meydanê ku ev awa jî dibe belgeya nasandin û tescîla biserêxwebûna muzîka kurmancî. Bi vê belgeyê merivekî muzîknas – çi kurmancî çi biyanî – dikare muzîka kurmancî ji ya azerî, ermenî, erebî, farisî, hindî, yûnanî, makedonî ûrîsî, tirkî û herwekî dinê veqetîne û bibêje a ev muzîk ne ji wan muzîkan tu yek e; ev muzîkek bi serê xwe ye û ya kurmancî ye.

Yêrêvan konservatuwara muzîka kurmancî ye: Hem bi maneya xwendegh û hem bi maneya parastin û hilanînê (konserve/muhafeze kirin) konservatuwara muzîka kurmancî ye. Hem muzîka kurmancî ya devkî berhev kiriye û parastiye, hem jî ji bona kesên ku bixwazin muzîka xweber (authentique) a kurmancî hîn bibin bûye perwerdegeha (medrese) muzîkê. Ji bona wan kesên ku bi rastî bixwazin muzîka kurmancî ya gelêrî û bingehîn binasin û hîn bibin.

Sêlikên Kawis Axa û Meryem Xan hê di salên 1952-53 yan de hebûn. Kasetên wan ên ji ber wan sêlikan hê jî hene. Ku meriv guhê xwe dide stranên wan, çêtir dibîne ku muzîka enstrumanî ya bi stranên wan re bi ya Yêrêvanê re qet nayê muqayese kirin. Muzîka enstrumanî ya di sêlikên wan de wek pîneyên yaxurî (êyretî) dimîne, muzîka wan a enstrumanî tew qet li muzîka xwezayî ya stranên wan herdû hostayan nanihêre. Di

muzîka enstrumanî ya di sêlikên Mahmûd Qizil û Eyşe Şan de jî rewş bi wî awayî ye, mîna zirna Inisê mirtib ku li ber yasîna hafiz Fethulah be an jî li ber govendê ku li neyê xin. Di vê de bêguman tu qisûra Kawis Axa, Meryem Xan, Mahmûd Qizil an Eyşe Şan tune ye. Ew ne sazband in, lê hunermendê deng û meqamên xwe ne û ji aliyê xwe ve di dema xwe de bêhempa bûn. Lê gava ku meriv wê muzîka enstrumanî ya di stranên wan de guhdarî dike, meriv nikare bêje a ev muzîka ha, ya kurmancî ye. Yanî ew nîşana cudatî an taybetî (elametê farîqe) bûyîna muzîka kurmanciyê dîtin û bihîstin di sêlikên wan de ne mumkin e.

Felsefe an jêfamiya muzîkê ya gelêrî gelek muhîm e. Di muzîka gelêrî ya kurmancî de bi his û pejinên xwe naveroka stranê û ya ahenga meqam bi temamî lihevkiirî ye: Ku naveroka stranê bi derd û xem be meqam jî li wê gorê xemgîn, derdnak û giran e. Ku naverok bi şadî û xweşî be, meqam jî li wê gorê sivik, bestvekiirî û kêfjen e. Bi muzîkên derûcîranên din nizamî lê di tirkî de ev timî ne wisa ye. Mêrik dibêje “Dediler yarin hasta/Yetiştim son nefeste” (Gotin yara te nexweş e/Di nefesa wê ya dawîn de gihîştîm serê) û dêlva ku li berê rûnê, li xwe xe û xweliyê bi serê xwe dake, lê bi meqamekî wisa distrê ku meriv jî û ew jî li berê “şiqir-şiqir-şiqirdam” bi “çifte telli” direqise. An naveroka stranê nêtar (neutre) an a şadiyê ye lê meqam wisa xemgîn e ku li berê giriyê meriv tê: “Bahçada yeşil hıyar/Boyun boyuma uyar/Ben seni gizli sevdim/Bilmedim alem duyar” (Li baxça xiyarê teze/Bejna min û te li hevdû dikin/Min ji te bi dizî hez kir/Min nezanî ku ewê herkes pê bihise). Bi meqamek wisa tê stran ku li berê hem giriyê meriv tê û hem cegera meriv pê re reş dibe.

Strana “Ax Kurdistanim ka ?/Bax û bostanim ka ?/Dijmin tev girtin ax!/Ax Kurdistanim ka ?” wek şîr gelek xweş û manî-

dar e. Gava ku meriv wê bi şîrkî bixweyine divê dil û hinavê guhdaran bişewitîne, bihelisîne, bihelîne. Lê li ber muzîka wê meriv tê eşqê, govendek ji dil û can digire, herwekî ku meriv gihîştibe xweziya xwe. Ku ne ji naveroka gotinên stranê be, ew (meqam) jî ji ser sed puwanî sed distîne. Lê ew naveroka şîrê ya xemgînî û malxopanî û ew muzîka bi kêf û eşq a heçgiloriyê qet li hev nakin: Em dibêjin “Ax Kurdistanim ka ?/Dijmin tev girtin ha” û li berê ji kêfa, ji eşqa direqisin, xwe hiltînin li erdê dixin; ji ya “Dediler yarin hasta/Yetiştim son nefeste”yê bi sosretir e jî. Ev neliheviya muzîk û naverokê di stranên gelêrî yên kurmançî de tune ye. Yêrêvan tu car vê stîla muzîka devkî di muzîka enstrumanî de neguhartiyê û vê taybetiyê her wisa wek xwe parastiyê.

Niha li strana “Eman eman koçerê guhdarî dikim”. Cara pêşî min ew li Diyarbekirê di sala 1964 an de guhdarî kiribû. Hingê Bekirê meyxanecî hebû ku meyxana wî li pişt Sur Palasê li hafa “Tüccarlar Kulübü/Dilan Sineması” bû. Berê êvarên bihar û havînan ewê sêlik bida ser gramfonê û dengê wê bi hoparlorra ser rê berda derva. Ê!.. ev stran jî bi meyxwiran mey dida vexwarin. Çima ? Ev stran bi eslê xwe ya ber govendê ye, lê dengbêj wek filma grankişandî giran giran straye ku biye strana meyxanê, pê re muzîka wê ya enstrumanî jî ji muzîka bingehîn a stranê veqetiyaye û rengê muzîka stîla Celal Güzelses welgirtiyê (mîna neliheviya naverok û muzîka Bahçada yeşil hiyar).

“Ez çi dibêjim û tembûra min li çi dixê! ?..”

Aslîka Qadir, dengbêja strana “Welatê Me Kurdistan e” di programa *Şaneşînê* ya CTV de straneke gelêrî (folklorîk) a leyistika giraniyê (sêpê) distra ku li berê hindik mabû ez rabim govendê; lê orkestra di fesla navbera bînvedana dengbêj de li

muzîkek wisa xerîb xist ku tu têkiliya wê muzîkê bi meqamê strana Aslîkê re tune bû. Hem Aslîkê xwe şaş kir û hem besta min a rabûna giraniyê li wê derê bihêlin, ya pê re nihirandinê nema. Çend roj di pey de dîsa di wê bernamê de û bi wê orkestrayê re ewê Şemdîn “Lawîkê Metînî” bistra... Perdeyên wan ên deng çî bi hev re, çî bi perdeya meqamê stranê re li hevdû nekir û ez çiqas li ber “Lawîkê Metînî” ketim.

Ez baş dizanim ku her endamekî wê orkestrayê pispor û şarezayê sazjeniya sazê di dest xwe de ye, lê bi perwerdebûna zîhnîyeta muzîk û orkestraya îranî/farîsî gihîştine û pê rabûne. Lê uslûb û zîhnîyeta muzîka kurmançî û ya îranî ji hevûdu cihê ne.

Bê cudatî kirina navberê ez dixwazim ji hewramanî heta dumilî, ji lorî heta soranî li hemî cur û şaxên muzîka kurdî guhdarî bikim. Ez dixwazim muzîka dumiliya (zazayî/kirmançî) dimilî guhdarî bikim û bêjim ev muzîka kurdî ye. Ku ya Pîr Sultan Abdal an sazjeniya bektaşiyê be, ezê wan bi tirkî ji orjînalê wan guhdarî bikim an jî qet nekim. Ez dixwazim muzîka kurmançî guhdarî bikim ku ewê “başlama” Îhsanî û Mahzuni Şerîf, Ruhi Su an Rahmi Saltuk, weyaxut muzîka cumbuşa xeta Celal Güzelses be; ezê li wan bi xwe guhdarî kim, çima li kopîya kopîyayên wan ?.. Gava ku li stranên lorî û mukriyanî guhdarî dikim dixwazim ku hin reng, rûçik, neqş û gulên taybetî yên kurdî tê de bibînim, bibihîzim; ne ku xwe li şafirên Asya nave-rastê, li çolên Moxolîstanê an li meydana reqasên Azeriyan tewe-wir bikim. An di yên soranî de ku rastî muzîka hindî-erebî-rojaya-yî tîm û ji bilî zimanê wê mûyekî ji neqşên kurdî tê de nabînim, nikarim bêjim ku min li stranek kurdî guhdarî kir.

Di muzîka neteweyekî de yê girîng ne ew e ku stran bi wî zimanî an zarawayî tîye gotin, lê ew e ku meqamê wê stranê mîna destekî cil li ser canûcesedê rûhiyeta wî milletî bêqisûr rûdinê an

na. Meriv dikare gotinên bi kurmançî ji meqamên biyanî tango, ye-ye, twist heta “yaylalar! yaylalar!”ê bi kurmançî bisêwirîne, lê ew nabin muzîka kurdî; ew dibin muzîka biyanî ya bi gotinên kurdî. Tu rabî temamê stranên Celal Güzelses, Fahri Kayahan, İzzet Altunmeşe, İbrahim Tatlıses û wekî dinê bînî bikî kumancî, -dikarî bikî- lê ew nabin kurmançî. Ew dibin muzîka “tirkîya li Kurdistanê” bi gotinên kumancî û heta ji te re lazim e “Gel gidağın paytahta” û “yaylalar yaylalar” wergerîne kurmançî, bistrê û li berê bi soranî “balince-balince” bireqise, dîsa jî ew nabe muzîka kurdî. Hetanî ku ustad rabe “Gel gidağın paytahta” wergerîne kurmançî bira di dewsê de biçê li çavkaniya wî meqamî bigere û ji nûve derxe piyasê.

Li malê xwe xwedî derketin, ne teqlîdkirina teqlîda teqlîda malê xwe ye, bi lêgerîn û qefaltina malê xwe yê esasî ye ku ew jî di nav xelkê de hê heye û hê winda nebûye.

Şaşiyek ku qet nayê efûkirin jî ev e ku hin sazband an dengbêjen me straneke gelek xweş radikin li gora xwe bi gotinên guhartî (mîlîtanî/şoreşgerî) distirên. Yêrêvan vê şaşiyê nekir.

Çi bi yê gelêrî çi bi yê modernîzekirî (romanî û wekî din), çi bi yê nû-afirandî (Welatê Me Kurdistan e) Yêrêvanê ev daye me: Nîşana xweserî (orjînalî) ya muzîka kurmançî, muzîka kurmançî ya ku naveroka klam û ahenga meqam lihevkirî; ne ku naveroka gotinê xemgîn û meqam ê reqsê an berevajiyê wê meqam hezîn û gotinên wê yê şadiyê ne.

Yêrêvan bêt qelebalix û anarşiya sazên cihê; bi awakî sade, paqij, hunermendane û bi zanîn li ser berhemên meqamên devkî muzîka enstrumanî ya kurmançî sêwirand û ew wek nasnameya (huwîyet) muzîka kurmançiyê jixweber tescîl kir û raberî me û tarîxa muzîkê kir.

Bi hêvotkar, bi berhevkar, bi piçûk û mezin bi dengbêj,

sazbend û muzîkologên xwe pêkve radyoya Yêrêvanê ji muzîka enstrumanî ya kurmançî re xizmetek bêqiyas kiriye û bi vê xizmetê di muzîka kurmançî de “Ekola (école) Yêrêvanê” afirandiyê.

Ku meriv ji Kermanşahê bi rê keve û here heta di Kapîkule (deriyê sînore Tîrkiye-Bulgar) de derkeve ne ji aliyê cografayê û ne jî ji aliyê fîzyonomiyê ve cudatiyeke mezin a di navbera me û farisan, me û erebên hawir, me û tirkên de nabîne. Ku em (ereb, faris, kurd, tirk) nepeyivîn kes nizane bê em ji çî mîletî ne. Lê zimanê me û neynika rûhiyeta me ku muzîka me ya gelêrî wek du nasname bi mor û mezbete me ji yên dinê vediqetînin.

Helbet emê stranên nû bi gotinên hemdemî, bi sazên cuda û besteyên li gora cereyanên rojê biafirînin, lê îskelet divê kur-dîbingeh be; gul, neqş û tama kurdî jê bifûre. Muzîka sazjeniyê ya dîlokan (stranên govendê) bi çî sazî bêne lêxistin dilê wê ye, lê divê di aliyê sivikî û giraniyê, hunerê xwe nîşandayînê de rîtma pê avêtin û çok şikandinê de ji rîtma leyistikê ya xwezayî averê nebe. Ku bibe hingê leyistika bedew a gelêrî yan dibe mîna filmê girankişandî bi cangiranî tê leyistin an jî mîna filma sînemayê ya li ser Mustefa Kemal, bi lez xistî.

Ji Yêrêvanê hînî çêtir naskirina muzîka kurmançî bûm.

Hivdeh salên min derbas bûn ku ji welat, herwisa jî ji guhdarîkirina radyoya Yêrêvanê dûr im. Êdî dengê Aznîfa Reşîd, Sêvaza Evdo û Keremê Seyad nayên min, lê bi kira xwe hê jî Yêrêvan di mêjîyê min de olan dide û bi awakî dîtir xeber dide.

- Hişşş! Niha Yêrêvan xeber dide.

(*Nûdem*, hejmar 31, Stockholm-1999)

QEDERA KURMANCEÎ YÊ HETANÎ SALA 2100 Î

Ewê kurmancî^(*) hetanî serê sala 2100 î bimîne an ne ? Dilê min çiqas dixwaze ku bikarim bêjim “erê ewê hetanî sala 2100 î û heta heta bi hindikî hetanî sala 3000 î jî hebe û wekî zimane-kî zindî bijî.” Bi xwestinê dilê min dixwaze, lê bi gotinê wê ev gotin ji gotineke “sloganî”ya pûç a vala pêve tu manekê îfade neke.

Ziman bi saya gelê bi wî zimanî diaxife dijî. Gava xelkeki bi zimane-kî nepeyive, ew ziman dimire. Kurmancî jî bi wê êşê ketiye û ber bi rojên xwe yên dawî ve diçe. Kurd êdî naxwazin bi kurmancî, bi wî zimanê bavûkalan bi zarûkên xwe re biaxifin. Bavûkal gundî bûn, koçer bûn, lê zarûkên wan ewê “bajarî” bin, “rojawayî” bin û ewê bi “zimanê bajarvaniyê” (!) bipeyivin.

Li welat gund vala bûne, gundî ber bi bajarên ve çûne. Bajar vala bûne ber bi rojavayê Tirkiyê ve koç kirine. Çi bigire ji nîvî bêtirê kurdan li rojavayê Tirkiyê qelibîne. Yê mayî hê jî di binê sawa kabûsa “korucu-tîm-hîzbullah” û w.d de ne. Kal û pîr ne tê de yê mayî çiqas bi kurmancî bi hevdû re û bi zarûkan re dipeyivin, bi tenê Xwedê pê dizane. Yên ku koçî rojavayê Tirkiyê kirine ji wan ên cegerperitî ne tê de çendên mayî bi kurmancî bi hev re û bi zarûkên xwe re diaxifin, ew jî karê zanîna Xwedê ye.

Rewşa malxopan a li welat bi vî awayî ye. Rewşa kurmancî ya derva ango ya Ewropayê ji ya welat pir ne çêtir e.

Me digot qey ku azadî hebe ango zordestiya li ser ziman rabe ewê kurd wekî mirovên tî ku diçin ser avê wê wisa ber bi

ziman, edebiyat û hêjayiyên xwe yên neteweyî ve bi hesret bibe-
zin, li wan xwedî derkevin. Na mixabin ev hezir wisa derneket.

Tevî ku li Ewropayê zordestiya li ser zimanê kurdî tune ye
heta serbestiya hînbûn û axaftina bi zimanê xwe heye, dîsa jî
kurd naxwazin zimanê xwe hîn bibin, hînî zarûkên xwe bikin,
di dewsa tirkî de zimanê xwe bikin zimanê sereke yê malê,
weşanê û navxwe.

Zarûkên kurdan ên li Ewropayê hatine dinyayê û diçine
xwendegehan ji xwe ew bi zimanê wî welatî bi hev re didin û
distînin, pê re dêûbavên xwe jî ber pê dikişînin.

Riwalên me yên ku li welat hatine dinyayê, li wê derê hînî
kurmancî bûne û di pey de hatine Ewropayê bi qasî ku pîrsa
hevûdu bikin, bersîva yekî bidin bi kurmancî dizanin. Lê bi
guman e ku ewê siberoj bikarin zarûkên xwe hînî kurmancî
bikin an bi wan re bi kurmancî bipeyivin.

Zimanekî gava ku bi dirêjahiya nîşkekî du nîş neyê peyi-
vîn tê jibîrkirin û dimire. Em wek kurd ne cihû ne ku her hefte
herin sînagogê Peymana Berê (Ehdî Etîq) bi ibrî bixwînin û pê
ayîn û limêja xwe bikin. Em ne mesîhî ne ku her yekşem herin
dêra xwe ya arizî û Peymana Nû (Ehdî Cedîd) bi zimanê xwe
bixwînin, pê kurmanciya xwe di bîra xwe de bihêlin. Wek kurd
ji sedî not, not û pênc bi nav be jî em bisilman in; şerîet jî rê
nade ku Qur'an bi zimanekî dinê wek zimanê ayînî bê xwendin.
Ewê çi bibe ? Ewê ev ziman bê jibîrkirin.

Piraniya kadroyên siyasîyên kurd ku navê wan bi kurd-
perwerî derketine, heq an neheq ji ber vê jî eva 30-35 sal in ku
tehde dîtine û azîrîne, li mala xwe bi kurmancî napeyivin, zarû-
kên wan bi kurmancî an qet nizanin an jî bi qasî “çavan î ? baş
î ? spas tü çavan î” dizanin.

Li Ewropayê mamosteyên kurdî ku ew bi xwe jî ji elîta siyasî ne ji dewlet an belediyên mehmizî distînin û li ser navê şoreşgeriya kurdîtiyê mamostatiya kurdî dikin; lêbelê li mala xwe bi kurmançî naaxifin, zarûkên xwe hînfî kurmançî nakin. Heta hin ji wan li ser navê kurmançî dersê bi tirkî didin.

Nivîskarên kurd ku misêwa li ser kurd û kurdîtiyê pirtûk dinivîstînin çima li mala xwe, bi zarûk û xanimên xwe re bi kurmançî napeyivin, kurmançiyê nakin zimanê xwe yê sereke, ez lê şaş dimînim.

Nizanim ku çî hîkmetê Xwedê ye merikê Yozgatî, Konyayî, Fasî, Cezayîrî ku bi xanimêk Ewropî re dizewice bi çî qabiliyetê şarpe an kitan dide serê wê, navê wê yî Carin dike Kerîme an Kerîma, zimanê xwe pê dide hînkirin û zarûkên wê bi zimanê bavûkalên xwe mîna bilbil diaxife. Lê şoreşger û mîlîtanên me yên ku ji bona xatirê Kurdistanê dev ji meqam, îstîqbal, menfeet û welatê berdan çî hîkmet e ku nikarin vî karê bingehîn ê kurdperweriyê yanî kurmançiyê di mala xwe de bi cih bikin ?

Ez bi rastî meraq dikim çawa jinika parlamentera alman wekî ku hê nû ji beriya Mêrdînê hatibe; bêartilîn, bêşaşbûn bi seetan bi kurmacî bikare bipeyive, lêbelê xanimên siyasî yên serwerên kurdan nikaribin ? Û ez lê şaş dimînim çawa ew mîlîtanê me ku li serê çiyê maye, di neqeban de ji bona xatirê Kurdistanê li hemberî tabûran di ber xwe daye, sînga xwe ji ber guleyan nedaye alî, çawa dibe ku bi qasî dirêjahiya 5 deqîqeyan nikare bi kurmançî bipeyive: Ne ew kurmançî xwîn û gîyanê Kurdistanê ye, bê wê Kurdistan perçeaxeke bê mane ye.

Ez wek kurdekî sade herçend ji mala xwe bixwazim da bi kurmançî bipeyivin; lê şênîyên malê ewê çav bidin yên elîtên siyasî/çandeyî yên civaka me. Zarûkên min ewê çav bidin li zarûkên serok û endamên komên rêvebir/gîştî/pêşewir/çavdêr/redak-

siyon/defterî siyasî yên partî/komele/rêxistin/sazî û dezgehên ku li ser navê kurdîti an Kurdistanê damezrîne. Ku çav nedin wan jî ewê gotina min a “bi kurmancî biaxifin” li nik wan mîna awakî pilewil an zordestîkirinê bê fêhm kirin ku ewê bi berevajî tesîr bike. Vêca ku jin û zarûkên van kesên li jorê binavkirî bi kurmancî bipeyivin û kurmanciyê ji xwe re bikin zimanê sereke, ji hemberiyê be jî ferzîmîsal ewê xanima min û zarûkên min bê gotin û tembehiya min bireqîninê bi kurmancî bipeyivin, bi nevî û neviçirkên min jî bidin hînkirin.

Kurdistan perçaxeke diyar û nediyar e. Nedyar e, ji ber ku li dorûberê wê tixûbek xwezayî mîna derya an rêzeçiyayên Hîmalayê tune. Diyar e, ji ber perçaxeka yekperçe ye ku xelkê lê bi kurmancî dipeyivin. Lê her devera ku lê kurmancî tê axaftin ne Kurdistan e: Xorasan ne Kurdistan e, Lubnan ne Kurdistan e, Qafqas û Transqafqas ne Kurdistan in.

Kurd kî ne ? Kurd ew kes in ku bi hevûdu re bi kurmancî dipeyivin. Ji taybetiya ziman pêve ji aliyê reng û xetên fîzyonomîk ve tu cihêtiya wan û cîranên wan ji hevûdu tune. Ji rejîsorek re ji bona filmekê hin tîp lazim bin, dikare bi hêsantî here Mêrgahmeda Diyarbekirê; dirûvpêketiyên Demirel, Ecevit, Rafsancanî, Seddam, Hafîz Esed, Koçeryan, Stalin, Melîk Fehd û heta tîpên moxolî bi carekê di nava çaryekê de bibîne. Ku meriv ji Hekarê bi rê keve û here heta di “Kapikule”ya deriyê li tixûbê Tirkiye û Bilgar de derkeve bi tenê ku meriv bi kurmancî nepeyive kes nizane bê meriv kurd e an tirk e. Ji ber vê qasê heta ku meriv xwe li kurdîtiyê daneyne li Tirkiyê her paye û cî bi nîsbeta qabiliyeta meriv li ber meriv vekirî ye. Nîşana cudatîyê ya kurdan ji gelên cîran ew e ku zimanê wan î axaftinê ye. Ew ziman ango kurmancî xwîna wî laşî ye ku jê re kurd tê gotin. Ku kurmancî nemîne, bibire ew laş jî namîne ku bimîne jî ewê wekî

rawirekî nêçîrê ku bi sole an tişteki dîtir tijekirî yê xemlê bimîne.

Ku kurmançî nemîne ewê kurd jî nemînin, ku kurd nemînin dê Kurdistan jî nemîne an gotina “Kurdistan”ê tişteki ifade neke. Kilîkya, Kapadokya, Pontus, Karya îro ji bona me çî ifade bikin dê Kurdistan jî ji bona nîfşên piştî sed salî wê ifade bike.

Dewleta Tirkiyê berê bi riya asîmilasyona resmî; xwendegh, polîs-cendirme û cezakinê dixwest kurdan asîmîle bike. Parek bi ser ketibe jî sê par bi ser neketiye. Lê ew sê parên mayî ku dewlet bi ser neket qismen bi riya multîmedyayê û qismen bi riya “xebatên me yên siyasi” çû serî. Di bin navê “siyasi eğitim çalışması” û bi weşanên xwe yên bi tirkî me tirkiyê bire xist hetanî şikeftên Kurdistanê yên rojnedîtî jî. Ew kurdên ku li eskeriyê di bin darê zora giran de hînfî tirkî nedibûn vêca li ber derê xwe û bi dilê xwe bi saya “siyasi propaganda çalışması”ya arkadaş/yoldaş/hevrê û hevalan xweş û xweş hîn bûn. Di vê de şabaş ji Xwedê re em bi ser ketin û Cumhûriyeta Tirkiyê deyndarê me yê perûkirin û spasê ye.

Bi riya satelîtan televîzyon ne ku ketiye her gundî lê ketiye her zivingî û ne tu kes lê melekê mewtê jî nikare bibe maniê li nihêrtina “Aşkın Dağlarda Gezer”, “Fırat”, “İzzet-î İkrâm”. Çiqas navê kurdî bixwazî tê de ewçend hene. Tê de baneşanên mîna “ax lawo! Li min! Kuro! Keçe!, hey lolo!” bi dev re mişt in. Muzîka stranên kurdî wek muzîka fon hatiye bikaranîn. Bêwestiyan, bêacizbûn an dixewreçûn, bêy ku du seet li ser hev bajo; li berê rûnê, bê haylêbûn tirkî hîn bibe. Ji xwe di wê seetê de gava tu televîzyonên nîvkurdî jî vekî; ew jî an bi erebî an bi farisî an bi suryanî an bi tirkî ne. Ê li gora ku kurdên ji Tirkiyê bi erebî, farisî û suryanî nizanin, dimîne hilibijartina li ser tirkî: De haydê “Mahsoo lawo!”

Bi riya multîmedyayê ku em nikarin bergeh lê bigirin asîmîlasyon bi beza lehiyê pêşve diçe. Multîmedyaya li ser navê Kurdistanê an bi weşanên xwe yên ne bi kurmancî an jî bi yên nepedagojîk, nebalkêş û monoton; temaşevanan ber bi lehiya vê asîmîlasyonê ve dajo.

Ê çare çi ye ?

Ev êş bi xwe curek ji cureyên kanserê ye.

Dermanê vê êşê jî çi bigire ne mumkin e weyaxud gelek zor e. Çare ev e ku ji elîtên herî berjor ji “genel başkan” û “genel sekreter”ên partiyên siyasî; çi legal, çi nîv-legal û çi îlegal dest pê bike û bi rêzê hemî xwenda, mamosta, nivîskar, siyasetger û endamên di komele/partî/sazî/weqîf/enstîtusyon/medya/çapemenî yên di her qor û gehînekê de, divê pêşî ji mala xwe ji jin an mêr û zarûkên xwe dest pê bike, kurmancî hînî wan bike, kurmanciyê bike zimanê sereke yê devkî û nivîskî, bi her kurdî re di her platformê de bi kurmancî, bi kurmanciyê kubar a dilbij biaxife. Bi vî awayî belkî kurdên sade çav bidin pêşkêşên xwe yên siyasî û civakî, pêre jî zimanek û mîletek ji windabûnê bifilite.

Xocê Menşûr dibêje: Xwedê dikare vî girî bi ba ke, bi ka ke, bîne di cihê serê kerê min da ke, lê tiştê ku nekiriye, nake. Çareya ku ez didim pêş jî ditirsim ji wê nebûyîbê be.

Hêvî Xwedê ku texmîna min rast dernekeve, kurmancî bi dirêjahiya heyîna mirovahiyê bijî.

(*Nûdem*, hejmar 35, Stockholm-2000)

^(*) *kurmancî*: zimanê kurdî, hemû zaravayên kurdî

ÇEND ŞAŞIYÊN KU DI KURMANCÎ DE TÊN BIKARANÎN

Tu tişt li dilê min xweştir nayê bi qasî ku gava gencên xwenda û bajarî bi hev re bi kurmancîke bedew dipeyivin, distrên an dinivisînin. Ji ber ku bi hezra min ew kurmanciya wan a bedew dê di dilê hin kesên hawirdorê de bibe nixafa geşkirina sotikê nîvtemirî yê daxwaziya bi kurmancî peyivînê. Ew sotikê nîvtemirî dê geş bibe û mîna kûre an hêtûna hesinkerana jiyaneke germ û geş vejîne. An jî bi vê germî û geşahiyê ewê xwîna di canê kurdewariyê de teze bibe, nû bibe, zêdetir bibe.

Helbet li gund xatiya Sarê û xalê Evdo jî bi kurmancî diaxifin; axaftina wan tişteki mekanîk an xwezayî yanî tişteki nehilbijartî ye. Ebû Ewko jî carcarina bi kurmancî dipeyive, lê gava ku ew bi kurmancî dipeyive an bi çêr (sixêl) û heqaret dipeyive ku bîzê meriv ji bihîstina kurmanciya wî tê an jî mîna ku hovekî hê nû ji kuna xwe ya di qelîşteken navsera çiyê derketibe; bi bênezaket û marîfet diaxife ku meriv jê dibizde û naxwaze li kurmanciya wî guhdarî bike. Bi kurmanciya wî, ji meriv re wisa çêdibe ku kurmancî zimanê hov û nekedîkiriyan e. Lê gava ev Ebû Ewko bi tirkî dipeyive zerafeta “Beyoğlu” û nezaketa “Bâb-1 âli” ji axaftina wî pêl bi pêl difûre.

Kurmanciya bedew û kubar ku bi taybetî ji aliyê gencên bajarî û xwenda ve bê axaftin wê bibe sedemê vejînê, ev vejîn jî wê bibe sedemê afirandina çandeya kurmancî ya nûjen a pêşerojê.

Kurmanciya nûjen, ew kurmancî ye ku bi bêjezaniya (zen-gîniya bêjeyan/vocabulaire) xwe bikare bersîva pêwistiyên jiyane ji her alî ve bide. Kurmanciya nûjen ew kurmancî ye ku kubar e, di danûstandinên di navbera mirovan de germayî, hezkirin, rêzgirtinê dihene û geş dike. Ev ew çend ne zor e jî. Carina ku li K-TV (Televizyona Kurdistan) guhdarî dikim, bi taybetî çend keçxanimên Behdînî hene ku gava bi kurmancî diaxifin ahenga muzîka axaftina wan ji min re ji armoniya axaftina farisî, fransîzî û ûrisî nermtir, muzîkaltir û şîrîntir tê. Ez baş pê dizanim ku awayê axaftina wan ne teqlîd e, ne çêkirî ye, lê jixweber e.

Teqlîd an kopiya kirin jehriya kuştina zimanekî ye. Her ziman xwedî mantiqêke (logique) taybetî ye. Mantiqa kurmancî û ya tirkî ji hev cihê ne. Mantiqa kurmancî û ya farisî jî ji hev cuda ne. Helbet ya fransîzî û ya îngîlîzî jî li hev nanihêrin. Bi daxwaziya ku emê kurmanciya xwe bikin zimanekî nûjen an şoreşger û bi mantiqa zimanên dinê an bi kopiyakirina ji wan bêje an biwêjan çêkin, pê em qencyê li zimanê xwe nakin, berevajiyê vê xerabiyê pê dikin. Bi vê kirê em di ziman de anarşîzmeke wisa çêdikin ku kes nikare êdî wê ji hevûdu derêxîne.

Ji sedî sed bala we jî kişandiyê: Anonsek dibêje ” Bi zimanê dayikê bîxwîne û bide xwendin!” Ji “zimanê dayikê” li vê derê mebesta anonsê “kurmancî” ye. Bila ne kurmancî be, dixwazî bila japonî be, piştî ku anons bi kurmancî ye ferq nake. Ev gotin yanî “zimanê dayikê” tercumeya “anadili” ya tirkî ye. Bi vê mane û mebestê di kurmancî de biwêjek mîna “zimanê dayikê” tune, lê gotina “zimanê bavûkalan” heye. Wekî dinê tercumeyeke şaş e.

Maneya “ana” ya tirkî bi tenê ne “da” an “dê” ya kurmancî ye; di tirkî de bi maneya bingeh, bingehîn, hîm (xîm), sereke, esîl de ye jî.

“**Anadil**” ew ziman e ku hin zimanê dîtir jê derçûne yanî maka hin an çend zimanan e. Meriv belkî jê re bikaribe bêje **makeziman**. Herwekî makezimanê farisî û kurdî îranî ye, lê meriv nikare bêje “makezimanê min” ferz kim kurmancî an tirkî ye.

“**Anadili**” kurmanciya tarîfa wê ya bi tirkî ev e: Ew zimanê ku meriv gava zarûk e ji diya xwe weyaxud ji kesên malê hîn dibe. Yanî gava ku meriv bi tirkî dibêje “Benim anadilim Türkçedir.” Ne bi wê maneya kurmancî ye ku zimanê “diya” min tirkî ye. Zimanê diya wî kesî dibe ku rûmî / ermenî / erebî / almanî be lê “anadili”yê wî kesî yanî zimanê wî yê sereke an bingehîn tirkî be. Zimanê ji sedî heştê û pênc belkî jî bêtir ên diyên padîşahên osmaniyan ne bi tirkî bûn, lê “anadili”yê padîşahan bi xwe tirkî (osmanî) bû.

“Anadili” ya tirkî bi kurmancî ne “zimanê dayikê”, lê bi maneya “zimanê sereke” an “zimanê bingehîn”e. Kurmancî ne “zimanê dayikê” ye lê bi kurmanciya bi kurmancî “zimanê bavûkalan” e.

Herwisa tu têkiliya “**anakara**”, “**anamal**”, “**anayasa**”, “**anayol**” û “**anayurt**” bi maneya “ana”ya tirkî ya bi maneya dêyî-tî an maketiyê re tune. “Ana”yên van jî di maneya sereke, bingehîn, destpêkî de ne (binêrin li jênotan).

Mentiqa ziman bitenê ne di wergerandinan de, lê herwisa di bikaranîna ziman bi xwe de jî pêwist e. Bêjeya “welat” nêr e: Meriv dibêje “welatê min!” ne ku “welata min!”. Gava ku nêr be nabe bibe dayika meriv. Di erebî de “weten” nêr e an mê ye pê nizanim. Di soranî/mukriyanî û farisî de herwekî tirkî nêrîtî û mêyîtî tune ne. Dibe ku şair an dengbêjên bi wan ziman û zaravayan ji welat/weten an niştîman re bêjin dayo, dayika min! Lê welat/weten/niştîman di kurmancî de nêr e û nabe dê, nabe bav

jî. Di kurmancî de ew ne dê ye û ne bav e, lê mal û milk e: Welatê (mal û milkê) bavûkalan e.

Hin bêje tên bikaranîn ku bi rastî ji min re pir ecêb tên:

Şopandin: Di kurmancî de şop ajotin an şopa yekî/tiştêkî birin, pey şopa tiştêkî ketin hene lê şopandin tune. Şop an rêç di maneya “iz” a tirkî de ye. Xuyan e ku “şopandin”ê bi maneya “izlemek” a tirkî ya bi maneya “takip etmek, gözlemlemek, intizar etmek” ê de bi kar tînin. Kurmanciya “takip etmek, gözlemlemek, intizar etmek” li pey bûyin, guh lê bûn, hay jê hebûn, payin (bipê), li bendê mayin in. Heryek ji van li gora rewşa taybetî tê bikar anîn. Di maneya “izinde olmak / izinde gitmek” “di rêçika wî de bûyîn” an jî “dayîna ser şopa wî” ye.

Ji kurmanciya jêrîn an soranî bêjeya “**netewe**” an “**netewa**” hatiye nav kurmanciya me, bi xêr hatiye. Lê hineka ev bêje mîna teyrê Xocê Menşûr bi meqesê qusandiye û kiriye “netew” û berdaye piyasê: “Zimanê netewî”, “kombûna netewî” û h.w.d ... Hin kesên soran jî xuyan e sifî ji bona ku kurmanc têbigihîjin gava bi kurmancan re diaxifin dibêjin “netewî”, nabêjin “neteweyî”. Di kurmancî de “netewî” di maneya “netewiyayî”, “neçemiyayî” de ye. Tewandina “neteweyî” wek “netewî” şaş e (*bnr.* {4}, {5}). Çawa ku mase nabe “masî” lê dibe maseyî, sere nabe serî lê dibe sereyî, qible ne qîblî lê qîbleyî, pere nabe perî lê dibe pereyî herwisa netewe jî nabe netewî lê dibe neteweyî. Wekî dinê “neteweyê min” an “netewayê min” e, ne ku “netewayê min” an “netewa min”. Ji ber ku netewe herwekî bêjeya millet di kurmancî de nêr e.

Lêkera **berdewam** bi lêkera alîkar a bûnê re tê kişandin, **dewam** an **dom** jî bi lêkara “kirin”ê re. Berdewam e û dewam an dom dike hevmaneyê hev in ku tirkîya wan “devam ediyor, sürüyor” e. “Dajo” ya kurmancî jî eynî tişt e. Lê *berdewam dike* şaş e.

“**Li dara xistin**” di dewsa destpêkirinê de pir tê bikaranîn. **Li dara xistin** destpêkirina hîm an bingeh danîna serê pêşî ye. Gorê li dara xistin; çavîkên rêza pêşîn ên gorê bi darikan (çîşikan) vekirin e. Tevnê li dara xistin gacikên tevnê bi darê dezgeh ve vekirin e. Dawetê li dara xistin bi vegirtina darika zavê ilamdayina destpêka dawetê ye. Lê civîn, limêj, mewlûd, ders, xutbe, konferans dest pê dikin, li dara nakevin.

“**Jîn dibe**” (?!) Cara pêşî min ev di filma “Mem û Zîn”ê de bihîst. Bêjeya “jîn” bi xwe hem lêker e û hem jî navdêr e: Ew jî (o yaşadı), ewê bijî (o yaşayacak), bijî (yaşa). Lê “jîn bibe” gelo çi ye ? Vejîn ji nûve jîn/jiyin e (canlanmak, hayat bulmak/ihya olmak, *fr.*; revivre).

“**Dîn û ol**”, ez nizanim gelo ji bona ku êzidî xwe ji bisilmanan veqetînin ji riya xwe re gotin “yol” weyaxud selçûkî û osmanî ji bona ku êzidîtîyê ji mefhûma dîn veqetînin ji êzidîtîyê re gotin “yol” û ev bû “ol” ta ku mîna contirkan “conkurd”ên me jî bêserûçav rahiştin vê gotinê ?

Bêjeya “dîn” hê ji zemanê pehlewiyan bi vê de di nav çande û ferhenga îranî de heye. Yanî bêjeya dîn berî îslamiyetê di nav me de hebiye {6}. Di kurmancî de tu gotineke kurmancî bi dengê “o” dest pê nake. Bêjeyên mîna osta û ordeku hene ew jî awayên guhartî yên hosta/westa û werdek in Bi dîtina min bêjeya “ol” ji sedîsed “yol”a tirkî ye.

Hostakî di mijara stranê de ji dengbêjekî dipirse: Strana ku tê ji me re niha bêjî **gelêrî** ye an **folklorîk** e ?

Min **malperê** fam nekir ku di dewsa “homepage”a îngîlîzî û “hemsida”ya swêdî de tê bikaranîn, bi rastî ji sedî sed wergerandina ji wan e. Çi “homepage” û çi “hemsida” bi kurmancî tê maneya “rûpela malê”. Vêca meriv ku bixwaze herdû bêjeyan bigihîne hev û bike bêjeyeke hevedudanî li gora bêjesaziya kur-

mancî divê bibe “rûpelmal” mîna dara sêvê; darsêv, kurê metê; kurmet, dota mam; dotmam û w.d. Lê ku bi mal dest pê bike wekî malxezûran; mala xezûranan, malwêran; (kesê) mala (wî) wêran e an bibe. Wekî dinê **per** bi maneya bask (tirkî: kanat), pel/pelk/belk/berg jî bi maneya “werek”a erebî, “yaprak”a tirkî, “sheet of paper”a îngilîzî û “ark/pappersark”a swêdî ye. **Perê** mêşê, **pelê** cixarê / pelê darê û **rûpela** defterê sê mefhûmên cuda ne.

Şaşiyeke dinê jî heye ku dibêjin “li Botanê çî heye, ew ji Xerzanê tê, ez çübûm Silîvanê” û w.d Meriv Behdînî an Badînî, Botî, Milî, Serhedî, Silîvî, Xerzî an Zîlî ye; lê ji Behdînan, Botan, Milan, Serhedê, Silîvan Xerzan an ji Zîlan tê. Di axaftina rojane de (n) dikeve û hingê mîna Behdîna, Bota, Mila, Silîva, Xerza û Zîla tê bilêvkirin. Serhed navê navçeke cografîk e ne pîrejimar e, lê yên dinê navên federasyon an konfederasyonên eşîrên kurdan ên tarîxî ne ku ew bi xwe bi riya pîrejimariyê carek hatine tewandin û nabe carek dîtir jî bêne tewandin. Xelk bi xwe jî ew carekî dinê natewînin. Yên ku dikin jî ji “teleba/xwendayan” hîn bûne û ji wan we ye ku wisa bêjin ewê jî bibin tabîê îmamê kurmanciya modern a şoreşger.

Bi kurmancî peyvîn, xwendin û nivîsîn ji bona me hem wezîfeya tarîxî ye û hem jî serbilindiya me ya neteweyî ye, lê gava em vê erkê pêk tînin divê li pey rêçîka mentîqa kurmancî tevbigerin û wisa pê bavêjin.

ÇEND BÊJEYÊN BI TIRKÎ KU JI “ANA” ZÊDE BÛNE:

Ana {1}: Çocuğu olan kadın, temel, esas.

(Fr.{2}1.Mère; 2.[mec.]Source, principale; 3. Cause, origine, İng.{3} 1.mother, 3. main part; principle, main, fundamental, basic. 4. capital, stock.)

Anadil: Başka diller türetmiş olan dil. (Fr. Langue matrice, İng. a language from which other languages are derived.)

Anadili: İnsanın çocukken anasından veya evindekilerden öğrendiği dil. (Fr. La langue du pays où l'on né, langue maternelle, İng. mother tongue)

Anakara: Kıta. (Fr. Continent, İng. continent)

Anamal: Sermaye. (Fr. Capital, İng. capital)

Anayasa: ...temel yasa. (Fr. Constitution, İng. costitution)

Anayol: Küçük yolların kendisine açılan en büyük yol. (Fr. [ana cadde] rue principale, İng. main road)

Anayurt: İlkyurt.

(*Nüdem*, hejmar 36, Stockholm-2000)

⁽¹⁾ *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları – Sayı: 293, Türk Tarih Kurumu Basımevi-Ankara,1969

⁽²⁾ *Büyük Türkçe-Fransızca Sözlük*, Pars Tuğlacı, İkinci Baskı 1974, İnkilâp ve Aka Kitabevleri, İst.

⁽³⁾ *Redhouse Türkçe-İngilizce Sözlük*, onyedinci baskı 1998, SEV Matbaacılık ve yayıncılık A.ş., İst.

⁽⁴⁾ *Ferhengî Kurdi-Rûsî (Sorani)*, Q.Kurdo-Z.Yüsif, Mosko-1983.

⁽⁵⁾ *Ferhengî Kurdi-Farîsî*, Hejar, Soroush Press, Teheran-1991.

⁽⁶⁾ *Pahlavi Dictionary*, D.N.McKenzie, London Oxford University Press-1971.

EDİB KARAHAN **“AX ! GUL IM, GUL IM...”**

“Alli turnam bizim ele varırsan / Şeker söyle, kaymak söyle, bal söyle / Eğer bizi sual eden olursa / Boynu bükük, kolu kırık, yar söyle / Ah gülüm, gülüm... / Büküldü belim / Kırıldı kolum / Turnalar hey ! ”

Gava ev strana tirkiya gelêrî ya kevin, ya ji hesreta li xurbetê dagirtî tê stran brûskek ji kûrahiya bîra min li ser canê min bi şîrqînî pejelên xwe vedijene: Pêlên elektromanyetîka wê brûskê ez hiltînim dibim nav “qawîşa” girtîgeha leşkerî ya Seyrantepeyê ya ser pozê hafa Dîcleyê, ya bîst û pênc sal berê.

Lê gujîn û gurrahiya keserê ya di nakarata wê ya “Ah! Gülüm, gülüm... kız gülüm, gülüm! Yar gülüm, gülüm! de min noqî binê bîra bîranînan dike ku li wê derê rû bi rû rastî rehmetiyê “Edip Karahan” û dengê wî yê dawidî, gurr û xemjen dibim.

Bê guman “ah gülüm, gülüm..”a tirkî bi bilêvkirina Edîb abê dibû “ax! gul im, gul im...”eke wisa ku ji binê nixafa cegera wî ya gamêşî dihat û di xençereya gewriyê de wek babelîska kovanê li hev digeriya û bi awayekî hinavsofî derdiket.

Me hevdû cara pêşî ku ez ne şaş bim di bihara 1970 yî de li Diyarbekirê li qehwexana “Çamlıca”yê dît. Bawer dikim di pey avêtina ser gund û bajarên navçeyê ya ji aliyê qomandoyên cendirmeyan bû. Ji Anqerê, Îstembolê çend xwendekar hatibûn. Ji bajarên hawir pêşkêşên komên welatparêz ji bona civînê hatibûn. Hevalekî, min û Edîb abê bi hevûdu da nasîn. Min ew xiya-

bî ji rojnameya “*Dicle-Fırat*” û ji doza 23 yan dinasî. Piştî çend gotinên destpêkê wî li bajarê min û di pey de jî li eşîra min pirsî, min navê eşîra xwe jê re got. Bi awayê xwe yê taybetî got: “Hela ! hela ! em pismamê hevdû ne. Pêşiyên min jî pismamên Silêman axa ne, lê di wextê de rabûne hatine Dêrikê”. Silêman axa hevsalê bavê kalê (yaxud kalê bavê) min bû, ew herdû di çend bavan de digihîjin hevdû bêguman ez pê nizanîm. Ji ber ku di pey wê carê de me tucar behsa eşîr û eşîrtiyê ji hev re nekiriye, nizanîm ka bera çendî rast an çendî dilxweşkirin bû ku em herdû ji eşîrekê bûn. Wek gelek kesan, ji xwe ji bona me herduyan jî Kurdistanparêzî û kurdperwerî ya herî girîng bû. Ji “Çamlıca”yê em rabûn çûn aşxana Asim ku hingê li hala sebze ya li Deriyê Ûrfayê bû, civîn li wê derê çêbû û heta derengê şevê ajot.

Di pey de jî carekê em li Farqînê rastî hev hatibûn: Ew û Doğan Kılıç bi hev re bûn û diçûn Batmanê. Li ser Mele Mustefa Barzanî û rewşa şerê wî mîna meqale belavokek nivisandibû, bi daktîloyê ji hev zêde kiribû û li welatparêzên kurd di bin dest de belav dikir. Ji ber ku hingê rojname an kovarek ku biwêre nivîsarên wî bê destlêdan çap bike peyda nedibû, wî jî bi vî awayî dîtînen xwe radigihand xelkê. Ev car, li girtîgehê êdî dibû cara sîsiyan, lê ya herî dirêj.

Dotira rojê ya revandina konsolosê Îsraîlê Efraîm Elrom bû: Serê sibê giregirên TÎP û DDKO'ya Diyarbekirê anîn girtîgeha leşkerî ya “sıkıyönetim”ê. Edîb abê jî di nav wan de bû û tevî çentê xwe yanî bi hazirî hatibû. Anqere-Îstembol li ku, Elrom û Diyarbekir li ku ? “Hukmê qereqûşî” ya dewleta Alî Osman bû. Ez ji 5ê Gulanê vê de li wê bûm. Niyazî osta û grûbên ji DDKO yên Silîva, Erxeniyê û grûba xwendekarên tibê heftekî berî min hatibûn girtin.

Serê pêşiyê girtîgeha me li wargeha “Topçu taburu” bû.

Gava meriv ji Deriyê Çiyê diçû ber bi Seyrantepê ve, li milê çepê piştî mizgefta leşkerî birceke nizim a embara avê û aşpêjxana leşkeriyê hebû, hema li seriya wê girtîgeha me bû. Cihekî fereh û çaralî vekiribû. Li rast û çep du avahiyên dirêj ên ber bi bakur-başûr ve dirêj û yek qatî hebûn. Di navbera herdu avahiyan de meydaneke fereh çî bigire bi qasî meydana fûtbolê ya nîzamî fereh hebû ku di bihnvedanan de ew ciyê piyasê, voleybolê û tevgerên h.w.d bû. Serê pêşiyê yê di pey revandina Elrom; ji Qers, Erzerom, Ezirgan, El'ezîz, Meletî û Mereşê otobus bi otobus meriv dianîn. Lê piştî heftekê du hefteyan hêdî hêdî sivikahî çêbû, bi tenê têkildarên DDKO û kurdparêziyê dan hiştin. Piştî vê sivikahiyê li aliyekî vê meydanê ciyê voleybolê hate saz kirin; heroj piştî nîvro kom bi kom li wê derê bi voleybolê dileyistin ku ji wan leyistvanekî dayîmî Edîb abê bû. Şortekî sorê gevez li xwe dikir, tevî wî gewdê xwe yê gir ê qirase bi enerjîyê ke gurr û bi cansivikî dileyist. Bi gewde û dirûvpêxistinî, ji xwe dirûvê wan palewanên “Kırkpınar”ê pê diket.

Di serê pêşiyê de li Diyarbekirê çî bigire îşkenceya fizîkî ya wekî lédanê filan tune bû. Lê ji Xelef pêve: Xelef an jî Xelefê berber ji hêla Mêrdînê an ji Dêrik an ji Qiziltepê ji wan deveran ji derekê bû. Bi lédana di feleqeyê Xelef osta bêlezet kiribûn, ew çend ku nikaribû rabe ser lingê xwe raweste. Heroj carek du car “ta'dad” (hejmartin) hebû ku derketina me ya serî-hejmartinê mecbûrî bû. Vêca diva ku Xelef jî bihata “ta'dad”ê. Emir emir e, Xelef jî anîn, lê Xelef di palasekê de anîn: Çend hevalên zexim ew danîn ser palasekê, bi koşe û kevîyên wê girtin, bi wî awayî Xelef anîn, di dawîya qorê de li ser palasê ew jî tevî merasima hejmartinê bû. Lê mudirê me “komutan” bi vî awayî ne razî bû, jê xwest ku Xelef rabe piya, bikeve qorê û “esas duruş”ê. Hevalên li nêzîkê Xelef xwestin bi mudir bidin fehmkirin ku Xelef ji ber

binlingên xwe yên teqandî û parsiyên xwe yên şikandî nikare rabe ser xwe. Mudir nexwest ji kira xwe dakeve, got “na! Emir dikim ewê rabe!” Edîb abê hêrs bû û ji nişkave bi dengêkî bilind qîriya, got: “Ûç Xelef ! Ûç ! Qumandan beg emrediyor!” Pişkîn bi me giştan ket, em gişt kenîn, cidiyet û resmîyeta merasimê nema, “komutan”ê hêsîr em hêlan û çû. Lêbelê “Ûç! Xelef ûç”a Edîb abê hê jî di guhê me de olan dide.

Payizê cihê me guhaztin, em ji wargeha tabûra topçiyar birin aliyê hafa Dîcleyê. Wek bergê ew der piçûktir bû; ji bajêr averê bû, ji aliyê ewlehiyê ve jî ji bona îdara girtîgehê bi ewletir bû. Li wê derê sazimana xwe-hêvotinî jî hate sazîkirin: Çawa li girtîgehên din “koğuş kîdemlisi” hene, li wê derê jî îdareya girtîgehê ya leşkerî ji me xwest ku em di nava xwe de berpirsiyarekî hîlbijêrin, da ew danûstana navbera me û îdarê bi rê ve bibe. Ji aliyê me ve Edîb abê hate pêşniyar kirin û pejirandin. Wî jî Mustefa Düşünekli kir cîgir û Akîf jî kir berdestkê xwe û ji vê re jî got “başkanlık divanı”. Gotina wî ya “başkanlık divanı” di serî de tiştekî mîna henek, mîna tinazpêkirin bû, lê ev tabîr ji aliyê îdara girtîgehê ya leşkerî ve hat qebûlîkirin, wekî ku termeke huqûqî ya ji “iç hizmetler kanunu” be.

Wisa ku rojek ji rojên seredanê –wekî hemî girtiyê dinê ku hê seredanên wan nehatibûn- ez û yek-du heval bi hev re me li baxçe piyase dikir, em li nêzîkî koşeyê hêla nîzamiyeyê bûn ku ha me dît borînek bi ser Edîb abê ket û dibêje: “Hela hela yahu ! Şuna bak hele! Burası Kürdistanıdır ve burada elbette Kürtçe konuşulacaktır. Kürtçe konuşmayacaksak burada işimiz ne peki ?” Mudirê girtîgehê yarbay gotê: “Edip bey! Kendinize gelin rica ederim. Karşınızdaki sayın kurmay başkanı.” Edîb abê çengê xwe yê dirêj yê çepê bi ser mudir ve veweşand û gotê: “O kurmay başkanı ise burada da koskoca başkanlık divanı var be!”

Çi bûbû ?

Pêşiya girtîgehê li qîblê dinihêrî û meydanake çargoşe ya dirêjîk bû. Sê aliyê vê meydan an hewşê bi têldiriyan têlkerî bû. Gava seredanên me dihatin ew li wî aliyê têlan û em li vî alî, me hevûdu didîtîn. Carina neferekî, onbaşî an çawîşkî li hêla wan radiwestî ku hay lê be em tişt bê kontrola wan nedin hevûdu. Vê carê jî hevaleyî me û seredanên xwe bi hev re wek timî bi kumancî dipeyivin. Serekê serkanê “kolordu”yê, dizê tenekekî qeliya Ali Beyköylü “Kavurmacı Süleyman paşa” jî tevî mudirê girtîgeha me “yarbay” ve bi cilên sivîl li pişt seredanên vî hevalê me rawestayê û dibihîze va ev bi kurmancî dipeyivin. Bi wan re pev diçe û hêrs dibe, diqîre dibêje “kesin ulan! Türkçe konuşun!” Ev guh nadinê, dibêjin em bi tirkî nizanin. Paşa bêtir tê hêrsê û dibêje: “Burası Türk vatamı Türkiyedir, burada Türkçe konuşulur.” Bê lome û bê kubarî be, ev gotina wî tê guhê Edîb abê. Edîb abê yê ku li esmana li bahaneke pûç digere ku kela xwe di serî de hêdî bike û li erdê rastî yeka bi vê sosretê tê. Kela xwe di serê paşê de wisa hêdî kir ku “Kavurmacı Süleyman paşa” revî revî ji ber “başkanlık divanı” reviya û çû.

Em yê li girtîgeha Diyarbekirê ku ji “DDKO, kurdayetî û welat perçekirin (bölücülük)”ê dihatin mehkeme kirin; li gora daxuyana mafên mirovî ya navneteweyî, peyman a mafên mirovan a Ewropayê, qanûnên cezayî yên welatên medenî diva yek ji me jî hingê ne di hundir de bûna û ne jî bihatina girtin. Di mala yekî ji me de jî çekek agirber li wê derê bihêle kêrikek ko jî nehatibû girtin. Îsnad û îddiyên dozger (savcı) yên derheqê me dibûn mijarên çirokên pêkenînê: Feqî Ebdulletîf tevî radyoyeke qirase ya teribandî ji modela 1955 an (goya têlsiz/bêtêl e) bi îthama ji sîxuri (casûsî) ya Barzanî li qezake Mêrdînê girtibûn, ji wê şandibûn Mêrdînê, ji wê derê jî anîbûn ba me. Rehmetiyê Rizqo

suryanî bû, lê bi şerîetperestiya îslamî dihat sûcdar kirin. Behrî Evliyaoglu nexwenda bû, lê bi heyranî li afîşeke ku propaganda kurdayetiyê dikir nihêrtibû. Yek pêlaveke lastîk, yekî dî du kîlo şekirê çayê ji Barzanî re şandibû û pê “bölücülük” kiribûn. Sûcê Nazim jî ne sivik bû: Şeva ku li ser rê û li kolanên Diyarbekirê bi boyaxa spî li dijî emperyalîzma Amerîkayê slogan hatibûn nivîsîn ku yek ji vana jî li ber îstasyonê hatibû nivisandin û digot “Türkiye Amerikanın genelevi değildir”, Nazim jî wê şevê li wê hêlê hatibû dîtin û ev jî aşkera dikir ku têkiliya wî pê hebû. Ev îdîayên dozger (savcı) bûn. Di mehkemê de gava dozgerê me vê benda îddîanama xwe xwend Edîb abê ji nişkave rabû piya, -li rêza pêşiyê an li ya duduyan rûdinişt, niha baş nayê bîra min, lê li aliyê çepê û nêzîkî dozger bû- çengê xwe yê çepê bi ser dozger de vewêşand, reben veciniqî xwe paşve da, Edîb abê gote heyeta mehkemê: “Yani bu herif (savcı) Türkiye Amerikanın genelevidir mi demek istiyor ? Bunun aksi yazıldığı ve tesadüfen oralarda görüldüğü için mi Nazım ve dolayısıyla biz suçlanıyoruz ?” Dozger û heyeta mehkemê li hevûdu şaş bûn, qurf (panik) bi wan ket, nizanibûn ka ku çi bibêjin. Di gelek cihên bi vî rengî sûcdarkirinên dozger ên tewşo-mewşoyî de Edîb abê ji cihê xwe bêdestûr radibû, êrîşî dozger û îddîaya wî dikir û yê îtihakirî ango hevalê xwe yê dozê bi awakî li gora xwe diparast.

Edîb abê merivekî bi xîret bû. Zordestiyê, çavsoriyê qebûl nedikir. Nizanim jê re çi gotibûn an jê çi xwestibûn ? Rojekê di navdêra herdû nivîstgehan (yatakhane) de borîn pêket û ji nav serê xwe kir qîrîn, got. “Hela! Hela! Bu ne iş yahu ? Dışarıda karakol komiserlerinin elinden çaktığımız yetmiyormuş gibi bir de içerde sosyalizm komiserlerinin elinden çekiyoruz. Çekeceğimiz varmış.”

Girtîgeha me bi nîsbet girtîgehên din bi rastî jî ne girtîgeh bû: Erê bi heqî biya, li gora erf û adetê hiqûqa mirovan biya diva ku em ne li wê derê bûna, lê ew der jî cihekî mîna kamp bû. Pirtûkên li derva qedexekirî li hundir hebûn. Bi bîdonan vodka diket hundir. Pîrzola û kebab hebû. Lê helbet ev ji bona xwedî-pereyan bûn. Ji heftê an ji panzdehê carek jî sînema dihat. Ji bona wext bihartinê baş bû, lê çend car li ser hev filmên beredayî yên mîna “Battal Gazi, Tarkan, Malkoçoğlu” filan bûn. Edîb abê aciz bû û bi makînist re xeyidî, gotê: “Bu ne biçim kendin gibi saçma sapan filimler getiriyorsun. Bilimsel filim sityoruz, onbaşı ! Bilimsel filim!” Di pey de dîsa sînema hat, lê vê carê filmeke nîv-doxînsistî ya melodram bû. Fîlm qediya, onbaşı di heyecanê de ye ka ewê Edîb abê yanî “başkanlık divanı” çî bêje. Lê ji tîrsa jî dilkutka wî lêdixê. Edîb abê gotê: “Aferîn onbaşı ! Bak işte böyle bilimsel flim getir.” Ev nukteya “bilimsel filim” îcada wî ye.

Lê “yetişin bitti kalmadı” ?

Min berê jî got ku ew der çî bigire ji alîkî ve kamp bû: Hin ji me hetanî saet 10, 11 an hetanî qerewana firavîne radizan. Qerewana taştê dihat, saetekî dima. Xwarina dihat xwarin diha-te xwarin, ya nedihate xwarin paşve diçû. Vêca carina ji bona taştê hêkên kelandî derdiketin ku serê merivê yek diket. Bi qasî bîst-sih kes ji koma xewxweşan bûn ku xewa xwe nedidan bi taştê. Hingê Edîb abê ewê rakira hêkên jibermayî bikira feraqek û bida berdilê xwe, ji xwaringehê dest pê bikira û heta ber ranza xwe bi dengê bilind gazî bikira: “Yetişemedik yahu, kalmadı !” Te dît ewê yek bipirsiya: “Hayrola Edip abi (yaxud “başkan” weya “Edip bey”) o kalmayan ne ?” Ewê Edîb abê bigota û hem-bêza xwe nîşan bida: “Yumurta kalmadı, yumurta!” Carina jî ev ne hêk bûn, lê zeytûn an leymûn bûn. Lê ew her vê gotina xwe

ya “yetişemedik yahu! Kalmadı.” Bi dengekî bilind diqîrî, herkesî bi xwe dihisand.

Kengê bû, bi çi munasebetê bû baş nayê bîra min, lê şeveke şahiyê bû: Bi govend, stran, nukte û metelokan geş bû. Dor hat ser Edîb abê jî. Edîb abê bê nazî û xwe-giran kirin wê strana “allî turnam” stra ku xemgîniya taybetî ya bi dengê wî mîna mijê keserê bilind bû, li tevahiya qawîşê belav bû û hêdî hêdî li ser pejinên herkesî giraniya xwe danî.

Tevî wê gewda xwe ya giran merivekî safî bi enerjî bû. Ha we dît li Deriyê Çiyê destekî li girmilka we ket û pê re merheba da we û li ser bîsikleta (duçerxe) xwe di we de bihurî û çû. Ha we dît di saha voleybolê de bi saetan bêwestiyar bi xortên ji xwe panzdeh-bîst sal piçûktir re dileyize, nabetile lê dibetilîne.

Bi jiyê xwe navsere, lê di têkoşînê de xort, di baweriya xwe de li hember dijmin bêtawîz lê bi hevalan re nerm, Edip Karahan, “başkanlık divanı” Edîb abêkî me hebû ku felekê nehişt ew hevraza navseretiyê tamam bike. Ecel di çil û şeş saliyê de lê xayîn geriya, ji heval û hogiran veqetand. Lê dengê wî hê jî di kerrika guhê min de ye.

“Ax gul im, gul im!.. Yar gul im... gul im... qiz gul im... gul im! Turnalar hêy!”

Tebax, 1997

[Ev, ji bona pirtûkek li ser Edip Karahan bi munasebeta bîranîna wî di Tebaxa 1997an de hatibû nivisandin. Bawer dikim ku pirtûk hê jî derneketiye.]

(*Nûdem*, hejmar 38, Stockholm-2001)

ÎSTIQBAL ÇI YE, PÊŞEROJ AN PAŞEROJ E ?

Kurmanc li ser têgeha “îstiqbal”ê li hev nakin, di vê mijarê de jî di dubendiyê de ne: Hin jê dibêjin ku îstiqbal pêşeroj e, yên dinê dibêjin na îstiqbal paşroj an paşeroj e.

Bi maneya îstiqbalê mîna gelek kesan ez jî gotina pêşerojê bi kar tînim. Bêguman gelek kes jî hene ku di dewsê de “paşeroj” bi kar tînin. Du gotinên bi temamî dijmane; pêş û paş.

Yên ku paşerojê bi kar tînin li gora xwe van sedeman berpêş dikin û dibêjin ku kurd dibêjin:

Gotinên pêşiyar: Jê mebest ew e ku gotinên wan kesan in ku li pêşiya me hatine dinyayê û jîne. Hingê pêş an pêşî bihurî (mazî/passé) ye, bûrî nabe îstiqbal.

Pêşiyên me: Bav û bapîrên me ne û bûrî (mazî) ne, çûne; ew nabin îstiqbal.

Li paşiya xwe bifikire (yanî li îstiqbala xwe bifikire).

Paşiyên me: Yanî nevî û nevîçirkên me (ku îstiqbala me) ne.

Rast e gelo ? Ez wisa bi wî awayî nafikirim.

Di hemî tişt û têgehên (mefhûm) ku di hereketê de ne herwekî zuriyet, karwan, qefle, leşker, govend, garan, av û trê; aliyê pêşî aliyê wan î serîkêş e. Serîkêşê zuriyetê pêşiyê zuriyetê ye ku li gora me dibe bav û bapîr. Paşiya wan jî dûvik, dawî, xelefê wan e. Li vê derê pêşî (qêbl-ön) û paşî (axir/arka, ard) ye, ne ku yek mazî (geçmiş) û yek jî musteqbel e.

Gava ku meriv dibêje li paşiya xwe bifikire pê meriv dixwaze bibêje ku li paşiya (dawî) emrê xwe bifikire; niha tu di ferehiyê de yî an li ser quwet û siheta xwe yî, ev rewşa xweş her tim

wisa namîne, dibe ku di pey de bikevî tengasiyê, lewma li paşiya van rojan bifikire yanî bi tedbîr be. Yên ku dibêjin li paşiya xwe bifikire an Xwedê paşiya me bi xêr bigerîne, di dewsa paşiyê de gelek car dibêjin [axirê, sonî an songiya, taliya, dongiya, dawiya] emrê me û h.w.d. Ji van bêjeyan tu yek jî bi maneya îstiqbalê nayê.

Paşiyên me ku di maneya zarûk-nevî-nevîçirk de ye, di erebî de (‘eqeb) e, ne ku (qeb) e. Ew dûvajo an xelefên me yên zuriyetê ne. Lê îstiqbal ji bêjeya “qeb” (pêş) hatiye çêkirin. Meriv dibêje ku zarûkên milletekî îstiqbala wî milletî ye, lê ev nayê wê maneyê ku maneya îstiqbalê bi kurmancî zarûk e.

Li herêma me gava ku mezinekî dewletê dihat bajarekî; eşraf û xwendayên navsere yên ji dema padîşahî an paşatiyê mayî bi kurmancî digotin “emê herin îstiqbala filan kes”, xelkên sade jî dîsa bi kurmancî digotin “emê herin pêşiya wî”.

“Ma tu neçûy pêşiya wî (axê / şêx / mîr / serok / dawetê / leşker) ?” Ev her tim tê gotinê û jê jî mebest ew e ku ka ew kes çiyê îstiqbala kesê jê behskirî an ne. Serok an hezkiriyek we dê were balafirgeha bajarê we û hun dixwazin bi qewlê berê herin îstiqbala wî kesî, gelo hunê herin pêşiya wî an paşiya wî ?

Di dewsa vê “îstiqbalê” de îro bi tirkî “karşılama” tê bika-ranîn ku bi kurmanciya me pêrgîn e.

Di berbanga sibehê de demên limêjê yên wê rojê yên li pêşiya meriv (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û îşa ne. Di esrê de êdî limêja mexrib û îşayê bi tenê li pêşiya meriv dimînin yanî musteqbel in, lê limêja nîvro û ya sibehê bihurîne, li paş meriv mane.

Baş e, ku pêş bûrî (mazî-geçmiş) be, pêşveçûn bi çi maneyê ye gelo ? Çûyina ber bi îstiqbalê ve ye an ya ber bi bûrî (mazî-geçmiş) ve ye ? Li gora mentîqa wan kesên ku dibêjin

“paşeroj” divê îstiqbal be, herwisa divê ku paşveçûn teqedum an tereqî (ileri) û pêşveçûn jî reci’î (gericilik) bûna. Lê diî rastiyê de ne wisa ye.

Paşeroja me perçezemanê me yê dawiya emrê me, yê axirê emrê me ye. Lê pêşeroja me ew perçezemanê ji niha heta paşerojê li pêşiya me ye, em di her gavî de ber pê diçin, li pêşiya me ye ku emê hê bibînîn û bijîn, yanî îstiqbal e.

Em dîna xwe bidinê di vê mijarê de ka xwedî rêziman û ferheng çî dibêjin: Li gora Mîr Celadet paşroj; berdestik[yêdek], tesorûf⁽¹⁾, li gora Elî Seydo Gewranî paşroj; tesorûf (el-wefr), musteqbel⁽²⁾, li gora D. Îzolî paşeroj; îstiqbal, lê paşrojmendî; tesorûf⁽³⁾, li gora Salah Saadallah future; paşroj, pêşedem, dungî⁽⁴⁾, li gora Hejar paşeroj; lewe diwa, ayinde, rojanî diwayî⁽⁵⁾.

Ji vana ji Hejar û D.Îzolî pêve kes negotiye paşeroj, gotine paşroj. Ku paşeroj îstiqbal be paşrojmendî divê bibûna “xwedî-îstiqbalî”, bi çî awayî dibe tesoruf tênagihîjim.

“Tesoruf”a Mîr Celadet, “tesorûf”a (el-wefr) Elî Seydo Gewranî û “paşrojmendî” (!?) ya D.Îzolî li hev dikin. “Dûngî”ya Salah Saadallah û “rojanî diwayî” ya Hejar jî li hev in. Lê çawa eynî gotin hem dibe tesorûf û hem jî musteqbel ? An paşroj: îstiqbal û paşrojmendî jî tesorûf ? Bi serê meriv nakeve. Ya jî “future” hem paşroj û hem jî pêşedem ? Li vê derê paşdaniya [-dem] û [-roj] karê nişandayina zeman/peryod dikin, ji aliyê maneyê ve tu cudayî di navbera pêşedem, pêşeroj, pêşezeman, pêşegav de tune; ya ku maneya sereke dide gotinê pêş- an paş- a wê ye.

Bi dîtina min paşroj an paşeroj ne tesorûf e û ne jî îstiqbal an musteqbel e, lêbelê bi xwe dawî/dongî/axir e û wek mecaz jî maneya tesorûf/zewade/zexîre an tedbîra ji bona rojên paşiyê bi xwe re tîne.

Axir û îstiqbal an paşeroj û pêşeroj du têgehên gelek nêzîkî hev in. Di jiyana rojane ya xelkê sade de bêtir axir, paşî, dawî, tê bikaranîn. Îstiqbal têgeheke fikrî/zanistî ye; bi dest nayê girtin û bi çav nayê dîtin, lêbelê têgehek e. Ev herdû biwêj axir û îstiqbal (paşeroj û pêşeroj) di hin cihan de mîna hev xuyan bikin û wisa bêne fehimkirin jî ne eynî tişt in.

(*Nûdem*, hejmar 39-40, Stockholm-2001)

⁽¹⁾ Emir Celadet Bedir Han & Roger Lescot, *Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehçesi)*, Institut kurde de Paris - 1990.

⁽²⁾ Alî Seydo Alî Gewranî, *Ferhenga Kurdi Nûjen*, Şirket-el-şerqel Ewset, Eman-1985.

⁽³⁾ D. İzolf, *Ferheng Kurdi-Tirkî, Kurdish Students Society in Europe*, Den Haag - 1987.

⁽⁴⁾ Salah Saadallah, *Ferhenga İngiltzî-Kurdi*, Paris Kurdish Institute-Avesta, Istanbul-2000.

⁽⁴⁾ Hejar, *Ferheng Kurdi-Farisî*, Soroush Press, Tehran-1989.

DEH SALIYA NÛDEMÊ

Nûdem dibe deh salî, li çande û edebiyata kurmancî pîroz be û bi hêviya jiyaneke bi çendîn dehsalên dîtir.

Deh sal: Çar cara deh dike çil; çil hejmar kovar... Her hejmarek ji 120-130 rupelî û ji 20-25 nivîsaran diçe li ku derê dikeve ? Ez giliyê bêhejmar pirtûkên rexberhemên wê nakim û Firatê bi tena serê xwe ku hem xwedî, hem redaktor, hem nivîsvan û hem bişkûrî...

Nûdem pêwistiyek bû û wek kovareke edebî-çandeyî hê ji ji nivîsara kurmancî re pêwistî ye.

Kovara edebî; ziman, bi taybetî jî zimanê nivîsandinê pêşve dibe. Bikaranîna ziman û stîla nivîsanê bi danûstana wê siviktir, herikandîtir û xweştir dibe. Bi vê riyê ebra tesewir, xeyalkirin û fikirînê ferehtir û kûrtir dibe. Bi xwe re nivîskarên nû digihîne, besta yên heyî li nivîsandinê hildike.

Kovara edebî meydana bihevguhastin û hevnasîna zewq û rengên edebî yên cihêreng e. Di wan de meriv çêjên nû dinase û bi ser rengên cuda vedibe. Herwisa ew cîgeha rastîhevbûna edebiyata kevin û nû, ya biyanî û xwemalî ye.

Hin ji wan di edebiyatê de li pêş xwe çexerên nû vedikin ku ev çexer bi xwe re têgehek û bergehek nû tîne cîhana edebiyatê.

Edebîyat bi xwe şîraniya jiyana entellektuêlî ye û ya nivîskî neynika bidestgir a zewq, reng, fikir û tesewira neteweyî ye. Herwisa neynika herî bi hêztira binasîndayîna gelekî ye jî. Hêza meriv a aborî her tim dest nade ku meriv here li welatên cihê

cihê bigere û gelê wan binase, lê bi rêgeha berhemên edebî meriv li mala xwe dikare rûnê û bi nivîskarê edebiyatê re li welatê wî bigere: Bi Homeros re li Yûnana antîk, bi Nerûda re li Amerîkana Latîn, bi Pûşkîn re di nav serhildana Pûgaçev, bi Şoloxov re li kersaxên Donê, bi Aytmatov re li şafirên Asya navîn, bi Steinbeck re li nav peyzanoyên Amerîkayê, bi Balzac re li Fransaya sedsala 19an, bi Erebb Şemo re li zozanên Elegazê û deşta Rewanê bigere; bi kesên wan re bikene, veciniqe, hêrs bibe, bikeve mitala û bigirî.

Ev hêza giyanî ya nexuyanî ku gelên hevnedîtî bi hev dide nasîn û hezkirin ji serkaniya edebiyatê tê. Bêndera edebiyatê jî îro kovarên edebî ne.

Nûdem jî di warê kurmancî de kovareke wisa ya hêja ye. Xwedîpênûsên cihê cihê yê de verên cografîk ên ji hev dûr, yê jî dîtînen siyasî yê cihê tê de dinivîsîn. Bi tenê nanivîsîn, ji hev kelk jî digirin. Ez her hejmarê bi mebesta sûdek jêhilanîne ta ku zemanê min dest bide dixwînim û bi kêrî min tê jî; pê bêjzaniya xwe teze dikim, hin tiştên nû hîn dibim.

Pêdiviya min bi kovareke edebî ya kurmancî ya bi vî rengî bi kalîte û tekûz hebû û hê jî heye. Xwezî ku ev ji mehê carekê derketa.

Gotin hêsa lê kirin zor e. Ji bona jiyana kovarekê divê:

- a. Xwestinek ji dil û bi dîsîplîn,
- b. Sermiyanê nivîsarî,
- c. Hatiniya darayî (fînans) û bazar (lêpîrsîna xwendevanan) hebin.

Xwestina ji dil û bi dîsîplîn a xwediyê kovarê bêguman heye. Sermiyanê nivîsarî jî ne xirab e, roj bi roj çêtir û zêdetir dibe. Lê hatiniya darayî û bazar ? Bi gotina Xanî “kesad e bazar” û “nîn e xerîdar”.

Nûdem hatiye devê neqebekê. Bi ya min divê ku li riya
xwe ya weşanê bikudîne. Pêdiviya me pê heye.

Bi hêviya jiyana gelek dehsalên dinê jî.

[*Nûdem*, hejmar (a mixabin a dawî) 39-40,
Stockholm-2001]

Yekem nivîsa vê kitêbê di sala 1979an de çap bûye. Xwerû bi kurmancî, di kovarek tev bi kurdî de, bi kurmanciya gewr !... Di salên ku “oku, okut” slogana sereke bû. Lê di wê slogana bi zimanekî din de, bersîva “çi” bixwînîm û “bi kîjan zimanî ?” nebû. Bixwîne, ev dikare bibe destpêkek xweş. “Kurd kî ne ?” Kurd ew kes in ku bi hevûdu re bi kurmancî dipeyivin. Ji taybetiya ziman pêve ji aliyê reng û xetên fîzyonomîk ve tu cihêtiya wan û cîranên wan ji hevûdu tune. Kurdistan perçeaxeke diyar û nediyar e. Nediyar e, ji ber ku li dorûberê wê tixûbek xwezayî mîna derya an rêzeçiyayên Hîmalayê tune. Diyar e, ji ber perçeaxeka yekperçe ye ku xelkê lê bi kurmancî dipeyivin. “... Nîşana cudatîyê ya kurdan ji gelên cîran ew e ku zimanê wan î axaftinê ye. Ew ziman ango kurmancî xwîna wî laşî ye ku jê re kurd tê gotin. Ku kurmancî nemîne, bibire ew laş jî namîne ku bimîne jî ewê wekî rawirekî nêçîrê ku bi sole an tiştêkî dîtir tije-kirî yê xemlê bimîne. Ku kurmancî nemîne ewê kurd jî nemînin, ku kurd nemînin dê Kurdistan jî nemîne....



ISBN : 2-908416-19-0